



ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A Bilind

**DEST PÊKÊK JE BO NASANDINA
ZANESTA ZIMAN**

Edris Hama Murad MAJID

Wan – 2017

K. T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA Bilind

**DEST PÊKÊK JE BO NASANDINA
ZANESTA ZIMAN**

Amadekar

Edris Hama Murad MAJID

Şêwirmend

Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

WAN – 2017

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

BİLİM DİLİ BİLİMİ İLKEİ

HAZIRLAYAN

Edris Hama Murad MAJID

DANIŞMAN

Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

VAN – 2017

NAVEROK

KURTE	VIII
ÖZET	X
SPASÎ.....	XIV
PÊŞGUTIN	XV
DESPÊK	XVIII
BEŞA YEKEM.....	1
1 BEŞA YEKEM	2
1.1 Ziman Nasî Çi ye	2
1.2 Ziman Çî ye.....	9
1.3 Kuertek ji Dîroka Zimannasîyê.....	19
1.4 Dîroka Zimannasî li Def Hindî yê.....	21
1.5 Zimannasî li Def Yonanîyan	26
1.5.1 Eflaton.....	28
1.5.2 Ereto	34
1.6 Rêzimanên (Gramerîyan).....	38
1.7 Qutabxana Rexnegerên Yonanî	42
1.8 Zimannasîn ji Alyê Romanyan	43
1.9 Zimannasîn ji Alê Ereban ji Pêş û Piştî Îslamî.....	45
1.9.1 Zimannasîni ji Alyê Ereban Pêş Hatna Olîye Îslam.....	46
1.9.2 Zimannasîni ji Alyê Ereban Paş Hatna Olîye Îslam	50
1.9.3 Zimanvanya Ereban di Serdemê Hevalên Pêxember (Slav Ser Bi).....	58
1.9.4 Sîbewey û Desit Pêka Rêzimana Ereban	61
1.10 Nêrînen Sîbewey di Elkitab de	62
1.11 Qutabxane yê Besre û Kufe	65
1.12 Zimannasî di Sedeyên Navend (Naverast).....	67
1.12.1 Apolonîs Dîskulus (Yonanî) (110 - 175)	68
1.12.2 Prîşyan.....	70
1.12.3 Eski Lîcer (1484 - 1558)	72
1.12.4 Sankîfûs û Mîrwa (1523 - 1600).....	73

1.13	Port Royal	77
1.14	Zimannasî li Sedsalên Hejdehyem û Nozdehyem.....	79
1.15	Ferheng Nivîsî di Sed sala Hejdehyem (Wşewanî)(Qamus).....	81
1.16	Ferensa û Girîngî Dana Wan bi Zimanvanî di Sedên Hejdehyem	82
1.16.1	Klud Faru Dû Wjla.....	83
1.16.2	Rinye Dimare	84
1.16.3	Klud Bufye.....	85
	BEŞA DÛYEM.....	87
2	BEŞA DÛYEM.....	88
2.1	Taybetmendîya Ziman	88
2.2	Sedema Berfireh Bûn û Geşe Kirina Ziman	91
2.3	Mînaka Zimanê Kîşwa	91
2.4	Egerên Berfirhî û Billav Bûna Ziman	94
2.4.1	Sedema Cûgrafi.....	94
2.4.2	Sedema Jiyarî û Bajêr	95
2.4.3	Sedema Abûrî.....	96
2.4.4	Sedema Sîyasî	97
2.4.5	Sedema Serbazî.....	99
2.4.6	Sedema Olî.....	100
2.4.7	Sedma Teknolojî û Zanista Teknîkî	101
2.5	Mirna Ziman	102
2.6	Roll û Erkên Ziman.....	109
2.6.1	Roll û Erkê Peywendî Kirina Ziman.....	110
2.6.2	Derbirîn bê Guhgarêk (Gutûbêj Kirinê di Gel Xwe).....	112
2.6.3	Erka Dirûsit Kirina Ciwan di Gutnê de (Gutnêka Ciwan)	113
2.7	Ziman û Bîr û Hizir.....	114
2.8	Guherîna Ziman	117
2.9	Dabeşî û Didûbûna Ziman	119
2.10	Ziman û Waqî'î Bûn	122
2.11	Corên Ziman	124
2.11.1	Zimanên Yek Birrge (Tik Hcayî).....	125
2.11.2	Zimanên Peyvestî (Likawekan)(Agglutinating).....	126
2.11.3	Zimanê Şî Vekirî (Gerdan Krawekan) İniflecting	127

2.12	Ziman û Civak.....	128
2.13	Ziman û Axivtin.....	131
	BEŞA SÊYEM.....	135
3	BEŞA SÊYEM.....	136
3.1	Teorîya Zimannasî	136
3.1.1	Fonotêk (Deng)	137
3.1.1.1	<i>Fonotêka Fîzîkî</i>	138
3.1.2	Fonolojî (Phonologiy).....	141
3.1.3	Morfolojî (Morphologiy)	143
3.1.4	Riste Nasî (Syntax).....	146
3.1.5	Wata nasî (Sîmentîk).....	147
3.1.6	Pragmatîk (Pragmaticis).....	150
3.2	Îtmolojîya Ziman	151
3.2.1	Zimannasî ya Dîrokî.....	151
3.2.2	Zimannasî Ya Wisfî (Hawkatî , Descriptive).....	152
3.2.3	Zimannasî Ya Berawrid	153
3.3	Qutabxaneyên Zimannasî.....	157
3.3.1	Sruştîyên (Naturaist)	157
3.3.2	Rîk Kuftin (Rîk Kuwtnekan) (Qrar Dadîwn).....	158
3.4	Piştî Yonanyên, Latîniyên Bi Zimanê Latînîve Mjûl Bûn	158
3.4.1	Şoreşa Yekem ya Ziman	161
3.4.2	Şoreşa Dûyê	161
3.4.3	Şoreşa Sêyê	161
3.4.4	Şoreşa Çarê	162
3.5	Qutabxane yên Zimannasî ya Binyat Gerî (Structualismr)	162
3.6	Cudayî di Nav Bera Ziman û Axivtnê	163
3.7	Piştê Sosêr û Qutabxaneyên Bûnyewî Sê Qutabxane yên Din Derkevîne.....	164
3.7.1	Qutabxane ya Bûnyewî ya Emrîkî	164
3.7.2	Qûtabxane ya Zimanê ya Kubinhag.....	168
3.7.3	Qûtabxane ya Zimannasî ya Prag (Prag).....	171
3.7.4	Qutabxane ya Zimannasî ya Lindin 1930 - 1950.....	174
3.8	Şorşa Zimannasî ya Niwam Çomskî.....	177
	ENCAM.....	181



KURTE

Dî distpêkê wê vekolînê ku di bin destê wedaye berhemekê berifrehe ku peydabûn û berifrehiya ziman bi şeweyekê giştî dihête diyar krin, herwisa ya diyare ev vekolîn bi vî şewe ku têkuşîneka bi naveruke di dişet ji bu her xwendevanêk bi taybetî xwendevanên qunaxa blind gringiyeka taybet heye li beşê niasîna zimande.

Ji pêkhatina vê vekolînê de bi sê beşên serekî aşne dibîn ku her êk ji wan beşan çend babet û şewazên cudayên gringiya ziman ji xweve digirît Beşa yekê xwe ji qalbê gringiya ziman û niasîna zimanî li qunaxên destipêka ziman dihête dîtin ku li çend cihên cugrafi yên cuda û gelên cuda ew destipêk hatiye dest nîşan kirin.

Ziman nasî di alîye çendîn gelên cuda cuda di hête şrove krin ku di dîrokêda karîgerên herîy mezn li ser ziman û ziman nasîye hebûye wan gelên jî wekîy gelên hîndî û îwnanîy û erbî ûhwd û ta sedyeên navend û şorşa sin'etya ferinsa wan karîgerî li ser ziman berdewamî hebûye piştrê jî ew gringî pêdan ta sedeyn hejde û nuzde jî hatiye berdewam kirin ta gehîştîye dema firdînand dî sosêr ku dikrîn bi qunaxeka nûya zimannasiye bihête ejmar kirin.

Di beşê didûyê de dê aşnabîn bi çend warên ziman û gringiya ziman û taybetmendiyên zimanî ku ew bi xwe çend babetên diyar diket her babetek rul û gringiya zimanîya xwe diyar dikit ku hemî babetên vî beşê bi şeweyek ji şewazên peywendiyên bi yekve heye û rula timam kirina hevdu dibînîn, di destipêkê vê beşê de têbîniya wê çendê kiriye ew taybetmendî çine ku ziman ji xweve digrît û paşê geşe dikit û hukarên

berifreh bûna ziman û hukarên diyar kirin ku rulê di geşe kirin û berifreh bûna ziman de hene.

Di beşa sêyê de ku bi beşa dumahî ya wê vekulîn dihêt diyar kirin, ku berhemên beşên berê û praktîze kirina van beşan rûn dike û ew rul û erkên ew qunaxên ku ziman li sedên berê derbaz kiriye û gehîştine qunaxên sedên nû anku sedên nuzdê û bîstê yê şluve kirin, di vî beşê de alyen tîwrîyên ziman û curên ziman niyasîn ji wekî ziman niyasîna tîwrî û dîrokî û civakî û başa zansitê ziman ku wekî navenda(kirok) ziman yan rêzmana ziman hatiye danan wekî deng nasîn û peyv nasîn û riste nasîn û raman niyasîn, bi şêweyeka herî baş dihêne diyar kirine.

Paşê çend qutabxanên ku rulê xwe di vekulîna ziman de hebûye behsî dikin wekî qutabxane ya bunyewî ya sosêr û kubin hagin û qutabxane ya ziman nasên praghwd paşê li dumahiyê behsa şurşên gringên ziman di dima nû ya dihête kirin ku ji alyê nwam çomsikîve hatiye encamdan.

ÖZET

Öncelikle ifade edeyim ki elinizin altında bu araştırma çok geniş ve kapsamlı bir araştırma konusudur. Bu nedenle bu araştırma her araştırmacının dil ve edebiyat alanında ihtiyaç duyacağı genel ve özel bilgileri ihtiva etmektedir.

Bu araştırma neticesinde çok önemli ve derinlikli başlıkları öne çıkarmak suretiyle işlemeyi amaçladık. Birinci bölümde Dilbilim açısından dilin tarihçesi ile alakalı dil tarihi serüveni bağlamında konuya başladık. Diğer taraftan coğrafi alanlarda dil etkileşimleri konusunu farklı bakış açılarıyla izah ettik.

Dilbiliminin başlangıç tarihçesini izahtan sonra ünlü Fransız dilci Ferdinand'ın çok değerli bilimsel açıdan dil tarihi üzerindeki araştırmalarına değinilecektir.

İkinci bölümde Dilin önemi özellik açısından değerlendirilmesi dilin gelişim süreçleri dil öğreniminin ehemmiyeti ve öğrenme yolları konularında genel bilgiler verilecektir.

Üçüncü bölümde ise ki son bölümü oluşturmaktadır. Kürt dilinin geçirdiği yüzyıllık süreçle birlikte dilin pratize edilme imkanları üzerinde durulmuş toplumsal kurallarında etkin olduğu dil lehçelerinin oluşumu ve farklı ağız teleffuzlarının dil üzerindeki etkileri irdelenmeye çalışılmıştır.

Öte yandan dilbilim alanında meşhur olan kütüphanelerle alakalı bilgiler verilmiş Örnek olarak prag'daki milli kütüphane ile birlikte

nwam çomsikîve tarafından dil tarihçesi alanındaki hizmetlerine değinilmiş dil alanında ciddi hizmet ve çalışma örnekleri anlatılmıştır.



ABSTRACT

This research it will discuss as the following:

At the beginning of this research , which is front of you it shows an interesting production which are extension and potentiality of the language . that identifies a language in general this research is also another try of the content. It would be for every students particularly who is in a high level, it has a special important in the department of introduction of language.

In this research will gets familiar of the three main parts each of them including different parts and shapes of language .

First section we will sees the framework of important of language , and introduction of language in the early stage of language which started in many different geography from different nations.

In history introduction of language from many different nations have interpreted . they have a huge effect on the language and introduction of langue ,such as Indian, Arab....etc.

These effects have continued until mid-century and started France industrial revaluation .

In the 18th and 19th century it has continued at the same method until late of 19th century and early 20th .century. who Ferdinand de Saussure is appeared as a linguist of the world who called the father of linguistic . which also calls as new stage of linguistic.

In the second section will gets familiar with many fields of language , crucial of introduction of language and features of language which

themselves consist many subjects. Each of them identify functions and roles of language.

All of them are relative which is complement each other, at the begin of this section will notices what are those features that language has and develops and the cause of expansion and progretion.

In the third section which identified as a last part of this research who practices and explains of the previous parts of the production which identifies roles and functions of the language in the previous stags until new testament.

In this section it has identified theory of language and types of the introduction of language . such as theory of introduction of language, history , description...etc.

And type of linguistic as essence of language and completely grammar of language which identified such as phonetics , morphology , syntax and semantic.

Then, many schools have taken a great role to development of linguistic such as Ferdinand de Saussure Kuban hat ,Brat. Ant school of the linguistic of London . In the end of this research will interprets the most important revolution of language in a new testament, from Name Chomsky . it's likely to mention that this research continues currently which is the most significant of subject of science of language and literature of the all university .

SPASÎ

Ez pir spasiyan mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Her wiha ez pir sipasiya Alk. Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. Her wisa vê xebatê pêşkêşî ruhê bavê xwe, diya xwe û hemû malbata xwe dikim û her wisa ji bo gelek heval û dostên xwe bi rûmet ji bakûr û başûrê kurdistanê dikim gelek alîkarê bi min kirin, bi taybet; Sebah Mhind, Macîd Mensur, Rewîşt Mrad, Mis'ud Mrad, Mhimd Mrîwanî û Clal Mhimd.

Edris Hama Murad MAJID

22. 05. 2017

PÊŞGUTIN

Di distpêkê ew berhemê li ber destê we berhemekê berifrehe ku peydabûn û berifrehiya ziman bi şêweyekê giştî yê diyar kirîye, herwisa ya diyare ev berhem bi vî şêwe ku têkuşînek bi naverukê da dişêt ji bu her xwêndevanek bi taybetî xwêndevanên asta blind grinkyeka taybet heye li beşê nyasîna ziman, ziman ezmûneka hizir û awazên gelane gringitrîn zanyaryên mruviye û helgirê dîrok û dîtna jiyana û keltûr û ferheng û dirûstirîn terazûya hebûn û nebûnê ye hefdem dexazê ku li rwangeha wergirtina zihna xwandevan û şyanêt xwandna babetîda li warê babetên giştî û tak û dîrok û navendî vekolînê bikim û bi şêweyeka giştî vekulînek de der têxim ku di gişt gîrya dîroka ziman de cih kiriye ku vî babet curêka taybet bi vekulîne dide, bi şêweyekê giştî bitiriya şluvekarên zansîtê ziman li ser binemayê tefsîr û ji ber kirina deqên olîên pîruz danaye ku binemayê (xudayî yan nîv xudayî hebû ye wekî tewrat û încîl û quran) di vê rwangehê de suneta ywnanî hindêk cudayî heye ku li dest pêkê bîr û buçunêt olî djî êkin yan retkirîne ev berhem ji bu hemî wan kes yê hatiye nvîsîn ku dixazin bi belgeve gringiya babetê de şarezabin ku bi dirêjahîya çend hezar sal hatiye rûdan.

Şluve kirina ziman bi tinê wekî bernamekekê zansîtî û babetekê diyar kirî temaşe naken belkî divêt ew hemî şluve kirin tîrwanîna derbarê ziman hene pêşkêş kirine her yek ji wan bibne beşeka gring û bi sîd di nav pruse ya giştî û zansîtê zanîna mruvîde, guhrînêt ziman di dîroka li rwangeha ziman niasînê bi derbaz bûna nîk bi hizar sall zimaneka hevbiş di nav yek ziman de û ew ziman li çend cihên cud de dûçarê guhrînên bingehî çêd bin çend lqên serekî çê dibin ku bi curek lêk têgehiştin di navbera wan rû nadet, ji bu mînak zimanê latînî ku çendîn

ziman hatîne cuda bûn wekî îtalî û îspanî û ferensîhwd. ku fam kirin di navbera wande ji asteka baş nîne, ziman nyasîna nû wisa xwe diyar dikit ku bibîte cihê sersurmanê bi dîroka ziman, dirêjîyê bi jiyana xwe bidit ku di didû rwangeh de diyare ya yekim ewe ku bibîte serincrakêş di dîroka dirêj yan tîjbûna tiştên snurdar diket, ya didûyê ewe ku bişt guh havêtina dîroka zimanê rû bi rûya dûbare kirina ziman di bineve li destpêka sedê bîstê zansitên mruvayetiye û zansitên zimanê nû bi şêweyeka taze û bê layen derkeft ku encamê şluve karên zêde û berifreh giştgîriya vî zansitê bîne egerê belav bûnê bi şêweyekê blez û heta gehiştîye hindê babit yek ji serekîtrîn zansitên zansitê mruvayetiye û têkel bît di gel zansitên dî ku bi aşna bîna fêrixazê di peywendiyên zansitên ziman bi zansitên din li vî babetê de diyar dibît

pênasa bingehî ya ziman û ziman nyasîne

zansitê ziman nyasîne û guhrînêt wî

peywendiyên nfîsîne û zimanî

peywendiyên ziman nyasîne di gel hemî zansitên din

pênasa çawg û deng nyasîn û morfolojîhwd

Paşî bi şêweyên giştî ziman niyasîn li hemî beşên çalakyên mruvî de, anku li wî cihê mrov bêtivî ziman û zimanê têda bikardînît, beşdariyê dikit û hebûna xwe diyar diket ku evro tû şluvekar û vekuler nîne ku heza xwe li pêdivîya zimanê de neşêt diyar ket ku herdû curên zansitî kardêkirina xwe hebît, ku ev hizr û buçunêt ji alyê hemî qutabxanên ziman nyasîne ve cihê pesend kirin û qebîl kirnê ye, ewe vê vekulîn de hatiye pêşkêş kirin brîtiye ji niyasîneka giştî û pence dirêj kirin ji bu wan rujên dîrok ku ziman bi egerekê jiyana civakî û olî behis ji gringiya

hebûna ziman wekî zanistek di qunaxên dîrokîde kiriye û pênaseya
taybet ji alyê çend feylesuf û qutabxana bu kiriye û gringî diyar kiriye.



DESPÊK

Ji pêkhatina vê vekulînê de bi sê beşên serekî aşne dibîn ku her êk ji wan beşan çend babet û şewazên cudên gringiya ziman ji xwe vedegirît. Beşa yekê xwe ji qalbê gringiya ziman û niyasîna zimanî li qunaxên destipêka ziman dihête dîtin ku li çend cihên cugrafî yên cuda û gelên cuda û ew destipêk ya hatiye dest nîşan kirin ku ji destipêkê de di rujhelata erdê û rexê hîndiyên û yekem kes ku gringî bi wî warê de ji alyê olîve gringiyê diyar kir kesek hebî bi navê panînî ku wek xizmeteka olî gelek bîte bi zimanî da, paşê ji alyê ywnaniyên ve ew gringî ahte diyar kirin ku her yek ji feylesufên eflatun û eristu wekî mînakên gringî dan bi ziman û pênasê û behis kirina ziman di vî beşê de dihêne niyasîn, di paşê de û her di wî beşê de bi şeweyekê giştî behsa ziman niyasînê ji alyê erebên ku ew bi xwe didû qunaxên de dibînît ku ziman niyasîna erebî berê û paşa îslamê ye ku her ji rwangeha olî û her ji rwangeha bazirganî gelek gringî bi şluve kirina ziman dihêt, bi taybet piştê hatina olî ye îslamê û hebûna deqên olîên taybet vê behis kirinê bitir ew gringiyê derdikevêt, di rwangehên din çend qutabxanên fikrî û zimanî û nafçên cezîra erebî serhildaye ku ptir girngî ji alyê zimanê erebî taybetî de taybet li serdemê qutabxanên kûfe û besra de. piştê hatina olî ye îslamê û belav bûn li navçên erebî de ji alyê pêxemberî (slafêt xudê li ser bin) û çend sihabî beşdar bîn ji gringî dana bi ziman û zimanewanî wekî ubey kura keabî, ebdulayê kura ebasî, paşî ji alyê sîbewey vê gringî bitir geşe kir ji danana berhemên xwe bi navê elktab ptir ev gringî dan bi ziman ji alyê erebên ve eşkere dibît,

paşê her vî beşê de zimanên sedên navend dest bi zimanewaniye diket û paşî gringiya wî serdemî û peywendiyên pêgve grê diden, bi taybet ji alyê ywnanî û îspanî û brîtanî û ferensî, paşê serhildana grûpa

purt royall serhildide ku gringiyeka zêde bîter bi zimanî da, Her di vê beş de zimannasiya sedên hejde û nuzdê me yê heye ku destipêka pêşkeftina û çav ve kirina zanayê danît ji bu ptir aşnabûn bi gringiya zimanî û rulla ziman di civakêde û çendîn berhemên vekulînên zimanî hatibûne encam dan, paşê ji nvîsîna ferhengê bîte bi zimanê her netewe û gelekî bitir derdikevêt ku li vê qunaxê hatbûne encamdan, paşê ziman niyasîn ji alyê ruman û ferensên dihêt ku her yek ji van î çavlêkirinê û gringiya zimanê bû ji alyê yunaniyên bi xwe bi niyasîn û şluve kirina ziman mjîl kirî bûn.

Di beşê didûyê de dê aşnabûn bi çend warên ziman û gringiya ziman û taybetmendiyên zimanî ku ew bi xwe çend babetên diyar diket her babetek rull û gringiya zimanîya xwe diyar dikit ku hemî babetên vî beşê bi şêweyek ji şêwazên peywendiyên bi yekve heye û rul timam kirina yek dî dibînîn, di destipêkê vê beşê de têbîniya wê çendê kiriye ew taybetmendî çine ku ziman ji xweve digrît û paşê geşe dikit û hukarên berifreh bûna ziman û hukarên diyar kirin ku rullê di geşe kirin û berifreh bûna ziman de hene wekî hukarên abûrî û cugrafi û siyasîhwd.

Paş ku çewa geşe kirina zimanî heye herwisa jî mirna ziman jî heye ku erê ziman dêhête mirin yan karîgerên katê kirinê ziman çene ku ziman bihête mirîn û bi mirî bihête hejmêr. Dîsa hukarên mirna ziman yêt diyar kirin, paşê li ser gringiya ziman û bayexên zimanî vedukêt û rull û erkê ziman dête diyar kirin û peywendiya ziman bi hizir û ew guhrînên zimanî dihête rûdan dibine egerên guhrîna ziman ku çendîn hukarên derve û navxwe dewarên xwe dibîne di vê guhrînde, paşê çewaniya dabeş bûn û dûwabîna zimanî rûn dikit. Peywendiya ziman di gel waqe behs dike, her di vê beşê de curên ziman dête diyar kirin ku

cendîn curên hene wekî zimanê yek birge û zimanê pêkve û zimanê şîkar kirî û taybetmendî yên her yek ji wan zimanên yê hatiye rûn kirin û di paş de gringiya ziman û civak û peywendî û rull û erk û karîgerî jî hatiye behis kirin, di dumahiya vî beşî amaje bi ziman û gutnê kirî ye ku cudayî û havbeşî di nav bera ziman û axiftnê kirî ye.

Di beşa sêyê de ku bi beşa dumahî ya wê vekulîn dihêt, ku berhemên beşên berê û praktîze kirina van beşan rûn dike û ew rull û erk yan ew qunaxên ku ziman li sedên berê derbaz kiriye û gehîştine qunaxên sedên nû anku sedên nuzdê û bîstê yê şluve kirin, di vî beşê de alyen tîwrîyên ziman û curên ziman niyasîn ji wekî ziman niyasîna tîwrî û dîrokî û civakî û başa zansitê ziman ku wekî navenda(kirok) ziman yan rêzmanana ziman hatiye danan wekî deng nasîn û peyv nasîn û riste nasîn û raman niyasîn, bi şeweyeka hîr beşên wê diyar kirine, paşî beşê raman niyasîne de gelêk bi hîrî amaje bi curên raman nasîne kirîne ku wekî raman nasîna felsefî û mentiqî û raman nasîna zimanî, her wisa curên raman û beşên ramanên dihête diyar kirin, paşê curên ziman nasîna dîrokî û gringiyê wî jî derdêxît û paşê ziman nasîna wesfî û beşên peywendiya stûnî û asoya ziman diyar diket, paşê ku çend qutabxanên û grûpên behis bikên, her wisa amaje bi çar şureşên gringên ziman kiriye ku di qunaxên cuda yê ziman de hatîne rûdan, paşê çend qutabxanên ku rullê xwe di vekulîna ziman de hebûye behsî dikin wekî qutabxane ya bunyewî ya sosêr û paşê qutabxana ya bunyewî ya emrîkî ku ji alyê franiz bwaz û blum fêlld û edwart sapîrî li jêr kartê kirna nerînên sosêr hati bûye damezrandin.

Paşê qutabxane ya ziman nasîn kubin hagin ku di sala 1930 hate bû damezrandin ji aliye ziman nasên bi nav û deng lunî trîl îlmisf, paşê qutabxane ya ziman nasên prag ji alyê çend zimanewanêk ve wekî andir

martîne hate bûye damezrandin ku gringitrîn karên wan ji diyar kirina astê ziman bû bu sê astên serekî, astê raman û astê rêzman û astê axiftnê(gutn) paşî qutabxana lenden behis dîket ku ji alyê fêrsewe hatiye damezrandin ku li ser binemayên têrwanînê bi didû zemînên taybet vekulîna ziman anku wesif kirin anku ser binemayê barên dewruber û funulujî diyar kir, paşê li dumahiyê behsa şurşên gringên ziman di dima nû ya dihête kirin ku ji alyê nwam çomsikî hatiye encamdan ku bawerî ya heye ziman dizêt û dirûsit jî dikit herwesa bu her ristekê didû pêkhatin yê danaye yekem pêkhatyên nav ziman ku peywendî raman û mentiq ya beşên riste vedgirî û ya didûyem jî pêkhatina derve û diyar kirina riste vedgirî. paşê cuda hiya bîr û nerînên çumsikî û sosêr û yan bîr û nerînên çumsikî û qutabxanê berê xwe diyar diket.

Ji bu nvîsîn û berhemê anîna her babetek rûbirûya çendîn blindî û nevî ya dibîn çendîn arîşên curbicur pêşbinîkirî ye û bi şêweyeka cuda beram berê me serheldiden her ji arîşên aburî û demî û jêderên taybet, herêma me jî di arîşya nebuna xizmet guzariyê ku bi şêweyekê rasteû rasit kartê kirin li ser bîrkirina babetên heye ev arîşe hemî dibine egerê kê m û kêmasî di vî berhemê de û vekulîna min jî de diyare bê arîşe nebuiye, lê supas ji bu xudayê mezin ku ez şyayim heta radeyeka baş ser arîşa serkevtî bim, di axiftina dumahiyê dê dibêjim berhemê bi destê miruv berdewam bê kê m û kurtî û xeletî nebîne ji ber hindê daxaz ji xandevanê berêz dikem bi çavê rexne kiriyê binyat babetê binerênin çunkî xeletî û kê m û kurtî ji alye vekoler veye,bi hîviya gehandina bêzanîn û pêşkevtina pênusên xurt.

BEŞA YEKEM

1 BEŞA YEKEM

1.1 Ziman Nasî Çi ye

Ziman nasî zanisitê nasandinê û vekolînê ye, bi rêyek zanistî û mebest ji mîtoda zanistî ewe ku waqayet (lojîk) û diyarde û berceste-yên (piraktîkirina) zimanî kum bikun û bikun pul (grop) û bikyne pêrsitêka tamam, di vî alîyê de dê bigehîne encamek, li dûvda ew encamê bi dest me kuvtî dê egerên wê pêvîn heta ku rastî û heqîqeta wan encama weku bîr û boçunekê bihête qebul kirinê yan jî red bikun û bi şêweyekê giştî wan bîr û boçûnên qebul dikun (civakî û rêgirtin û aborî bin).

Mebesit ji civakî ewe ku hemî rastîya bi xwe ve bigirê, mebesit ji rêgiryê ewe ku çî curê dijberêk li nav xwe da rê nekut, herwesa mebesit ji aborî ewe ku sade û rûn bît yan jî bi şêweyekî dî kurt û puxt kirî bit.

Eger hat her bîr û boçunek ji van sê pêveran nehête pêk anîn qebul kirin, yan şaş debit û di pêşnîyaz kirna zimannasî da û di xwendina bîr û boçûnan da girîngî pê nahête dan, belkî ewe ku cihê bayx û girîngî pêdanê ewe ku çewaniya pîvane kirinê û vekolînên dîardan û wesf kirina van bîr û boçunan digel hindê zanisitê zimanî tenê dîar kirin, û bi pîyaheldanên wan bîr û boçûnên şîrove nakut yan jî bi xweve nagirît belkî di geranê daye bi dûv egerên cudabûna û dahênanên viguhrînen wan diyardan û vekolînên xwe encam dide di vî laîda em dşên wê bibêjîn ku zimannasî zansitê vekolîna zimanî ye.⁽¹⁾

Çê dibît bêjîn ku zanisitê zimanî vekolînêka zanistîye ya zimanî ye, çunkî vekolînê di hemî beşên zimanî da dikut û bi vê çendê dibêjîn zansitê zimanî, çunkî beşên ne serekên dîyên zimanî wek dengsazî û

⁽¹⁾ D. Mhir Baqrî, *Miqdmat Ziban Şnasî*, Antişarat Danişgæ Pyam Nur, Tihran, 1383. R.3

morfolojî û sîntakis û sîmantîk, her yek ji van beşan di çarçoveyeka diyarkirî da şîrove û vekolînên wan dihête kirin. Ji ber ewe neçête nav wî qalbê giştî ku bi zanistê zimanî binav bibin.

Her wisa ji alyekê dî ve dû cureyên şîrovan ji bo zimanî hene ku ew jî ji alyê dîrokî (daykironî) û alyê cêbecê nuhî (saykrunî) ku eve jî bi heman şêwe neşên xwe di çarçoveyeka giştî da bibînin bi temamî zanistê zimanî bi xwe ve nagirîn. çunkî her kîjan ji van alîyên ku alîyên dîrokî zimanî şîrove dikun yan jî alîk di qonaxek diyarkirî da diyar diku. Ji ber hindê li vêre de dibêjin zimannasî vekolîna zanista zimanî ye ji ber ku van hemî beşa di vî çarçoveyê ye da diyar dikin û şîrove dikin.⁽²⁾

Her wekî ji navî wê diyare vekolîna zanistî ya zimanî xwe bi vekolîna zimanê dayikê ve mijûl diku, belê li dest pêkê bi têgehiştina giştî ya zimanî ve mijûl dibî, zêdetire û heta nuku çî kus çî ewên zimanzan çî ewên xwe bi vekolîna zimanî ve mijûl kirîne çî jî her kusekê dî ne şîyaye yek ji sedê wî zimanî bizanît heta bigehîte hindê ku vekolîne li hemî curan bikut.⁽³⁾

An ku ji alîyê ve vekolîne li hemî zimanan bikut û ji alîyê dî ve wan xalên giring ku mirovayetî hene û li çalakiyên cur bi curên fîzîkî û kîmîyayî û derûnnasî û kumelnasî û nejad heta digihête felsefe û mentiq ku evrûku tû kus nîne di hemî biwarên da vekolîne biku û bi wî şêwê berfireh şîrova zanistî bikut, eger kusek bixaze digel zimannasiyê şareza bibît, çewa dê şet hîvîya wî zanistê cur bi cur hebît ku hemî taybetmendiyên mirovên û ziman hevbeşe di hemiyan da.

⁽²⁾ D. Kamîl Mhimd Qeredaxî, *Ziman*, Çapî Yekem, Slêmanî, 2007. R. 13

⁽³⁾ D. Mhir Baqrî, *Miqdmat Ziban Şnasî*, Antişarat Danîşgahê Pyam Nur, Tîhran, 1383, R.3.

Ji alîykî din jî cûdaî di navbera zimannasî digel wî zanisitên din ku vekulîn li ziman diko kêm ta gelek zimannasî ji bo şirovekirina zimanî bixwe bikar tê û bikar tîne. Lê zanisitên di di pênavê pêdaviyên xwe da bi kar tînin wek hindê ku bo rûn kirina gotar yan yasaên bîr kirinê û yan derhavêtinên kumelgehê yan endamên gûtin ...hwd). Li dûmahîkê ewa ji bo zimannasî dimînit tiştêku ew jî binemayên zimanî û karên zimanî li nav zimanî bixwe da.

Zimannasî îro zanisteku her wek zanisitên di xudan şewaz û yasaw çendîn binemayên hatine dîtin û taqîkirin û damezirandîye li ser binemayekê diyarkirî, pirtir ji rastîyên zanisitî yê zimanî yê bi dest kutî ji dûmahiya seda 19 û destipêka sedê 20 êda nêzîkî zanistekê tamam û cêgîr kir.

Divêt ew jî bête zanîn ku zincîra (silisî) zanisitên diyar bi navê zansitê mirovayetiye anku ew zanisitên ku cihê daxaziya mirovîne (derûnnasî, mêjû, komelnasî, huner,...hwd) zimannasî ji temamtirîn û pêşkuvtî trîna vane, bi şeweyekê ku beşek ji van zanisitên bo xwe nivtîre kirî xistine nav çarçûva şiroveyên xwe wek (xellknasî, rexnaedebî ...) ku şîwaz û ryekên wan û heta zaravên wan jî li nav wî çarçûveda winda bûn û hatene şûl pêkirin.⁽⁴⁾

Zimannasî zanisteku diçîte ser xwendina alîyên cuda yê zimanê mirov heta radiku ji haw beşên zimanî û alîyên folklorî û kultûr û organîzeşin jî vedikulît, û cûdayeka gelek girîng digel zansitên di heye ku ew jî ewe zanisitên di gelek bi sanehî dişên bihêne taqîkrên û kontrol kirinê û encamên wan jî cihê bawer pê kirî bît, belê di taqîkrinên zimannasîne da neşên axaftin kirêna zimanekî cûda ji kumelgehê bîne

⁽⁴⁾ Abwal Hsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şnasî*, Entişaratê Nîlûfer, Tihran, 1358, R.3.

taqîgehê ji bo dest nîşan kirina wan gohrînên ku di axaftên da rû dide û taqîkirina encam bidin, eger bo demêkî kêr jî bit encam biden tû berhem nabît û eger her tiştek hebit jî cihê bawerî pê kirinê û qebûl kirinê nabît.⁽⁵⁾

Ji Bu gehîştin bi huyrî û dirûsitî ya zanisitên ezmûnî, ewe ku çend zarokên li destpyeka ji dayîk bûnê li kumelgehê cihgir bikun û her yek ji van zarokan hemî ew derkutinên zimanê wan di hel û mercên cor bi cor da kontrol bikun û ku ewe jî kêmtirîn cure taqî kurîye û kêmtirîn xeletiyên taqî kirinê zimanî tê da dikin, ji bilî ku di alî mirovayetîyê da karekî ne dirûst û ne rewaye. Ev kare zêdetir bi mebesta gehîştin bi rastî û dirûsitiya wê ezmûna ku zansitê zimanî encam dide bi wê mebestê ku heqîqeta zimanî wekî zanistekê kurt diyar bikut .

Zimannas jî wekî zanisitên dî liq û beşên dî yên xwe hene bicih maytirin (ebistraktirîn) beş , beşê tîorîyê zimanêye ku digel matmatîk û mentiq da (lojîkî) havbeşî ya heye anko hemî beşê tîorî yên ziman û pêk hatina yasayên rêzimana zimanî pêk tê û bi kumkirina peyv û ristên wî zimanî mjûl dibît. Babetê temamî û rêk û pêk di heman wext da diyarkirîna cuda kirina zansitê zimanî çî ye? Ku ewe babetekê gelek aloz û têkule, zanistên dî babetên wan di pêştir da vekolîn û zanyarî li ser heye û li ser wan binemaên dişên bi şewekê cuda berhemê nû şrove ya nû bînîn hebûnê, belê di baznê karkirina zimannasî da tiştekî bi vî cure gelek bi kêrî, yan em dişên bêjin her nîne û şewê berawirdiya wan (pêk girtna wan) diyar nîne wekî ewe di zimanê kurdî (soranî) ku (bû) bikartînin çendîn şewe û cor û ramanên cuda bo hatîye danan ku di şewê nivîsînê da bi ramanekê dihêt û di şewê zarave da bi çendîn ramanên

⁽⁵⁾ Atonî Arla Tow, Wer Mehdî Senendecî (Hewar), *Berayek Bo Zimannasî Mîjû*, Weş Xanî, Çapî Yekem, 2013, R.142.

cuda kumdikun. ji ber wê çend binemayên şîrove karên zimannasî bi wî şêwe pêşkuvtine berev pêşve neçûne wek zanisitên dî li demê şîrova nû kêmtirîn guherîn yan xeletî têda bikun.⁽⁶⁾

Firdînan dî sosêr daxaz kir ku eger bêjin zimannasî her wekî zanistên dî kar dikut û wek wan jî zanisteku serbixwe ye, divêt berî hemî tiştta bîreweriya zimanî wek ewe ku heye bihête tomar kirin, û tenê pişt bi wî şêweyê hat nasandin û diyar kirin, wî demî dişên di dîroka zimanî da bi huyrî praktîze û şruve û vekolîn bikin.

Di heman wextê da Sosêr ewê çendê tîne bîra me ku ziman pêk hatiyekê yasayî aloze lê yek alîye, anko pêkhatîye ji yekuyeka diyarkirî li ser binemayê yasayî ku li astê cuda da têkulî yek dibin, şulê zimannasî li destipyekê ewe ku şîroveya wan yasayê bikut, piştî nasînêka berfireh û تمام wî demî dişêt xebatê vekolîna zimannasî di warê dîrokî û nuhî da bikut.

Di rojhelat û kurdistanê jî da ev zaniste wek xwe giringî pê nehatîye danan û cuda nekiriye ji hindêk zansitên dî û zaravayên dî ku digel zanisitên wekê dîrok, zimanzanî, rêziman nivîsîn, ferheng nivîsî , guhrînên zimanî, zimanê dêrîn, zarave ji tu van nîne ku di rastîyê da cihê van hemî di nav zanisitê zimanî da dibîtin, û şîrovên je bo dikun lê berî herteşit van bît di babetê zansitê zimanî da vedikulin hewl didin derkuvtinên zanisitê zimanî wek beşekê zîndî yê cîhana hestî (hebûy) mirov bi wî şêwê ku heye şîrove bikut û nas biku.⁽⁷⁾

⁽⁶⁾ Micle Whîd ,*Wer Zya Aldîn Dihşîrî*, Asrê Firdînad Sosêr, Mewzûea Ziban Şnasî, Şmare 12 , Sal Dûyem, R 44,S 1385.

⁽⁷⁾ Micle Whîd ,*Wer Zya Aldîn Dihşîrî*, Asrê Firdînad Sosêr, Mewzûea Ziban Şnasî, Şmare 12 , Sal Dûyem,1385,R.45.

Li vêre mebesta me ye bêjn ku di lêkulînên pêşiyê da heta sedsala nuzdê hemî lêkulînên dîrokî zimanî bûn kêmtir nêzîk bûn li şêwê zanistiyê şîrovekarya zimanî, belkî piştî seda nuzdê pêngav berev hindê çûn ku ziman zanistekê serbixwe cudaye ji şîroveyên pêşyê ku bi tenê bi mibiesta hebûnê û diyarkirina zimanên burî (rabridû, kevin) kiirbûn û encam didan, lê zanistê zimanî û zimannasî ew tewjim (serdem) gohrî bi şêwekê ku wekê zanisteka serbixwe şêweya xwe derbêx.

Ne rast nîne ku bêjim ew lêkulînên derbarê ziman hatine kirin, kuvintirîn û dêrîntirîn bin, heta wan vekolînên ku derbareyê dînî û olîên kuvin kirne, ku di cevakên da ol çavkanîye rewşenbîrî û pêşkuftina hemî cevakên bû ye ew jî şaş nîne eger carên dî bêjim ew girîngiya ku bi ziman û vekolîna zimanî hatîye danan gelek berfirehitr û pêtrî ji bi olîye dane ew jî çavkanîe xwe ji wê werdigirîn berî ku şêweyên nivêsinê pêda bin çendîn curên derbirîn ku je deng û nalên cûda pêk dihat û je bo birêvebirina civakên hebûne û li dûmahîyeda ku şêwên nivîsinê peyda bû wekê vekolîn, amaje û efsane û mîtolojî û wêne kêşan û teşbih kirin ku evane çendîn vekolînên tamamne di hête zanîn heta wî demê digehîte elfu bêya, rastiya wê giringîyê dê bu derêxin ku dane zimanî û curên zimanî, ku çavkanî te jî kirina pêdaviên wan bûn ji qonaxekê ji qonaxên dîrokdîa.

Niha gotineku ne rêk heye wan hemî guherîn û wan hemî taybetmendiyên nihîne dîtin û piştguh diêxin di çarçêveyê zanistekê dîda kumbikun û didemekîda di zanistekê sebixwe wekî zansitê nû xwe yê derxistî, bi hindê ku di zanistêda nasîna babetan diyare ne çareseriya Kumêka babetên ku peywendî bi babetekê dî ve hebît.

Di vêrê da dêvît ew rastî bihêt eşkure kirin ku zanisitê zimanî di çarçovê felsefê da kum bikun û her di wî çarçoveyê da vekolînên wê bihêne encamdan û bi xwe înkara peywnedîya zanista zimanî û felsefê nahêt krin û bilkî zansitê zimanî şîyaye di çarçuvê babetên xwe da heta astekê gelek baş pêş bikuvît û kArîger bûna xwe piraktîk bikut, lê zanisitê zimanî êdî bi wê çendê razî nabît ku biêxne nav heman qalibên berê hingî da, wek feylesofên berê nû bi dû rûyên yek diravî zanîne, lê zanisitê zimanî eveye ku peywendê tund goherîn bi serda îna, ne di çarçovê felsefe da û bi şêwekê serbixwe zanist bûna xwe selmand, ku ew jî bo seda nozdê di zivrît.⁽⁸⁾

Zanista zimanî hewll û bzava wê ewe ku nasîna naveroka zimanîbidet, rê didanît bo pyek înana kurestîyên zimanî li ser rê û rêbazêkî zanistî yê bihêz, demê zimannasî ya rasteqîne bivêt ji zimanî vekolîne biku wesa li dest pêkê temaşey kuresteyên zimanî dikut, û li dest pêkê ji kuresteyên seretayî û bingehî ango yasayên danganê wî zimanî vedikolîne ew jî bi mebesta derxistna rastî û dirûsitya yasayên dengî û bi kar înana wan bi sanahîtrîn şêwaz.⁽⁹⁾

Li vêrê di gehîne wê rastîyê ku zimannasî zanistekê sebixwe petîye û di çarçuvê zimanî da karên xwe encam dide, lê mexabin ta niha ev zanisit weku pêtvî di kurdistanê da giringî û biha pê nedaye di çarçovê ne serekî hatîye temaşa kirin, û heta ku çavkanî nivîsnî jî hind nîne ku cihê razî bûneka mezin û girîngiya zanistîkî bît.

Zansitê zimannasiyê di bêjîte me pêdivîye berî her tîştîkî ku şîroveyên ziman berifreh bikit, pêdivîye ku bizanîn xweda ziman çî ye? naveroka xwdîye ziman bixwve rûn bikin.

⁽⁸⁾ D. Alî Mhimd Hiq Şnas, Az Alm Ta Fin ,R 20.

⁽⁹⁾ D. Mhimd Emîn Hewramanî , Fîllojî Zimanîkurdî.

1.2 Ziman Çî ye

Ziman pêkhatîye ji sîstemekî hêmayî û rêzimanî, diyardeyeka civakîye, û çê dibît ku cûdaî bikin ji wan şêwazên ku takên bi kar diîna. Ziman ji nevyekê bo neveyêkê dî tê veguhestin, mirov je civak werdigrît û berhemê tak nîne, belkî zad û berhemê civakê ye zaruk li malê yan jî li fêrgehê fêr dibe anko fêrî ziman nabît belkî li ser di hête sepandin dişên bêjnê ziman diyardeyeka komelayetî berbillave û hemî hukarên bihev gihiştine ji sîstem û hêma wê rêzimanê bixwe ve digrît .⁽¹⁰⁾

Ziman diyardeyekê bê seruber û têkul nîne belkî hemî tîorên zimanî rijdin li ser ewê yekê ku ziman sîstem û pêrewê, sosêr şureşa zimanî li ser binemaê zanist kirina ziman û sîstematîkî û peyrewya zimanî dest pyekir.

Çunkî pêtir ji wan binemayên bo lêkolîna zimanî kirin û zanaên amaje bi hindê dikin ku ziman dergehekê sîstmatîkî yasa bende û dixazît wî nîşan bidet ku ziman bi tenê deng û peyvan nîne belkî dergeheku ji peywendîên li ser yek binema û sîstem pêk tê.⁽¹¹⁾ Zimana mirovayetî diyardeyeka zîndî civakî jîrî û derûnî û gelek ji alloze, bi hindê ku sîstemê pêk hatina di nav yekda çûn û pêkve grêdayne û ji çendîn beşên cûda pêk tê. Bi wê eger civat û Pêywendiya mirovayetiyê pêk hatiye û roj bi roj ev pêwendî kumelayetî digel nû bûna jiyane û guhrîna wê da di hilkêşan û berev pêş çûnêdaye û di ghorît û pêş di kuvît û alîên wî nû dibin û erkê havbeş di civata cûdahîya mirovayetîda dê bîne.

Ziman ew amrazê dahênanê ye ku mirov hîn bûye, û çî caran neşêt je wî waz behînt çunkî bi vî rê dişêt erk û pêdiviyên xwe bi cih bînît, bê

⁽¹⁰⁾ -D. Dara Hmîd Mhimd ,*Hendê Layen Le Tyoryekanî Ziman*, Weş Genc, Çapa Yekem , Slêmanî, 2014, R 38.

⁽¹¹⁾ – Ç.B, R 56.

ziman bi şêwekê tmam bu birêve naçît û derbaz nabît, ji ber hindê rol û kartêkirina di jîngeha mruvayetîda gelek girînge jber hindê cih hizir krin û huyir bînye⁽¹²⁾.gelek ji mêje ziman (zimannasî) mjûylî hindê bûn û heta niha jî berdevame ku hemî tişt di babetê zimanîda rûn bikun û çî tiştê çêşartî nehêln di hindek alyanda serkuvtî bûn û di hindekên dî da serkuvtinên baş bi dest ne înan, bellgîn tmam bi dest ne kutin ku cihê bawer pêkrinê bin wek çewkanîya dirûsit bûna morfîm di bingehîda .⁽¹³⁾ ew ku gelek rûne di babetê zimanîda ewe ku ziman bi desthîka mirovayetîye bê hzir krin û li destipyekê were kus mjûylî wê yekê nebûye, û çî kusan jî endaze bo nedanîye .

Ziman nasên înanî û roman bi şêwekê wesa li qelem daye ku ziman ew zanînî peyvane li cihê fêr kirina zimanî, li alîyê Ereban jî heman bîr û boçun hebû heta ku di serdemê zêrînê îslamêjîda ziman nasên Ereb di gût: zimanê Erebî û rêzimana Erebî je bo hemî zimanên rojhelatî çê dibe û guncaye, ku lêhatîye, yan jî bûye diyardeyekê bawerpêkrî di rojhelatêda. heta ku wî demî ziman nasê Ereb yê bi nav û denig (abin xildûn) nêza (600) sala berî nuku ya gut: ziman brîtye ji şîyan anku guh lêbûn û axivtin û xondin û nvîsîn, her wesa Hindên jî di vî barêda pêkula xwe kiriye ku naçêbît wan pyekula nadîde bigrîn, ku nzîkî 2500 salla berî niha behsa Ziman û kuresteyên zimanî kiriye, ku yekum çavkanî bûn zansitê zimanî jî berhem hat (Panînî) bi vî şêwe pênase yan jî navnîşanên zimanî heldane : ziman brîtîye ji yasaya dengî ya rêk û pêk bo fêrbûna zimanî pêdiviye fêrî yasaya dengî bibî û li dûvda rêziman û beşên dî. Ziman nasên rojavayî di pêkullên berdewam dane bo hindê da nav û nîşanên zanista zimanî diyarbikun û bigehene ew rastî ku erê ziman çî ye? binemayên zimanî ji çî hatne? heta ku sêveda berî

⁽¹²⁾ -D. Refîq Şwanî, *Zimanî Kurdî û Şwênî Le Zmananî Cîhanda*, Weş Xanî, Dihok,2008,R 9.

⁽¹³⁾ - D. Mhimd Hewramanî, *Fîllujî Zimanîkurdî* ,R 24.

(edwrid sapîr, palmer, rîçard û frîz) her yek ji van bi şêweyk diyar kirêne û bi cûday pênase je bo zimanê û vekolîn zimanê kirine.

Di rastîda em dşêyn bi şikleke di van pênasanda gotenên wan kumbikin di yek tiştê ew jî ewe: ziman yasayeka dengî ya ryek û pêku û li ser şiklê peyvên dema dengdar diçît, û bikartê di navbera dû kus yan jî zêdetir liser bingeha ewe ku ziman digel beşdar bûna hestanda xuyeka mirovayetî komelayetî ye.

Mamosta tufîq wehbî di desturê zimanê kurdîda bi vî corî behsê ziman û navûnîşanên zimanê diku: ziman nîşandana hizra me ye bi hArîkarya peyvên û ziman tiştêku tê gutin û nvîsîn li ser wan binemayên derbazbuyn dişên pênaseyeka tyekul yan jî berfireh ku hem ya hemî alyên bît, hem rêgir bît li ser zimanê encam bideyn ku hemî beş û binemayên esasî bixweve bigrît û ew jî ev pênase ye (Andir Martine) ku di pertuka xweda înyê û heta evroku bi tmamtirîn pênasa zimanê tê hejmartin ku dibêjît: ziman yeku ji amrazên peywedyê di navbera takê mirovayetîda ku li ser vî binemaye ezmûnên mirovayetî di her civatêda bi şêwekê cûda taqî dikin,* dabeşa ser çend beş dibin xwedanên çarçûveyên ramanê û wêneyî û dengên bi navê murfîm, ewjî carek dî dabeş dibin li ser yekuyên bçuyktir dibêjnê deng ku jimareya wan di her zimanekî da digel zimanekî dî cûdaye.⁽¹⁴⁾

Wek me gut ziman girîngitirîn amrazê peywendiyên mirovîne, stuna hemî diyarên cvate di vêreda zimanê musîqê û zimanê gullê û wêney hemyan dê rakuyn, çunkî eve bi tenê xasitneku û çdî nîne.

* - Ezmûn Bîr Kirdnewey Hizrî û Eqllanî Yan Hestî Û Atfî Çi Be Şêwey Wêne Yan Emrî Yan Daxwazî Yan Pirsyarî û Le Esasda Ewey Ku Le Bîrkirdnewey Mruvda Heye . Çi Ewaney Lew Dinya Da Bînrawn û Çi Ewaneşî Ku Le Dinyay Hoşdarî û Le Deqekanda Ezmûn Dekrên ...

⁽¹⁴⁾ – Abwal Hsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şinasî*, 1358, R 33.

Ne musîqe zimane û ne wênekêşan û ne peykur taşîn û heta ku peywendî bi zimanîve hebît jî ew bo derbirîn û hazer kirineka taybet di çarçovê karekîda dêmînît û nabine ziman, bo çî nayêne hijmartin ji ziman? çunkî madew pêk hatenên wan ziman nîne herwekî ziman ji je morfîm pêk tê sadetrîn amrazek ku evro em di jiyana da bo peywendî kirinê bikardînîn dirûsitkirina wan denga ye ku ji dev dihêne derve û dibin beşek ji raman û guhgir di wataên wanda digihije, bi rêve çûn karekê taybetê karên yek ji endamên laşeye, lê ziman wekê vê nîne, di qalbê giştîye mirov da beşekê diyArî krî nîne ku taybet bît bi ziman, helbet di zansitê raman û denganda behşek heye derbarê endamên gûtenê, lê divêt ew bihête zanîn ku karê esliyê wan endamên leşî bijîlê derbirîn û giftûgo û derêxistna denga, karê serekî di proseyeke dîda cîh bi cîh dikin yan dşên bêjin di dû proseyên dîda havbeşn wek di axivtin û derêxistna denganda û hArîkarya mirovî di xwarn û xwarnandaw rollê yekê dibînît ku bi şewekê ziman hrîkarya cuhîne diku û borîya henasê alîkarya hinartin û şewîlgeh alîkarya pall pêvenanê Hwd. Jiber wê çendê dvêt wek diyardeyekê komelayetî temaşey zimanî bikin, ku eve dirûstirîn ramanê zanistîyanên zimane. bi wê ewakê ku di berî niha da me amaje bi hindê kir ku amrazê serekî yê pêywendî ya mirovane, ji ber wê:

Yekum: girîngitirîn diyardên civatî ya mirove.

Dûyem: diyardên mirovîye li bin çavdêrîya beşên cûdayên ruhî û cesteî mirovî da, karê ziman jî bi heman reng li ser wî binema diçît.

Sêyem: diyardên civatî di hemî civatên da hebûna wan heye, lê pêtvî nakut reng û erkên wan wek yek bin, ji ber hindê bi wî rengî ziman erkukê diyar krî di hemî komelgehanda hene, lê rengê karkirinê ji

komelgehê bo komelgeheka dî cûdaye bi rengekê fam krin û têgihiştina her grupekê ji grupên dî cûdaye ji ber hindê ev cûdaye dibe egerê cûdaî ya ziman jî.

Çarem: diyarên komelgehê ye çunkî ji beşên bingehî û krokî mirovî nehatne, belkî ji encamê peywendiyên mirovan dirûsit bûne, jiber wê yeku hemî deman di çaverê bûna gohrîn û cûda bûnêdane, eve jî dibe egerê cudahiya zimanî cûdahiya wê jî li dûv kumelgeha dibilezî û drengya gohrînêda di gohrin.

Bi vî rengî dvêt cûdahiyê bikun dnavbera hemî diyarên komelgehê û zimanîda, bi ramaneka dî dvêt pênasa zimanî bikun ku cûda bît ji wî diyardeya komelayetî ku di komelgehanda heye hem ya giştgîr bît û hem jî rêgîr(camêa û manêa) anku hemî ziman bixwe ve bigrît hem jî ji blî babetê zimanî çî babetên dî şluve neku.⁽¹⁵⁾

Ziman bi tenê kurestek nîne ji bo hinartin û wergirtine û têgihiştina peyamên di navbera mirovanda, belkî dîsa ziman kurestê nasîn û nasandina tak û koye je bo her cihêk û demêk. ziman diyardeyekê kultûriye ji ber wê yekê gelek grêdaye bi binyadî cvakî û sîstemê komelgehê, li dûyv sîstemê zimanî (lenguyistik) hemî ziman wek yek başin anko çî ziman nîne ji zimanekî dî baştir bît yan xrabtir.

Di ramana sosêr lenguyistik di civakênda kartyekirina xwe heye li ser zimanî, ev kartyekirin kar dîku ser bingehê zimanî, ziman diyardeku fre guhrîne û hind zana van guhrîna grêdanê bi zimanî bi xwe dîku û hind jî grêda bît bi komelgehêve, ziman bi tenê kudekê sade nîne ku ji alyê hemî mirovaneve û di hemî rewîşanda bi heman reng bikar bihên,

⁽¹⁵⁾ Abwal Hsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şnasî*, 1358,R 13.

belkî ziman kuresteyekê gelek aloze divêt di bîrû boçnên cuda cuda da bihête temaşe krin û xêndin bo bihête krin.⁽¹⁶⁾

Ziman amrazê fam kirinê û têgihîştina hemî mirovane ku bi egerê zimanî mirov di civat, û civat jî di takên digehêt, herwek çewa ziman egerê nêzkirinê civatane û her ziman dibe egerê dûr êxistinê û dûrkuftinê, rêgiryê di navbera civatênda wekî dibêjin bi zimaneka tûnd û dijwar rû bi rûya yek bûn di encamda şer û pêkdaçûn derkut, ji ber hindê dibe egerê je yek dûrkuftna civat.

Pênase ziman li dûv boçûnên aydolojî û felsefî tê gûherîn li dûv aydolojî û felsefeya nasûnalîzim(nasyonalîz, ziman yeku ji mercên here serekyên dirûst bûna neteweye û bi bingehîya civak dihête danan. guman divêda nîne hemî netewên ku di vê cîhanêda hene, tû carêkî bê ziman nebûne û nabin û nînin, lê demê ku temaşe dikin li dûv bawerya markisîzim ziman û zimanê netewey ew biha û rulên girîng nîne, belkî fakterê abûrî cihê wî digrît. çunkî markisî bi tenê di buçûna pêwendiya metiryalîdaye, hemî tiştê û peywendîên civat di nêrna fakterê abûrî xala here serekîa dirûst bûna neteweye ku ew bi xwe bo xwe curekê cûdahîye di navberên van dû aydûlojyayeda ku dihête dîtin.⁽¹⁷⁾

Her li ser girîngî û nayê zimanî mamoste Xall dibêjît: Her gelekê ziman nebît digel gelan nayê hijmartin û nayê nasîn, beruvajîya wê jî her dirûste, ango bi hebûna ziman eger bin dest jî bît dê hebûna xwe selmînît û dê parastinê ji hebûna xwe kut û dê hêt nasîn jî.⁽¹⁸⁾

⁽¹⁶⁾ - Xazî Alî Xurşîd, *Zimanî Fermî Bo Kurdistan*, Dezgay Çap û Pexşa Serdem, Çapa Yekem, Slêmanî, 2011, R 18.

⁽¹⁷⁾ - Husîn Mhimd Ezîz, *Selîqey Zimaneweanî û Griftekanî Kurd*, Weş Kardo, Çapa Dûyem, Slêmanî, 2005, R 71.

⁽¹⁸⁾ - Mhimd Amîn Hewramanî, *Sertayêk Bo Fîllojî Zimanîkurdî*, 1973, R 13.

Ji ber hindê parastna ziman û kum kirina tîp û nvîsîna wan û rêk û pêk kirina wan (ryekxistna) ji parastna jiyana mirovî gelek girîngitre çunkî eger bi hzaran kus canê xwe ji dest biden pêxemêt mana ziman da, wê demî ew netewe ne hête mirin dê bi zîndî mînin, lê eger zimanê netewekê ji nav bir wî demî bi rengekê otomatîkî (asayî) hebûna wan namînt, ji ber hindê ziman bi yek ji bingehên jiyana civakî û ji pêdiviyên wê jiyane di hête hijmartin, her zimane ku mayeya berdewam bûn û bi yek gihiştineye û bingehên bihêz kirina digel yek bûnê ye û mane jî digel yek.

Ne ku her hindê bigre ziman ji wan hemî erkên mirov encam dide mirovahître, tenê mirov bi ziman zanyarî û hest dighurîve, candarên di ew ziman nîne bo gûherîna hestên xwe, di rastîda xudan pêkhatên bayelucîyên temamin. bi hindê jî mirov candarêku axivtin dik (hîwan natq) û cudahiya here mezina digel candarên di ewe mirov xudan zimanê derbirîneye ku hest û zanyarî ya pê vedgohêzî ji ber hindê ziman ne tenê amrazê gûherîna bîr û hizraye, belkî egerê pêşxistin û berifreh kirina biwarên bîr û hizr û ezmûne ji alyê mirov, hindek ji zanayên û feylesofên di wê bawerêdane ku di wî dimêda ku bîr û hzir hebûye ziman jî heye ji ber hindê ziman mirov perwerde diku û amade diku bo dahênanê û beşdarî kirineka jêhatî di jiyana şaristanîda, elf û bêya her zimane liser bingeha fonîmên wan dadmezirê ango bo dest nîşankirina her zimane divêt fonîmên wî zimanî destînîşan bikin.⁽¹⁹⁾

Zanîna dengên zimanî û li yekdanên wan bo dirûsitkirina birge beşeki zanyarya axivtin kurî ye derbareyê zimanê xwe, girîngitrîn alîên ji zanîna zimanî, zanîna wî sîstemê taybete ku denig û ramanê pêkve

⁽¹⁹⁾ - P.D. Wirya Umer Emîn, *Asoyekîtrî Zimanewanî*, Hj Yekem , Çapa Dûyem, Weş Aras ,Hewlêr, 2009, R 5.

grêdide û pêkve diniyasînît, bi wê ramanê eger zimanekê biyanî guh lê bibî tû cure têgihîştinek bu nîne çunkî cora rîz bûna denga ji alyê teve nas nîne û dest pêk û dûmahîka rîz bûna wan diyar nîne, ango sîstemê taybetîya pêk hatiye wê ziman nezanî.⁽²⁰⁾

Ji ber hindê girîngiya zanîna sîstemê her zimanekî merce je bo hînbûna kulepûr û ferhenga wî netewe, bigre jî heta ziman nezanî kultûr û folklorê wî netewe jî nezanî, ango ewa dergehê pêwendiya pyekve bûna mlletan pêkve hêlayan bi tenê zimane ne tiştên dî, divêrêda diyard bît ku ziman girîngitrîn û pir bhatrîn diyardeya mirovayetye, ku eve jî ji hindê çavknên xwe digrît ku liser bingehên dîroka mirovayetî li demên dêrîn, je ber hindê peywendiyên civatî û berdewamî di navbera wanda hebît û pena je bo gelek egerên peywendî kirinê birî ye ku girîngitrîn egerê peywendî û berdewamiya mirovên digel yek bi tenê zimane.

Bi vê çendê dişên bêjîn ziman diyardeyekê mirovayetîye bo agahdar bûnê di navbera yekûdûv da û te jî kirina pêdiviyên yekdî pêwendiya wan şîyayê mezintirîn mifa(fayde,Sûd) ji vê diyarde werbigirîn.pêtir ji wê çendê ziman beşdariyê diku di hemî beşên dî yên civak, û cudahiya civakên jî di zimanê were diyar kirin, bi vê yekê jî taybetmendiyên komelgehane û peywendîyên wan diyar dikin.⁽²¹⁾

Çê dibe ziman wekî di diyardeyekê zêhnî bihête jmrardin, yan jî bêjin ziman ji diyardeyekê zêhnî pêk hatiye ji komêka zanyariya ku grê dayne bi denga û rêzimanê û ramanê û di zêhnê da hebûn heye. Eve ku me dişên ji pertûka zimannasî ya giştî sosêrda hest pê bikin ku sosêr hukarên raste û rastên derbirîna bi diyardên cîhanî derveye derbirînê bi

⁽²⁰⁾ - P.D. Wirya Umer Emîn, *Asoyekî Trî Zmanewanî*, Hj Yekem , Çapa Dûyem, Weş Aras, Hewlêr, 2009, R10.

⁽²¹⁾ - Di Mihrî Baqrî , *Miqdmat Zban Şnasî* ,R 5.

şikust xiwar dizanît û ziman jî bi yek ji wan koma nîşan dizanît, ku her nîşanek jî pêk hatiye ji wênê ramanî û wênê dengî û wênê mifhumî (CONCEPT) û pêwendiya dinav bera wan jî bi peywendêyeka arezuîyê tê danan, ango serbixwe û pêşî wesaye girîngiya vê nîşanê bo zimanî girîng nîne belkî ji encamê girîngiya berambera her nîşanekê ew girîngî der dikivît û pêkve peywendî dar dibin.

Li wî cihê dibêjn ziman berhemê zêhnî ye dişên bêjîn ku sosêr ziman bi berhemêka zêhnî ya danaye, ev jî bi tenê beşeka temam nîne ji wê pirsiyari, çunkî li wê bawere ku çî lîkullîn derbareyê zimanî bê berçav girtna civat tmam nîne, ziman dûr ji civat hebûneka praktîk bûnî jî nîne, her ew girîngiya civatîye ku girîngiya ziman bi yek ji girîngitîrîn diyarîyên civatê tê danan, eve li piştî xwe ji encama kumkirina waneyî ji alyê xwendikarên xwe maye û kum kirîne, bi bawerya sosêr ziman di dû ramanên giştî û taybetîda dibîni û li dûv wan eve di wata ya giştîya zimanda heye egerê pêwendiya civakê ye, û evy di ramana taybetîya zimanda heye ku di zimannasîya giştîda amaje pê dîku, ziman pêkhatîye ji hemî alyen û taybetmendîya zimaneke diyar kirî ku di çarçûvê zimaneke diyar kirîda pêkhatîye wekî zimanê kurdî û Erebî û farsî û îngilîzî hwd.

Bi sûd wergirtin ji deqên tewrat û rojhelat nasî da, Şluzerî gelên Ereben kîvin ser Bi malbatên samî tê hejmartin û dabeş dike ser dû kumên serekî:

- 1- kuma zimanên rojhelat ango samî rojhelat.
- 2- kuma zimanên rojava ango samî rojava ku ew jî dû beşin:
 - Yekim/ zimanên rojava ya şam.
 - Dûyem/ zimanên dûrge ya Erebi.⁽⁴⁵⁾

Dabeş bûna zimanê Erebi li ser kuma samî ji wî çavkanî tê wergirtin ku pêxember Nûh (slav ser bi) kumeka zarûk hebû di nav wan da Sam hebû ku ew jî xudyê pênc kuran bû û bi hoza Erebi tê hejmartin

⁽⁴⁵⁾ - Selam Nawxoş, *Nasyonalîzmî Kurd û Zimanî Kurdî*, Weş. Tefsîr, Hewlêr, Çapa Yekem, 2016, R238.

ku navên wan birîtî bûn ji (Aramin, Lawz, Arfixşiz, Aşur, Eîlam) dabeş bûne, Erebi bi awayekê giştî bo sê kurên yekum vedgere ku Ereban bo sê coran dabeş kirine ku birîtîne ji:

- 1- Erebi el bade/ ku li navçên cezîra Erebi bûn ji niveyê Aid kurê Ews kurê Aram û bi Aid Aram nav û deng bûn.
- 2- Erebi el arebe/ bi qehatinyan nav û dengên wan belav bû, û zimanê Erebyê kivin bi kar di înan ku piştê gohirîna serdeman jî dabeş bûn bo dû beş:
 - Yek: zimanên Erebi başûr ku ji hozên başûra cezîra Erebi wekî hozên (Meîne û Sebeîye û Himîrye) ev core bi kar anîn.
 - Dû: zimanên Erebi bakûr ku hozên bakûra cezîra Erebi bikar înan wekî (Semûd û Hiyanye û Sefuye) û bi elif û byê Semûdî nîvîna xwe dikir.
- 3- Erebi el mustearebe/ bi ednanîûn nav û dengên wê bilav bû, ku ji nivêya Îsmâîlê kurê hezretê Îbrahîm (slavên xudê ser bi) bû. Ku ew jî vedgere bo Erfexşiz kurê Sam kurê Nuh. Ku destipêk li ser zimanê babê xwe bûn, piştê ku Îsmâîl digel Cirhim zewac dikin û nivê wan gelek berifree dibe ku li navçên bakûr, piştê ji yek nêz bûna zimanên bakûr û başûr ku ji zimanên (Cirhim û Almemalîq)û(Semûdî û Hiyani) pêkhat bûn û tevlihev bûn bi zimanê Kildanî, eve binemaên pêkhatna Erebyekî paraw bûn.⁽⁴⁶⁾

Bo piştewanya vê nêrînê, nêrînek heye ku dibêje: di encamê îrşa Daryoş bo ser Babil û tole krin ji encamê şikistenê da rûnşitên wê revîn û berev Hîcaz (Meke) cûnkî xelkê Hîcaz û bi taybetî Qurîşî binemaên wan bo Babil vedgere, herwisa efsaneka olî heye ku dibêje: ku Îbrahîm Xlîl Kildanyê û bînemay Mekey dan û kirîye malyekî pîroz û piştê nevyekê

⁽⁴⁶⁾ - Ala Êlcrar, *Tetur Allxe Alarbye*, Mqale, 23/ Uwnîwî 2014, Wwiw.Mawdoo3.Com.

bi navê Îsmaîl hebû ku ev axiftne ji bo tekuz kirina babetê pêştir bikar hatiye.⁽⁴⁷⁾

Zimanê Erebi tenê ji encamê civata (Meke) û bi awayekê giştî axa Hîcaz berhem nehatî ye belkî ji encamê tevli bûna dû pêşkiftinên mezin ku li Mekehê da kum bibûn ew jî şarestanya Yemenî û şaristanya Êxraqî û Şamê bûn. Ku li Êraq û Şamê bi sedema hebûna xelkên Yehudî û Mesîhî ku xudî pertûkên asmanî bûn û herwesa her dû elf û bêy Siryanî û Tibtî hebûna ev jî wesa cê bû ku şaristanyeta Êraqî û Şamê li bajarên Hîcazê pêşkiftîtir bin, heya li Îbin Ebasî jî vedgerînin ku (Mramre kurî Mre, Esemî kurê Sidre û Emir kurê Cdir) ku xelkê Enbar bûn û yekim kes bûn ku bi zimanê Erebi nvîsî bûn ku xelkê Hîcaz ji wan fêra xandin û nivîsînê bûn.⁽⁴⁸⁾

Axiftnek wesa heye ku Erebi pêş îslamê li serdemê nezanîne tû cure nivîsîn û axiftnek nebûn ku ev yek jî bi rengekê zêde bû wek pêkulekê bo biçûk kirina û nenasîna wan zimanên pêş îslamî hate danan, ku di rastêda nivîsîna Yesrib û Meke û nîva dûrgeya Erebi û navçên din desit ve înin ku nivîsîna taybetiya xwe hebû ku ew jî wekî Yonan û Sasanî û Romanên beşekê kêşana nivîsîn û xwêndevanî hebûn û ew jî dihête red krin ku nivîsîna Erebi ji alyê Cuhî û Mesîhiyan bûye û piştir bi awayekî Aramî nivîsîne, belkî awayekî taybet û bi nivîsînek Erebi nivîsîna xwe hebû ye ku bu vê gotenê jî belgên nivîsî hene nvîsînêne ser berd yan jî nvîsînêne ser pêstên ajal.⁽⁴⁹⁾

⁽⁴⁷⁾ - Suead Aynin, *Mqale Zhur Allxe Alarbye*. Wwiw.Mesopot.Com.

⁽⁴⁸⁾ - Selam Nawxoş, *Nasyonalîzmî Kurd û Zimanî Kurdî*, Weş.Tefsî,Hewlêr, Çapa Yekem, 2016,R240.

⁽⁴⁹⁾ - D. Cwad Alî, *Almîfsil Fî Tarîx Allxe Alarb Qbil Alîslam*, Dar Alalm Lalayn, Beyrût, Cild 8,1987,R 673.

Belge jî ewe ku wî serdem bo birêv birna kar û barên eşîran û gehandna nûce û agahdarya bi taybetî şîer bo vê mebesit gelek bi kar hatîye wekî mînak şîera Lebîd dibêje:

متعود لحن يعيد بكفية قلما على عسب ذبلن وبان

Mtawd lhin yeyd bikifye qilma elî esib, ziblin û ban⁽⁵⁰⁾

Ew gotn jî hate red krin ku gotin Cuhîyan nivîsîn û xwêndin fêr Ereban kiriye nêrînek heye ku dibêje: Cuhîyên Yesrîb û wanê din wekî Cuhîyên Xyber Tîmya û gund nişînên bi Erebî nivîsanin û nêrîna (Blazerî) jî ewe ku Yehûdyan xwe fêrî Erebî kirine û kurên xwe jî fêrî wî ziman kirine li serdemê yekimda û bi awayê Erebî dinivîsîn û li qutabxanên wan wî rengî hatne fir kirin, herwekî dîktor Cewad Elî amaje bi hebûna wî ziman dike di nav xelkê Yesirb da û di dîroka kivinda hatîye û amaje bi hebûna zimana Erebî di nav hozên Yesrib dike.⁽⁵¹⁾

Di nav wan da jî ku pêş îslamî û bi Erebî di nivîsîn ew navçe birîtî bû ji (Ebdalirhman bin Cbîr, Abu Eîsa Alanêarî , Alminzir bin Emir bin Xinîs bin Harpe bin Lujan Alxizricî) yek bû ji wan ku peyman bi pêxember(D.X) da û pêş musulman bin bi Erebî di nivîsan û Herb bin Umeye ku xelkê MekE bûhwd.⁽⁵²⁾ Ku Herb bi yekim Ereba hate helbjartin ku pêş îslamî bi Erebî dinivîsan ku ji xelkê Hîre ve fêr bûn û ew jî ji xelkê Enbarê fêr bîbû.

Bi her awayekê bît dikarêt bête gotin ku Ereban pêş îslam corên elf û bêyk hebûn û curek ji rengên nivîsînê hebûn ku xelkên navçeya Erebî ya bakûr û başur kar û barên hunerî û îdaryên xelkî birêve brî bû, ew yek jî bi awayekê hevgrîtî ne bû, belkî her tîre û hozekê bi renekê nivîsan û

⁽⁵⁰⁾ - D. Ahsan Abas, *Tihqîq Şîrh Dîwan Lbîd Bin Rbîe Alamrî*, Weş.Gibe ,Alkuyt,1962 R138.

⁽⁵¹⁾ - D. Cwad Alî, *Almîfsil Fî Tarîx Allxe Alarb Qbil Alîslam*, Dar Alalm Lalayn, Beyrût, Cild 8.1987,R 114.

⁽⁵²⁾ - Abdalcibar Mihmud Alsimraî,Micle Alwahe, *Fislye Yeson Altras Alisqafe Û Aladib*,2008,R 48.

zimanê taybet bi xwe hebû, lê di nav hemî wan da ya belavtir û berfirhtir û rewantir dyalîkta Qurîş bûye ku ev yek jî bi sedema hebûna hendyk faktor dikare wî mezinatya xwe derbêxit wekî hebûna dû hozên mezinên desheladar wê serdemê Ereban ku ew jî hozên (Haşm û Umeye) bûn.

Bi awayekê ku hoza Umeye her ji mêje xwe bi kar û barên bazirganî û meamelat ve mjîl bûn û hoza dûyem ku hoza Haşmî bû xwe bi xizmet krina dergehên Kiebe ve mjûl kirî bûn û zêdetir xwe bi kar û barên olî ve mjûl kir bûn ku pleyka mezin di nav hozanda hebû, bi awayekê ku hemî hoz û şaîran nivîsînên wan bi dîwarê Kiebe ve hlaxîsit wekî mezinî ya wan hozan dihatne hejmartin bi sedema hebûna wan nivîsan û şaîran.⁽⁵³⁾

Ango nivîsîn û zimanê Erebi zêdetir di biwarê havêtin û stayşa olî û hêriş kirin bu ser hevdû û dizijmin ku bandûrek mezin dikire ser wan hozan û bi mezinî hatne hejmartin, ev rewîş û halete berdewam bû heya ku guherînên mezin di cîhana Erebi da rûdan ku ew jî hatna olîyê nûyê asmanî û hatna peyamberek ji hoza wan ku ji alyê xuda yê mezin ve ku ew jî (mihemed)(slavên xudê ser bi), û belav bûna wî olî li navçên Erebi bi taybet ku bûye sedema ryek xistna jiyana Erebi û ektîv kirina zimanê wan bi awyekê di demek kêmda bala desitya xwe ne tenê li dûrgeha Erebi belkî dikarî pêngav bihavêje je bo wan navçên ku heya demekê gelek xudî şaristanyet û zimanê xwe bûn û bi sedema olî îslam zimanê Erebi bûye zimanekî serekî û ew gel û hozên ku bi reçekle Erebi jî nebûn.

1.9.2 Zimannasînî ji Alyê Erebi Paş Hatna Olîye Îslam

Merem di vê qonaxa serdemîda ku hemî hozên û hemî zemînên û derhavêj û guherînîk di dawyê da bi awayekê ku li cîhana zimannasîna

⁽⁵³⁾ - Selam Nawxoş , *Nasyonalîzmî Kurd Û Zimanî Kurdî* , R241.

îslamîda dikari bi zanistekê nû û serbexo û cuda ji zansitên din bihête danan û di dû alyênda dikarit temaşê yan şîrovê je bo vê zansitê bikey:

Yek/ di vê rawangehê da ku sedem derekî û geşe sendinêka derekî je bo gehiştin û bi desit înana vê zaniste nû di cîhana îslamî de tê hijmartin.

Dû/ di vê rwangehê de ku sedemên derekî bandûra wesa dirûsit nakin û bo bi desit înan û geşe kirin û dîtina çavkanîyn vî zanisit pişit bi gel gerim fikir û çavkanên vî zanisit bi taybet di sedey yekim û dûyema desit pêka îslamê dête grêdan.⁽⁵⁴⁾

Dikarit rwangeha yekim li ser vê binyat binîn ku musulmanên dikarin hizr kirin û şîrove kirin û nêrînên di barê zimannasî ji ber her sedemekê bêt wan gela wergirtibti ku wan nêzîk bûn wekî Yonanyan û Hindyan û Romanyan û Arîyan. Ku ev jî wekî rwangehekê tû core Arîşe û griftek têda nîne. Lê demê dikarîn bi kar bihînin ku hemî zemînen nav cîhana îslamî di barê zimannasî û peyda bûna şîrov kirî bit û dem nebûn yan kîm û kurtî di nivîsîna pesend kirî pena bo wê bibît.

Beşekî kêr di sedemên derve diyar kirine ku bibne çavkanî ya peyda bûn û şîrove kirina zanistê zimannasîna îslamî ku ev nêrîn ta ku îro wekî emrê waqe nehatiye çespendin û axiftina zimannasîna îslamîda awayek zanistî tmam wer negirtîye.

Bo derbaz bûna vê nêrîn pêdiviye piştta xwe bi rwangeha dûyem grêdin û çewaniya timam kirina zimannasîna îslamî di çarcûvê zemîna navda binasît û nîşan biden, lewra ev hokare nakuln ku aya bandûra Hîndî yan Yonanî yan Îranî hebû ye di ser zimannasîna Erebi (îslamî) belkî raste û rasit di nav xwe de gelê îslamî bi taybet li navçên

⁽⁵⁴⁾ - Abin Sad, *Altibqat Alkibra*, Mitbe Brîl Lîdin, Cild 3,1324,R 613.

fermanrewya îslamî şîrove bo zansitên zimanevaniya Erebi ya îslamî dikin.

Ku ev şîrove jî dikarîn dabeş bikin je bo ser çend qonax ku li dest pêka hatina olî ye îslamî û quranê bo ser pêxember (slav ser bi) desit pê dike ta digehete serdemê (Sîbewy û Îbin serac) ku çendîn qonax derbas kiriye.

Di desitipêkêda diçîne ser zimanê qoran û bikar anîn ji alyê pêxemberî (slav ser bi) ku li çenid cihan dikarye bi çenidîn cor amaje bi hebûna zimanên din û bikar anîna wan bike û ciwanî û mezinahîya zimanî Erebi li serdemê îslamîda tiştêkê belge nexastîye ku bi sedema hatna xwarê qurana pîroz bu ser dlê pêxemberî (slav ser bi) li eşkifta (Hera) ew mezinahî bi xwe girt ku pêş îslam zimanê Erebi li çend navçeyan û çenid hozêkda kium krî bûn ku ev jê vidergê bu sedema olî ya pîroza îslam û şexsiyeta pêxember (slav ser bi) bi xwe ku di nav yek hozên Erebi Qurîşda nîşteci bû.

Her ji desit pêka hatna xarê qurana pîroz ayetyek hate xwarê ku bi navê (Aqre) wate bixuyne ku ev jî belge bû ku îslam bi olî xwêndevrî û xuyindnî ve grêdaye, ayetên qurana pîroz ku bi zimanê Erebi û bi taybet bi lehca Qurîş ku wî serdem ta radek baş ji lehcên dinên Erebi pêşkuffî tir bî, zimanî Erebi gehande blindihiyeke mezin û mezinayetîtir û berifrehtir bi xweve girt.

Bi hatna olî îslam nîva dûrga Erebi pitirya şair û gote bêje bi xweve kum kiri û bûye melbendê kum bûna şairan û bi taybetî kum bûna şirî di

hate dar xistin wekî bazara şaîran nav û deng der xist bû ku ev yek jî bandûr li ser navçên din nîva dûrgeha Erebî dirûst kir.⁽⁵⁵⁾

Di encamê çend sedeman zimanê hoza Qurîş dikarî zal bûna xwe bi ser lehcên din de biçespîne ku di van xalên binêda kurt dikîn.

1. hebûna keabe ango mala xudê ku bi merema serdan kirina pitirya xelkê serdana wê kirin û ev yek jî sedemek girîng bû je bu veguhastna vê lehcê û berifreh bûna wê.
2. bazargerî û hebûna bazarê veguhastinê havîne bi taybet di nav bera Hîcaz û Şamêda.
3. Hatne xarê qurana pîroz bi zimanê Erebî û bi taybetî pitirya bikar înanê ji alyê qurîş.
4. hebûna şexsîyeta pêxember slav ser bi) bi xwe di nav hoza qurîş ku ew jî zimanê Erebî û qurîş ya bikar di îna ku cudye ji Erebên din bikar înana pêxember (slav ser bi) bo quran û derxistna temamyê deng û funtan ku tenê pêxember dikarî bi tmamî funtê zimanê Erebya quranê der bibrît û bikar bînit.

Di qurana pîrozda amaje bi bikar înana zimanekê dike bi rengê sanehê bikar bît merem ji belav bûna olî îslamêye bi sanehî wekî dibêje:

suretî meryem ayeta فَأِنَّمَا يَسْرُنَاهُ لِبِلسَانِكَ لِتُبَشِّرَ بِهِ الْمُتَّقِينَ وَتُنذِرَ بِهِ قَوْمًا لُدًّا

(97) .

Pêxember (slav ser bi) hertim pêkula wê fikir ku gelê xwe (alumet) xwêndevan bin û bu vê meremê jî hanê musulmana di da ku berê xwe bidene zansit û fêr bûn wekî di şerê bedrê da ku çend kesek ji kafrên mekehê girtin û hember bi xwêndevar kirina musulmanan hatne azad

⁽⁵⁵⁾ - Ahmid Amîn, Fcîr Alîslam, *Daral Kitab Alarbî*, Beyrût, Çapa 10, 1969, R56.

kirin ku eve jî hîmaye girîngî dana zanistye ji alyê pêxemberê (slav ser bi).⁽⁵⁶⁾

Zêdebarê gelek cudaî ya ku di nav lehcên zimanê hozên Ereban hebû, lê li ser wan kuk bûn ku piştî hatna îslam lehca qurîş wekî serekîtrîn lehce bikar bîne bi belgeya fermûda ew yek hatiye pişit rast kirin ku qurana pêroz li ser heft şêwaz hatiye xarê wekî difermût:

(nzil alqran ela sibe hrif).⁽⁵⁷⁾

Ji alyekê din ve (wastî) amaje bo wê yekê dike ku quran bi awayekê çil bo pence rengan hatiye xarê ku ev jî tenê şexsîyeta pêxember (slav ser bi) dişya wan hemî zarav û lehcên cudaên Erebi bizanî û bixve, bi tekîd hebûna wan hemî zarav û lehcên cudaên Erebi di nav quranêda wekî di cafkanên dîrokêda amaje pê kirîye ew bawer bu me dirûsit diki ku zimanên Hindî û Yonanî û Farsî tevlî zimanê Erebi û quranê bûne û bandûr li ser zimanê Erebi hebûye, her wekî mînak ew tevlîhevîye ku di ayatên quranêda dihîne dîtin û hebûna çendîn peyvên quranî ku li ser rengê Erebi nînin belkî ji zimanên Yonanî yan Farsî yan Siryanî hatîne veguhastin, wekî van mînaka jir zelal dikîn.⁽⁵⁸⁾

وَفِي الْأَرْضِ قِطْعٌ مُتَجَاوِرَاتٌ وَجَنَّاتٌ مِنْ أَعْنَابٍ وَزَرْعٌ وَنَخِيلٌ صِنْوَانٌ وَعَيْرٌ صِنْوَانٍ يُسْقَىٰ بِمَا
ءِ وَاجِدُوا نُفُصْلُ بَعْضَهَا عَلَىٰ بَعْضٍ فِي الْأُكُلِ إِنَّ فِي ذَٰلِكَ لَآيَاتٍ لِّقَوْمٍ يَعْقِلُونَ
(4)

⁽⁵⁶⁾ – Labî Mhimd Abdal milk Bin Hşam Almafrî, Almarufe Bsîre Abin Hşam, Alsîre Alinbewye, *Zibt û Tihqîq Alşix Mhimd Alî Alqitb û Alşix Mhimd Aldalî Bilte*, Ciza Sals, Alimkitbe Alasrye, Beyrût, 1998, R5.

⁽⁵⁷⁾ – Sehîh Albxarî, *Txift Alimhtac*, Labin Hcir Alasqlanî, Rqim Alhidîs 4992, Cild 6, 2008, R 185.

⁽⁵⁸⁾ – Mistfa Sadq Alrafîyn Acaz Alqran û Alblaxe Alinbewye, Daralktab Alarbî, Çap Sals, Beyrût, Lubnan, 1973, R 73.

sinwan/ ku bi ramana dû darên xurmê di yek binê xurmê hat bin.⁽⁵⁹⁾ Yan di fermûdyekêda hatiye ku bi Erebî bi ramana (di şêwe bab xwe).⁽⁶⁰⁾ango bi ramana şêwe dihît.

sûretî zuxruf ayeta (55) فَلَمَّا آسَفُونَا انتَقَمْنَا مِنْهُمْ فَأَغْرَقْنَاهُمْ أَجْمَعِينَ

Asefona / peyvêka farsîye ku di tefsîra (Teberî) bi wataya (huzin) Erebî hatiye.⁽⁶¹⁾

Asefona / di tefsîra (Îbin kisîr) bi ramana (xeizebûna) Erebî hatiye.⁽⁶²⁾

Herwisa hebûna çendîn peyvên dinên cuda di zimanê Erebî de ku di nav qurana pîroz de hebûna wan heye, hatna van core peyvên di nav quranêda û bi awayekê piçir piçir û tek tek ji alyê zanaên tefsîra quranê bi awayekê tek tek hatîne pênase krin.

Hebûna van peyvên di nav quranêda rêk bu Ereban kiriye ku zimanên din jî bikar bînin ku pêş îslam ji blî Erebî tu zimanekê din bi kar ne diînan, wekî bikar înan peyva (almixîle) ku pêxember (slav ser bi) firmûtî: îyak û almixîle. hevalên wî gûtin em Erebîn (mxîle) çîye? Ku ew jî pirsra ebî Timîme Alhicîmî bû, di bersivêda gût: nekin pantula xwe drêj kin. ku wan nedizanî wataya mxîle çîye.⁽⁶³⁾

Herwisa di demê serdana hozên dinên Ereb ji bilî hoza qurîş, tenê kesekê dişîya bi zimana hemî hozên din bi axve ew jî pêxember (slav ser bi) bû, ev pêzanîne jî beşê herî pitir ji alyê Zeydê kurê Sabî û Meaweyê kurê Ebû Sufyanî ve hatne tumar krin û hewisa şixsîyeta pêxember (slav ser bi) dikarî bi damezrîn yan yekim kis bû di hozên Erebî da

⁽⁵⁹⁾ - Tifsîr Abin Ksîr, Sure Alrad Alaye 4.

⁽⁶⁰⁾ - Shîh Almislim, Ktab Alizkae, Bab Fî Tîqdîdim Alizkae û Mnaha, Hedîs Şrîf Rqim 983.

⁽⁶¹⁾ - Tifsîr Alqurtubî, Sure Alzixrif, Alaye 55.

⁽⁶²⁾ - Tifsîr Abin Ksîr, Tifsîr Sure Alzixrif Alaye 55.

⁽⁶³⁾ - Mistfî Sadq Alrafîy. Aacaz Alqran û Ablaxe Alinbewye, R 317.

karîye ji blî zimanî hoza qurîş bi zimanên hozên din jî baxve wekî mînak di deqeqa pêxemberîda (slav ser bi) (Zalmîşarî Alhimdanî û Gifhmey Nihdî û Alaşepi bin qîs) hendek din ji xelkê Yemen û Hezremut gutûbêj kirine û bi fermûde veguhastye ku bi zimanê wan gutûbêj kiriye û cûda bû ji zimanê hoza qurîş ku ev jî deqa wêye ku dibêje: an kê m fraha û whagha û azazha* taklun elafha witsireun fa ha lna min difhim* û êramîhim ma silmu balmîpaq û alamane, wilhim min êdqe alpîlb û alnab walefil û alfarç * û aldacin û alkibiş alhurî, welîhim fîha alêalx * û alqarh*.⁽⁶⁴⁾

Bikar înana van peyvan ji alyê kesê yekumê îslam ve gel hozyên dinên ku Ereba ne bûn û bi kar anîye û belge li ser vê yekî ku yekim kes ku bi temamî ji zimanê ayetên quran û zimanê hozên dinên Ereba têgehiştîye pêxember (slav ser bi) bû. Ku Cahiz amaje bo wê yekê dike ku di demê axiftina pêxemberê (slav ser bi) de peyvên kê m bi kar anî û di demê gutûbêjan de kêmtirîn axaftin hebû, û çendîn raman bi xwe ve girtbîn ku hem bo têgehiştin û fam krin ji alyê hozên cûdaên Ereba û Ereba jî hêsan bûn.

Hatne xara quranê jîblî wê yekê ku bo rêk xisitna jiyanê her wesa ji alyê zimanîve pêxember (slav ser bi) take kes bû bi hêsanî karîye di hemî peyvan têbgehe û şruve bike bo havelên xwe, ku ev yek jî dúbare amaje ye bo wê yekî ku ji alyê zimanîve pêxember (slav ser bi) astekê bilind hebû û ev yek jî di demê şîroveya ayetanda derdikive ku qurana pîroz çendîn peyv tê danin ku Ereba nînin û têgehiştina wan bo wî serdemê

* - Alazakuffi Dara Daristanê
 * - Dif Huştir û Mer .
 * - Alfarz Huştirêkî Pîr.
 * - Alsax Pêgeyîştû Zyatir Bo Mangay 7 Bo 8 Sall Bekar Dît.
 * - Alqarh Hellgirtin, Gwastnewe.

⁽⁶⁴⁾ - Mistfî Sadq Alrafîy, *Acaz Alqran û Alblaxe Alinbewye*, R 320.

Ereban karekê hêsan ne bû lewra ev bi rengê yekima tefsîra quran jî tê dayin ku ji alyê pêxember ve (slav ser bi) tê encam dan her çende bi rengê tamam di ber desit nîne ku pêxember (slav ser bi) tefsîra hemî quranê kirî bû jibilî hendyek ayetan û bi rengê piçir piçir tefsîra temamyê hemî quran nîne. wekî mînak demê di ferîza hecê de pirs jê kirinê pêxemberê xudê em li demê (sefa û merweda) ji kîve desit pê bikin, wî jî di bersivêda gût ku xudê di quranêda diyar kirîye⁽⁶⁵⁾ ku amaje ye bi ayeta

(إِنَّ الصَّافَا وَالْمَرْوَةَ مِنْ شَعَائِرِ اللَّهِ فَمَنْ حَجَّ الْبَيْتَ أَوْ اعْتَمَرَ فَلَا جُنَاحَ عَلَيْهِ أَنْ يَطَّوَّفَ بِهِمَا وَمَنْ تَطَوَّعَ خَيْرًا فَإِنَّ اللَّهَ شَاكِرٌ عَلِيمٌ)

Sureta elbeqere ayeta (158).

Hatne xarê quranê bo ser erdê bi xwe coreke ji qunaxa tefsîr⁽⁶⁶⁾ bi ramana ku qonaxeke li piştî qonaxa yekima hatina ser erdê bo fehim kirina mirovan hatiye ser erdê, ji Eîşe dîya îmandarên vediguhêzîn ku kirdarên pêxember (slav ser bi) bi xwe beşekin ji rewîşita quranê bi wê ramanê ku bi encam dana kar û barên rojanên musulmanên, pêxember (slav ser bi) wê rengî ji encamê pirsê û bersiva û arîşan tefsîra qurana pîroz şî kiriye wekî li vê fermûdê da ku amajê dike dibêje: (kan xilqeho alqran).⁽⁶⁷⁾ Ev belge û şîrove ku ziman û zimanvanî ya quranê û kesê pêxemberî (slav ser bi) bi xwe karî hemî belgene ku pêxember bixwe (slav ser bi) şexsîyetêka ziman zan û zimanevan bûye û karîye bi sedema zanîna ziman xelkên jibilî Ereban ayetên quranî têbgehîne û berev îslam û musulman bûnê ve wan bikşîne, piştî pêxember (slav ser bi) qonaxa

⁽⁶⁵⁾ - Mhimd Mqatlî, *Rsal Almastir Fî Altifsîr Alinbewûye Hqîqe û Msadre, Kilye Alum Alactmayî û Alalum Alaslami*, Alcamae Alhac Alxizr Batne, Cimhurîye Alcazîr, 2008-2009, R 27.

⁽⁶⁶⁾ - Claldîn Alsîwtî, *Alatqan Fî Alalum Alqran*, Cild 1, Alqahre, Mîsir, 1862, R 57.

⁽⁶⁷⁾ - Amam Ahmid Bin Mhimd Bin Hinbil, Almisnid, *Daral Hidîs Alqahre*, Mîsir, Çapa Awl, Rqim Alhidîs 24654, 1421Hicrî.

zimanewanî ya Erebî li serdemê îslamê da corekê pêşkiftinê bixwe ve dîtiye bi wê yekî ku karî babetên rêzimanî û tefsîr û edeb her yek bi rengê taybet berev pêş biçê, piştî vê qonaxê hevalên pêxember (slav ser bi) desit pê dikin ku pyekulê dikîn bi kurtî amaje pê bikîn.

1.9.3 Zimanvanya Ereb di Serdemê Hevalên Pêxember (Slav Ser Bi)

Piştî pêxemberî (slavên xudê ser bin) hevalên wî berêz ew berpirsiyartî girtne estîvê xwe ku tefsîr kirina quranê ji her tiştekê girîngtir bû, lê tefsîr kirina hevalên wî cudaî hebû ji ya pêxember (slav ser bi) encam daye ku cudaî jî birîtî bû ji wê yekî ku zanista pêxember (slav ser bi) derbarê quran pêzanîna wî bixwe bûn, lê çafkanî û pêzanîna hevalên wî bo çend çafkanên vedgerin:

1. sedema hatinê ayetik.
2. tefsîra quran bi quranê ango bikar înanî ayetek bo şîrove kirina ayeteka din.
3. gotenê kivin li serdemê pêş îslam ku bi serdemê ne zanîne (Cahîlî) hate bûye bi nav kirin.
4. fermûde û rewşit û kirdarên pêxember (slav ser bi) ku çafkanyek pir girîng û bayexdar bû.

Di nav hevalên wî da çendîn kes hene ku tefsîr bo quran kirine, lê em dê hendek mînak wergirîn ji wan hevalan ku pitirya tefsîr û bandûr hebûn di wî bwarîda ji wan jî wekî (Abdalle bin bas, Abdalle bin Miseud, Ubey bin Kieb, Alî kura Ebî talîbhwd).

1.9.3.1 Ubey Kura Kiab

Ubey kura Kieb kura Qeys yekîke ji hevalên berêzên pêxember (slav ser bi) û yek ji wan hefit kesane ku li peymanî dîyem (Eqebe) da di

şerên Bedir û Xendeqda beşdar bûye û pêş musulman bûnê ji eşîretên (benî xezric) bûye û zanayekê Yehudî bû.

Yekek ji nvîserê (Wehî) û bi zanatrîn xwêndivanê quranê tê hejmartin û bi sedema wê yekê dû nav û nîşan pê dabûn ku hem (Qare) xwêndevanê quranê û hem jî (Mufsir) şîrove kar bû, çendîn berhem hebûn ji wan jî:

1. xwêndîna quranê.
2. Kum kirina quranê bi fermana Eusmanê kurê Efan.
3. mezinahiya ayet û sûretên quran.
4. peyv nasî yê quran.⁽⁶⁸⁾

Ku di bîr û rayê zimanivanya Ubey da peyv nasîna quranê bo me girîngî heye çunkî hevalên wî Ji ber wî serdemî da bi sedema kêr pê zanîna li ser binemaên dirst bûna peyv û çafkanyan kêmtir ji deqên qurana pîroz fehim dikirin û bi awayekê cuda ji ramana deqan tê di gehîştin. Lê ewî ku peywendî bi pê zanî ya Ubey kurê kieb ve hebû ew çarçûve bû ku derbarê xwêndina quran û deqan veguhistî ye ku ev çarçûve jî nîşan dana yekim pêngavên (Tibyan ,Sitructurali) sitrakçer di zimanê Erebî da, ku bo kum kirin û danana (Serf û Nihu)(Sîntakis û Morfolujî) şlove kirina rîzimana Erebî ve mjûl bû.⁽⁶⁹⁾

1.9.3.2 Ebidûlay Kurê Ebas

Ebdûlay kurê Ebas kurê Ebdilmutelîbê kurê mamê pêxember (slav ser bi), temenê wî 71 sal bû pleya pê zanîn tefsîra quranê bi rêjeka gelek bilind ku pêxembir (slav ser bi) pê bexşî bû, helbet ku wî temenê biçûk

⁽⁶⁸⁾ - Mirkiz Aldrasat Alqran, Wwiw. Alquran.Com

⁽⁶⁹⁾ - Mhamad Amînî, Ruzname Rsalt ,Ziban Şnasî Msilman Dir Tayx Zbanişnasî Aslamî, Şmare 6571,R 18,S 21/8/1387.

ku di serdemê wîde hebû bi merkiba umet (hibir alume) nav û dengên wî belav bibû.

Cudaya îbin Ebas digel zanyaên serdemê xwe derbarê tefsîr û zimanvanê ew bû ku xwe mjûlê kumkirina quranî û xwêndvanî nekir bû, bi wê ramanê ku demê hevalên din wekî Ubey kurê Kiab û Ebdûlaê kurê Mesud di ryeka zanista (qiraete) ve xandin bi awayekê formalîstye quran û deqeên tefsîr û şîrove jî her bi awayê form bûn, lê îbinu Ebas bi ramananasî ji rûye derevê deqan xwe mjûl kir bû, lewra karî sê desit kiftên girîng bi taybet di biwarê ramannasî û peyvan bi desit bîne.

- Yekem/ desit kifta yekim ewe ku bi sûd wergirin ji şîrên serdemê (cahîlî) nezanîn û deqeên kevnên Erebi karî di ramannasîna peyvan de şarezaya zêdetir peyda bike û ji ramana dirûsit pitir nêz bibû, ku ev yek jî ji alyekî din ve amaje ye bo wê yekî ku ew pêngave bu wê hilgirtî ye ku mîtodek di anît ku bu pîvane kirina wan belga ku neveyk li serdemê pêxemberî (slav ser bi) jiyar û şahdin li ser heqîqeta tiştan û bikare di rîyeka wê mîtodê neveê dûwyem ku bê beşin wê binyanî wan rastiyar vegeêrîne. îbin Ebas bi bişidarî ya di kor û civînên pêxember (slav ser bi) li ser wan xalan rawisya ku nevyên piştê divê demekê pitir ji ber desitê wan be bo fehim kirinê ji deqeên quranê.
- Dûyem/ desit kifta dûyem ku îbin Ebas bi desit xisitî corek ji dahînanê encam da di bîr û rêye peyvnasîna, bi awayekê ku di dîyalêkt nasîna (Dialectolgiy) nîva dûrga Erebi da bi dîv ramana wan peyvan digerya ku dîv ji mirînin û yan jî mirîne bi taybetî ew peyvên ku di quran da hebûn û raman wan ne diyar bû ku di encamê geran bi dîv ramana rasiteqînên da di dîyalêktên dinên Erebi wata bu wan hate dîtin ku pêş îbin Ebas tû kesên di ev kar encam ne dabûn.

- Sêyem/ desit kifta dawî birîtî bû di encam dana xwêndina dîroka piraktîkî li ser peyvên quranê bi corîk ku pêzanînên îbin Ebas bi awayekê hat bûye zêde bûn ku şîyana nasîna binemaên (rîşe) wan peyvan jî hebû ku Samîn di nava quranêda hebûna wan heye û Erebi jî nîne.⁽⁷⁰⁾

Vî rengye îbin Ebas wekî damezrênerê qutabxana tefsîr ye ku bi awayekê zanisitî dikarî binemaên kiliturî Erebi bi awayekê zanistî berev pêş bibe û bi taybet di biwarê zimannasîna îslamîda rîyek bo Xlîl bin Ahmid Frahîdî xwê bike ku îdî pişit grêdan bi zanisitê zimanvanî ye îbin Ebas binyata lêkulînên xwe dabimezrînit û rû nekîte ziman nasî ya Hîndî û Yonanî bo damezrindin û binyat dana vekolînên ango îbin Ebas binemaên vekolînên Xlîlî darşit.

Çendîn pyekulerên din hene ku Di vê biwarîda kar kirine em vêrê da tenê balkşîne ser hinedik ku rol û girîngî ya xwe hene li ser berev pêş birna zansitê zimanvanî ya Erebi îslamî û Heya niha ew rol û girîngî tê behis û şîrove kirin ew pyekul û şîrove kirin jî birîtîne ji: (Ebdulay kurê Mesud , Alî kurê Ebîtalbhwd).

1.9.4 Sîbewey û Desit Pêka Rêzimana Erebi

Li sala (148 kuçî bo 180 kuçî) beramber (765 – 796 zaynî) jiyaye navê tmamî Amru kurê Usmanê kurê Qenbre. Li welatê fars li bajarê şîraz ji dayk bûye zanayekê musulman bû û ji girîngitrîn berhemên wî jî pertûka (elktab). xwêndkarê Xelîlî kurê Ehmedî Ferahîdî bû. Ku berhemê wî di biwarê rêzimanî ve bi nav û denigitrîn berhem tê hejmartin. Ê bi (rêzimana quran) nav û denig blav bibûn. Ku wê paye û

⁽⁷⁰⁾ - Mhamad Amînî, *Ruznamey Rsalt*, Şmarî 6571 ,R 19, S 21 / 8 / 1387.

binemên rêzimana Erebî û digel rêzimana Panînî san sikrît, dkarî beramber bikî.

Yekim kes bû ku bi zimanî Erebî rêziman nvisî û denig di vî zimanîda diyar krî ji ber wê yek (ser, jêr, bor) bi dahîna Sîbewy tê hejmartin, Berhemê (elktab) piştê mirna wî bi nav û denig bû, û hate rexnekrin jî. Xwêndkarekê berhema wî zelal dikir ku navî wî (Exfiş) bû ku kesên din li alê exfiş waneya (elktab) dixanid û dibêje tû tiştêkî veşartî di nav elktabda nîne ku ne gûtbite min.⁽⁷¹⁾

1.10 Nêrînên Sîbewy di Elktab de

Sereray wan rexnan ku rojava û zanaên zimannasî ya Erebî ku li gor wan, elktab ji ruy ryekxistin û timamya karîve di qunaxa desit pêkîda bû, lê sîbewy di vîya vekolînê li ser rengê hinedik mîtodîn cuda ku bi taybetî şewaza wan nîşan dide, di aşkratrîn şewazan da xastîye li ser awayê mînaka gutinan şîrove ya wan encam bide bi wê ramanî ku vekolînên rêzimanî ya xwe li ser gutenên zimanê Erebî nîşan bide.

Di elktab da zimanê quran û şîrên pêş îslam û deqên Erebî bi kar înan je bo şîrove krinê.⁽⁷²⁾ Elktab ji (574) beşan pêk hatîye hefit beşên yekim bi (namên) nas kirîne behsa hendek boçûnên destpêkî di biwarê axiftenê dike. Sîbewey peyv bi ser sê coranda dabeş kiriye ku (nav , kar) şyana şî kirin nîne (amrazê zêde û amrazê peywendî). Nav jî li gor wan taybetmendên rêzimanî ku hene bi awayekê dabeş kir bo nasrav û ne nasrav, tak û ko , nêr û mê. Wê yek jî zelal dike ku dûye rêzimanêda navekê naskirî ko ku ev nîşan hebe di naveka ne nas kirî tak nêr behêztre.

⁽⁷¹⁾ - Abwaltîb Abdalwahd Bin Alî Alinhuy Alhibî Hqîqe û Alq Alye Mhimd Abwalfizl Abrahîm Hratb Alinhuyin Miktîm Alinhim Alqaade , Mislyae Alifcale,1955,R 65.

⁽⁷²⁾ - Jîla Xancanî, *Micle Ziban Şnaxt*,Sal Awl, Şmare Duyem,1389,R42.

Ji blî vê rubînz dibêje: sîbewey bu dengên Erebi weskfa nû bo denigsazî ya Erebi dahîna. Ku bi qunaxeka pêşkiftîtir ji denig nasîna rojava di serdemê nû û serdemê pêştir tê hejmartin.⁽⁷³⁾ ptirya nvîsîna di hefit beşên dawîê da ango di beşên (565 bo 571) derdikive ku ji Rûya hevbeşî hemî derbarê babet hev ramanin ku piştî wesif kirina denigan ku li beşên (565) da encam dane derbarê şîrove kirina xonumonî (pdîde) cudaê ji dû rûy zincîre wjê û zincîre kar dikin.⁽⁷⁴⁾(Segmental)(super segmental) sîbewey dawî yê peyvên Erebi dabeşî heşt beşan kiriye nesb(accusative) cir (genitive) rife (nominetire) czim (apocopate) fith (a – vowel) kisir (i – vowel) zime (u – vowel) wqif (jere – vowel) ku her yek ji van bi awayêkî dabeş dibin bi ser çar destanda(nesib û fitih, cir û ksir, rife û zeme, cir û wqif). Vêrê nû gerek desit dikive ku di rastîda ev amraz (herekat) bi ser dû desitanda dabeş dibin û di dû haletan da şîrove dikin.

1. haletek ku rolekê rêzimanî encam dide.
2. haleta dûyem ewe ku rolê rêzimanî nîne.

Wî demê ku biker di nav ristêda hebe amrrazên (nesb,cir, rife û cizim) pêş bînî hebûnyan heye ku bi beşyek di rolê peyvan tê danan.

Wî dem ku biker di nav ristêda nîne amrrazên (fitih û zeme, wqif û kisre) hebûna wan heye ku cêgîrin û bi beşyek ji peyvan tê hejmartin ku di zimannasîna îro da dikarit bikar bînîn û hêjayî hevberî kirinye di vê xişteyey jêrê de zelal dikin ku hebûna biker çî rolekê dibîni.⁽⁷⁵⁾

⁽⁷³⁾ - Rza Studenya,Rasxun,*Dîdtahay Rwaşnasî Sîbewey* 1393 Wwiw.Rasekhoon.Net

⁽⁷⁴⁾ - Aşart, Lutis,Wer Nsîr Şfî Pur, *Yaftehay Sîbewey Dir Bab Frayind Nimtuû Ya Hcanîrî*, Micle Zîban Şnasî , Sal 23, Şmare 2,Tihran , Mirkiz Nşîr Danişgahî .R100, S1388

⁽⁷⁵⁾ – Ç.B, R101.

Denig	be biker بوونی بکتر	be bê biker بة بکتر
/ a /	nesb نصب	fitih فتحة
/ i /	cer جر	kesir كسرة
/ u /	refe رفع	zeme ضمة
/ zere /	cizim جزم	wiqif وقف

Sîbewey di wê bawerêda ku risite ji dû beşan ku ji kar û navekî pêk tê ku gelek bi zelalî amaje bi (nîhad û guzare) dike û ji binem ya here serekîên risitene û bi hevra grêdane bi şêwek ku pêdavî bi hebûna wan dû beşên di risiteda bûye bi pêtvî ne axtîyarî (lazim) ne (kafi).⁽⁷⁶⁾

Derbarê ristê têgihiştinek zelal û sadey hebûye ku li gor wî axaftin dû rûy heye di rûya yekim da risite bi awayê (risitekî nav)ye ku di nîhad û pyekulek pêk tê û ji rûya dûyem da (risteka kar)ye ku ji biker û karyekî pêk tê (vir tiştek heye) Sîbewey sê dem bo kar dest nîşan ne kir ye belkî tenê amaje bi dima rabûrê û ranebûrê dike her çend zanaên serdemî wî pitirya wan bi vê dabeş kirina demî bi ser rabûrê û ranebûrê de razî bûn û heman nêrînên sîbewey hebûye.

Sîbewey nêrîna wî ewe ku gotin core çalakîyeka civakî ye ku di wê rêyeda di nav bera axêveran da peywendî dirûsit dibe li ser van binema ye zimanî wekî coryek ji kirdara mirov tê hejmartin ku wekî pêdavîyekî pêk hatiye û rêsaên xwe ên taybet hene.

Her wisa derbarê pênaseya gotenê ve nêrîna wê ewe ku dikarît di desit pêk û dawî ya her gotnekê da bê denig bibî ku wekî pênaseya Zelli

⁽⁷⁶⁾ -D. Sahir Himd Slim Alqrale Almisnid û Almisnid Alîhuma Asilhma Kzilk Axujba, Cimle Alzirqa Libhus û Aldrasat Alansanye, *Alimcild Alsals û Eşrun, Aladed Alsanî*, Alardin, 2013, R 223.

Harlis zimannasîn serdemê nû Emrîkî ku bi vî core gotn pênasê kiriye.⁽⁷⁷⁾ têbînî û nvîsînên Sîbewey derbarê binemaên pêk hatna risite ramana (nîhad û guzare) wî core rêk bû ku pişit re di sedê bîstê de bûye yek ji binemaên pêk hatna zimannasîna giştî.⁽⁷⁸⁾

Sîbewey yekim car binema û şêwazên rêzimanî binyat dana bi rengê timamî payeyê di ser da, bi derkfitna (elktab) binemaê qutabxana (Besre) binyad na û di beramber jî binemaê qutabxana (Kufe) ser helda ku kesî zana di wê qutabxanê da bîr û nêrînên xew digot û cudayî di boçûna wan da hebû û heya çendîn sede berdewamya wê hebû. Le wire bi pêtvî dizanim bi kurtî amaje bi dû qutabxana bikim ku rolekê îcgar mezin je bu berefrih û pêş birna zimana Erebi û zimanvanya Erebi da hebû ye.

1.11 Qutabxane yê Besre û Kufe

Vekolîn û cêh kiftên bi dûv rêziman û zimannasî ya Erebi desit pêkî li dû bajarên (kufe û besre)ya Êraqê ser heldan, bajarê besre yekim melbendê zanistî û bajarê kufe jî melbendekê din bû ku ew zansitê li besre hinartî şîrove diki. Ev dû bajêr ji melbendên here girîngên perewerdayî û fêr kirina qonaxên yekimên îslam têne hejmartin, şivênkiftên qutabxane ya besre pitir bi nivîsîna Eresto bandur bû. Ev bandure jî bû ye sedema wê yekî beşêk ji zansit û felsefe ya Yonanî dinav zansit û felesefe ya dinyaya îslam da renig bide.

Peyrewî ya vê qutabxanê bawerya wan bi qîyas (pêvan)e û eqil gerayî hebû û boçûna wê jî bi awayekê ryek xistin ku li ser şêweyekî petî û xawên û bê xewiş û srûşitî ya zimanî teakîd bûn, çunkî wisa dibînî ku

⁽⁷⁷⁾ -Pyam Sle, Sîbewey Ziban Şnasî Nuwîn, Payan Name Arşid Danişga Azad Aslamî Wahd Tihran Mirkiz Girwe û Ziban Şnasî Himganî,1376,R81.

⁽⁷⁸⁾ -Mihdî Mişkwe Aldînî, *Ziban Şnasî Tarîx*, Antişarat Danişgae Firdûsî,Mişiid,1373,R10.

ziman amrazêke di rêveve degehîne gotûbêjekî lojîkî derbarê bi desit hatîên cîhan.

Di beramber da peyrewên qutabxana kufe kumek bîr û nêrînên rêkefîtî û kit û pirî bûn, wê bawerî da bûn ku karanek hene bo çewanî û çendayetî ziman wek hebûna çewanî çend dyalêktêk di nav yek ziman da û ew cudaye jî ku di deqêk da hebûn û ji alyê peyrewan jî bi boçûneka dirûst û tamam di hate hejmartin.⁽⁷⁹⁾

Di qutabxana kufe da şîrove kir, kar bi binema û çawg jî bi berhem hatî di qelem da, lê qutabxana besre je bo her çawgyek karêk bûnî heye. Her wekî wê yekî ku hendyek çawg hene ku kar je wan da nîne wekî (abudîyet,nibuwit) û hendyek çawg hene ku ne hatîne wergirtin wekî (kerame, eta) .⁽⁸⁰⁾

Di her dû qutabxanên kufe û besre de yasa gelêk û ryek xistneka nezerî û piraktîkî gelek tamam û zerîf hatne pêşkêş kirin, ku her yek ji wan di serdemî xwe da zanistî û tendirûstî û lujîkî diyar kirina xwe hebû, tû core sinûrêkî diyarî krî nebû, Bi dirêjahî ya dîrokê van dû qutabxane bandûr li ser hev hebûn di nêrînên hev dû jî pal pişt û piştîvana hev dû bûne, her çend bi derbas bûna demî di nav her yek ji qutabxana gelek zana peyda bûn û digel hev dû cudaî di nav bera wan da hebû wekî di qutabxana besre (sîbewey) bi yekim nevê rêzimanê hate hejmartin û (mubered) nevêk piştî sîbewey derkefit ku di hndek bûcûnanan da djayetî ya bûcûnên sîbewey dikir.⁽⁸¹⁾

⁽⁷⁹⁾ -R.H.Runbîz, Wer. Alî Mhimd Hiq Şnas, *Tarîx Mixtsir Ziban Şnasî*, Nşir Mirkiz, Tihran, 1385 R 213.

⁽⁸⁰⁾ -Mhimd Alîye Miqdim, *Qrin Dûm Hicrî û Srif û Nhu Arbî û Nqîş Sîbewey Dir Tdûyn Qwaad Ziban Arbî*, Kingre Bzirgdaşt Dwazdihmîn Qrin Dirgzişt Sîbewey, Wîraste Mhimd Hsîn Askind, Danişgae Şîraz, 1353.

⁽⁸¹⁾ -Nîcdî Nasf, Mhimd Fazîlî, Sîbewey û Pişway Nhu, Antişarat Danişgae Mişhid, 1359, R303.

Piştî her dû qutabxanên kufe û besre qutabxana (Bixdad) peyda bû bi taybet di serdemê (Ebasyan) de piştî wê yekî ku zanaên kufe û besre kuçberî bexda bûn û şîyan sûdî ji wî zanistî werbigirin û bexdad bibête melbendê here girîngê zanistî bi taybetî piştî wê yekê ku çendîn zanaên qutabxana bi nav û denig di hemî biwarên da nav û denigên wan belav bûn. Wek (Qazî, Abî îwsif, Amam Abu Henîfe, Abu Aletasye, Albihrî û Almişbîhwd. çendîn qutabxane derkeftin wek (Almistinêrye, Alimdirse Ainzamyê, Alimdirse Altirbye ...).⁽⁸²⁾

Ku ev hemî bûne sedema wê yekî ku Ereb di hemî biwaran da pêşkeftinek îcgar mezin bi xwe ve bûne û belkî bibête ser meşiq di biwarên zanistî û zimanî û zimannasîne jî da mezintrîn pêşkeftin bi xwe ve bibûne ku bi renekê ekadîmî berfreh pêş diçûn.

1.12 Zimannasî di Sedeyên Navend (Naverast)

berê hemî tiştekê divê ew yek bête zanîn ku pitirya şîrove û vekolîn ku derbarê ziman hatîye encam dan, heya sedeên navend sinurdar û taybet bûn, bi wê raman ku her gelekê vekolîn derbarê zimanê xwe ye taybet dida û tû core girîngyek bi zamanên dereve ne hatîye danan, lê piştî dawî hatna sedeên kevin û di sedeên navendê da ew core bîr kirin goran û vekolîn derbarê ziman berifrehtir bû ku vekolîn derbarê zimannasî bi giştî û çendîn zimanên din encam didan, çendîn hokar hebûn bo wê yekî ku pitir ya şîroveyan encam bden ku ji hemîyan girîngtir hokarê alîya olî bû ku bi merema belav kirina ol û pertûkên olî vegohastin bo zimanên netewey û hoz û gelên cuda, Bi vê yekî jî pitir vekolîn di zimanê wan gel û hozan encam dan.

⁽⁸²⁾ -Cirmî Zîdan, Wer. Alî Cwahir Klam, *Tarîx Timdîn Aslam*, Antişarat Amîr Kebîr, 1386, R480.

Yekê din ji hokarên girîng dîyar keftina çap û çapxane bûn di sedeên çardeyem û paizdeyem da ku bi sanehîtrîn şêwe pitirya nvîsîna belav dikirin, ev yek jî alîkarîyek baş bû di nasîn û şîrove kirina zimanan da, Zimannasî di sedeên navend da û bi taybetî her neteweyek pyekul wê yekî dide ku zimanê xwe binase û şîrove bike cunkî li gor wan jî zimanê xwe li zimanê Yonanî û Latînî kêmtir nîne, Lewra pyekul krin ku ew zimanê ku bo demê çendîn sede bibû ye zimanê hemî ewropa îdî wê girîngî û bayex pê nedin û zêdetir pyekulê bo zimanî neve ya nû bidin.

Ew jî piştê belav bûna (şakarên Dantî) ku ji zaravên îtalî vekolîn û herwisa berhemên Şkispîr ku pitr bandûr li ser netewe dirûsit dikir, herweha li Îspanya Sankişos di nvîsîna ktêba bi nav û denig (mînirwa) û herwisa di romana ku Prîşyan mezintrîn gohurîn kîrin di biwarê zimana latînî da encam da her çende ku zimannasî wekî bi zansit bûna vedigere je bo sedeên rînsanis di sedeên hevde û hejdê da, lê nabe wê yekê ji bîr kîn ku çendîn pyekul û xebatên di wî biwarê da hatne encam dan, ku çendîn gotar û pertûk û nvîsînên zanaên zimanvanî ku di biwarên ziman û rêziman çendîn vekolîn encam dan pitrî zanyarî derbarê ziman xisitne ber desit û rû bi şî kirina boçûnên zanaên pêş xwe wekî zanaên Yonanî û Romanî û Hîndî û Îslamî çî bî der birîna bîr û nêrînîn nû derbarê ziman, Li vêrê de amaje bi hendek wan zanaên dikîn ku di biwarê ziman û zimannasî da di sedeên navend da nvîsîn û şîroveên ewropa da bi taybet bûne cafkanên zanistî, ev zana yê jî bi rengekê cuda ji neteweên cudan bi vê rengê jêrê bi kurtî di berhem û neteweên wan şareza dibîn.

1.12.1 Apolonîs Dîskulus (Yonanî) (110 - 175)

Ew me derbarê zimannasîne di dinyaya Yonan da di sedeên desiti pêkê mîladî da vedigere bo berhemên Apolonîs ku di demê (110 - 175) zaynî û zanaê zimannasîe Yonanî bûye ku bi xwe li bajarê Eskenderye

ya Mîsir dijya û her di wêrê jî şîrove û vekrilîn encam dida. Bi sedema gelek berhemên wî ku (59) berhem hebûn bi nivîserekê gelek jêhatî hate nas kirin digel wê yekî ku tenê (4) pertûk bi timamî piştî xwe mayne ku di biwarên (cênaw, awellkar, amrazî peywendî, rêziman)e. Di nava wan berheman da pertûka çarem derbarê zimannasîne hejî girîngî pêdane, çunkî ev berhem yekim berhema nas kiriye û behsa dirûsit bûna riste dike wekî ku gelekî di bin bandûra boçûnên rêzimanî ya Erestoda bî.⁽⁸³⁾

Apolonîs ev ku îro navkirî ye bi (kowarên Menip) hakimyet (agree mentriy)(mtabqit). Tê nas kirin û şîrove dike û vê rêye de buçûnîk derbarê coreên navî tê derxistin, vê di şîrovê rêzimanî ya xwe da di dirûsit bûna ristê da di nav bera (kar) û navên ku di babetê (Argumenip) ew kar û waqe bûn hen cudayî di nav bera wan da dike, bi berovajî Eresto û qutabxana wan rexneên wan ku di nav bera (nîhad û guzare) da ew cuda ye dirûsit dikir.

Eciben ku bo çî? Bi şêwekî gişitî nîhad berdewam wekî (biker) der dikeve, Eger ku digel çawg kar tevlî bibe ku wî haletîda bi awayekê berker derdikeve herweha cudaî di nav bera karê têper û tê neperda dike û wan dite nas kirin û şîrovekî hurid di wî barîda encam dide.

Dawî gûtnîk li ser Apolonîs hejmarek ji hizrên şîrovekarî bûnyadî ku bo yekim car di babetên zimannasî pêşkiş kir ku pitirya wan bo demê çendîn sede berdewamî hebû, heya ku rêyk bixîn û temam bikin û bi şêwekî rasteqîne û bûnyadî di şîrovey rêzimanîda.

⁽⁸³⁾ –Husenoldereredw, *The Syn Tax of Apdlonius Dyscolus*. Translated And With Commentary By – Cstudies In The History Of Linguis Tics , 23 , Benj Amins Amsterdare1981.

1.12.2Prîşyan

Prîşyan di desitipêka şeşema zaynî de şexsîyetêka cuda di dîrokîda bi kesekê mezin û bilind navê wî hatiye, berhema wî bi navê (binyadê rêziman) bi latînî (institutiones Grammatica). Ku ji hejde bergan pêk hatiye ku şazde berg behsa kumek babetên yek piştî yek da ku pêkhat bûn ji denig û peyvan ku berdewam bi (payên peyv) hatne xandin. Ev binema ye jî dihate grêdan bi peyamên Erestove .⁽⁸⁴⁾ Dû bergên dawîê taybet bûn bi rêziman, şîrove kirin û vekolîn berv pêş dibir, ku bi merema likandin û peywendî dan pêk hatna riste digel lojîk û mîtafîzîka Eresto hate dariştin.

Pêkhatna ristê di encamê vekolîn di peyamên Eresto de ku bi çendîn corên peyva şîrove kirin, vekolîn dike derbarê rêk xistina peyvan ji rûy sadey (abstract) ku bo risteên latînî pêşnyar kirîbûn, bi vê şêwe dibêje ku nav pêş kar dêt çunkî cewher(bûn)(substance) ku bi nav raman dike û aşkra dibe pêş (ariz)(accident) rûdaw dêt ku bi kar dihîte aşkra krin.⁽⁸⁵⁾

Vêrê pêdiviye bal bikşîne ser wê yekî ku Eresto xudî yê çendîn peyame (name ye) ku ji Qatîxuryas (Categories) û paştre ji mîtafîzî da (Metaphysicis) nvîsîne. Ku pêkhat bûn ji rêk xistinê ku ji (10) peyaman pêk hatbûn ku brîtî bûn ji:

1- (made)	cuhir	(subistance)
2- (çendyetî)	kmît	(quantitiy)
3- (çonyetî)	kîfît	(qualitiy)
4- (rêje)	nisbit	(yelation)
5- (şwên)	mkan	(spece)
6- (kat)	ziman	(Time)

⁽⁸⁴⁾ -Mhimd Alî Hiq Şnas, *Tarîx Ziban Şnasî*,R79.

⁽⁸⁵⁾ -A.Luhtala.Grammar, *Earliy Medieval*. Mi, Asher Simpispin, or 1461,S1994.

7- (şwên)	wiç	(Position)
8- (dox)	halt	(state)
9- (firman)	fili	(acion)
10- (hez û arezû	anifal	(affection) ⁽⁸⁶⁾

Di van (10) peyamên Eresto da bi desit pyektirîn û sanehîtrîn û sadetrîn berhemên wî tê hejmartin ku pesendin bo vegohastinê li vir yan her cîhaneka din, bi ramanêka din Her yek di vê peyamêda di babetê taybetya xwe da bi taybetî piştî wê yekî ku Eresto di mîtafîzîka xwe da çendîn şîroveên cuda je bo dinyaya bûnê kiriye ev peyam jî ji rûy girîngî taybetî bo nêrînîn Erestow bihaêkî bê dawî heye. Lê merem ji nav înana van peyam berhem înana wan corek ji hevriîzî (isomorohism)(havryekxistin)e. Ku di nav bera peyame yekemînên (guftarên) û ji alyekê hebûna hestî jî ji alyekî dinve.

Eva ku Prîşyan pyekul bu kiriye heya bi desit bêxe corê ji vekolînê bû ku ew bernameay Eresto ji nvîsîna mîtafîzîkî ku bo rêzimana bi taybetî û raman nasî.

❖ Pertûka Binyadî ya Rêzimana Prîşyan

Ev pertûk bi şeweyekî timam ji hemî wan berhemên din ku li dawîên serdema Romî kevin nivîsîne timamtir gehiştî ye desit me. Li gor boçûna hnek ji şîrove karan wekî (pînburg 1967 û bîrsîlha 1972). Pertûka Prîşyan zêdetir ji hemî tiştêkê kumek babet bi xwe ve girî bû ku li dûnya ya Yonanî ya ziman da ew babete daxsit bûn, kêmtir ji hemên din bo wesif kirin û gehişitna encamekê dawî sîd ji bi desit hatîye kevin werbigrêt. Eger ev nêrîne dirûsit be yan ne dirûsit be dan bi wê yekî bikin ku pêş hemîyan berhemî Prîşyan bû ku bu sedema wê yekî bibête

⁽⁸⁶⁾ -Mhimd Alî Hiq Şnas, *Tarîx Ziban Şnasî*, R80.

ser meşq je bo rexne girtn ji nêrînên Yonanî ya kevin li sedeên navenid, binaxê boçûnên sedeên navenid darşit ku piştire di zemîne ya rêziman û zimannasî ye cîhanî da bikar înane.

Hindek caran di desit pêkêda ev berhem pişguh avîtin bi wê sedemê ku berhemekê gelek ne rehet û gelek gran bû bu wan rojan ku derbarê zimana latînî û fêr kirina lawav dikira ango di astê têgihîştina wî serdemîda.⁽⁸⁷⁾ Kêm kes hebû bi hêsanî bikari ji merem û şîrove ya têbgehin, lê piştire li sedeye noyema zayînî car din ev pertûk derkefit ku gelek şîrovekarî derdiwara xwe kum kirin û bûye cafkanê bîr û boçûnên rêzimanî û ziman û heya dawî ya sedeên navend berdewam bû di vê qunaxêda Prîşyan ew pêge û bilindî ya peyda kir di biwarê rêziman û boçûnên zimannasî da ku Eresto di dinyaya feelsefe û lojîkî da bi dest anî bû.

1.12.3 Eska Lîcer (1484 - 1558)

Nivîskarê îtalî bi navê julîws sîzar eska lîcer ku di demên salên (1484–1558) zayinî da jîyaye. Girîngitirîn berhem pirtûka wîye derbarê yasaên (zagonên) zimanê latînî (Decausis Linguae Latina) ku li sala (1540) belav kiriye, ev berhem jî bu nivêye xwe nivîsiye wekî rêzimanek bo fêr kirinê bi kar nehatiye belkî bi nav û nîşana paş girêk bo tamam kirina wê rêzimanê ku hebû, eska lîcer wefa darî ya xwe bo boçûnên Eresto derbirî ku di dawî ya berhema xwe da derbarê Eresto dinivîse.(her eve bese ku binemaên zansitî bo boçûnên rêberê pêş xwe vegehet anku (Eresto) ku bo me sazind ku hebûna runakî û jîrî ew nezanîna rêzimanî bi tamamî ji nav bir).

⁽⁸⁷⁾ -C.H.Kheepkuns. *The Priscianic Tradition* S.Ebbesen Cedl, Sprachtheorien in Spatanatikic Und Wittelalter. Narr Tubigen. Pp 239, S 1995.

Li gor nivîsînên eska lîcer rêziman ji bingeh da derbarê peyve û peyvan jî beravajî peyamên Erestone ku nivîser di pirtûka xwe da gelek bi zelalî şîrove dike, pêkhatî ya babetên xwe bi vî rengî rîz dike (denig, morf, birrge, peyv). Ku babetê bingehî ya şîroveya wane. Nav, kar, ranav, amrazî peywendî, awellkar, amrazî ziyade, di rûpelên dawî ya berhemê wî da li gor boçûna wî eve babetên ne serekîne lewre li gor wî eve peywendî bi gutnêve heye nek ziman, bi dirûsîfî û hurdî wekî boçûnên frîrand dî sosêr derbarê rêziman piştî çar sedê paşitir hebû.

Eska lîcer navê çendîn zanya anye ku ji bilî Eresto van jî (Calînus, Îbin Rişd), rêziman nivîsîn kevin, serdemê kevin û qonaxa xwe anku (Prîşyan, Warun, Nîcdris, Kuînişlyan û Nivîskarê serdemê xwe Lînakir).

Lê tu cure navekê serdemê navend ne înye, wekî wê yekî ku bandura wan li ser nivîser dîyar û zelal be. wekî di nivîsîna (Tomas û Erfurtî) da gelek bi zelalî ew bandure derdikeve ku eska lîcer bi zelalî bi cihê pêya wê rêziman nivîsinêda çûye ku darişitina hebûna peyvan bi dû şêwe (rastî û ne rastî) peyvan ku li gor wî bû her peyvekê dû şêwe hene, şêwek waqê û rastî wekî wê yekî ku hebûna lezatiyê û awayekê ne waqê û ne rast wekî bi kar înana peyvan di cêh û demên cuda da.

Ev ku giring be ew şêwe taybetiye di bi kar înana zaraveên da ku eska lîcer di vekolînên da bi kar înye hemî gelek bi raste û rast amaje bo hebûn û bandura Tomas Erqurtî dikin, lê eska lîcer bi tû awayekî navê tomas ne ayîne.

1.12.4 Sankîfîus û Mînrwa (1523 - 1600)

Vêrê pêtivîye ku berev pêşeve biçîn û di boçûnên zimanasî û rêziman nivîsîna serdemê xwe ku hem di wesif kirina ziman û hem jî derbarê egerên rêziman ve gelek pêş ketîtir û puxtir şîrove kirî bûn.

Rêziman nivîs Franîsîskos Sankitîus ê îspanî ku bi îspanî navê wî wekî “Sançiz” hatibû binav kirin, berhema wî ya kum kirî derbarê boçûnên zimannasî ya bi navê (Mnîrwa ya, binema û hokararên zimana latînî)(Minerva seu decausis Liaguae Lathina) bû. Bû ku li sala (1587) belav kiriye, navbirî pispore zimanevanî ya Ywnanî û Latînî bûye li zanîngeha (Salamanka) babetên zimanên Ywnanî û Latînî şîrove dikir. tişteke normale ku wê serdem û bi taybetî li îspanîya yê ku Sankitîus jîyan dikir, di jêr bandora zansitên îslamî da bû bît, ew bi suneta Eresto mijûl bû lê bandora îslamî li ser Eskalîcer û Ramuse Lînakird... Hwd zêdetir bi ser Sankitîus diyar bû.⁽⁸⁸⁾

❖ Pirtûka Mînrwa

Ev pirtûk gelek ji wê zêdetire ku wek berhemêkê din komek babetên sade û bandora nivîs karên din li ser Sankitîus bû bît û belav kirî be, di gel wê ku komek yasa di dema serdema xwe da dûbare kiri ye, komek nû gerî ser surhêner têdane ku hem ji aliyê wesifî û hem jî ji aliyê nezerî ve têdane, Ji aliyê wesifî nîşandan gelek dewlemendtir ji her berhemekî din û ji aliyê nezerî ve desit pêkik nû diyar diku ku têda peyamên Eresto çî dî ne tenê wekî egera diyar kirina babetên lawekî rêziman û şîrove kirinê jî , belkî wekî babetekî kûr û hurd di şîrova rêzimanê da bi kar di hatin, di beşa dûyema pirtûkê da li gor wî ku riste bi ramana rêzimanî dêt, ku merem jî rêzimana zimanî ye.⁽⁸⁹⁾

- Pirtûka yekem: cur û ramana peyv û pêk hate ye wan şieove dike.
- Pirtûka dûyem: derbarê komeka nav û pêkhat û rola wan, di nav riste da vedîkolêt.

⁽⁸⁸⁾ - R.H.Rubînz, Wer. Alî Mhimd Hiq Şnas, *Tarîx Mixtsir Ziban Şnasî*, Nşir Mad, Tihran, 1370, R61.

⁽⁸⁹⁾ - Brevia – Claramonte . Manuel, *Sanctius Theory Of Languaqe A Contrion To The History Of Renaissanai Linguistics Benigmins*, Amsterdam, 1983, R235.

- Pirtûka sêyem: derbarê kar û rola wan di nav riste û corên wî û demên kar diyar dike
- Pirtûka çarem: derbarê rûî pêkhatin ku latînî bi vî awaye (oratio figurata) pêkhatyên raman behs dike.

Di nav pirtûkê da Sankitîus li gor wî ku ziman hem pêkhatekê taybete di komeka yasa û hem jî berhemê zihin û lojîk û jêrî ye mirove, Di zimanê latînî da eger (hokar, Causa) dû raman bi xweve digiri ku je bu me bi tamamî cudane, lê Sankitîus boçunêka din heye di vî derbarê da ku li gor wî peyv diyarî kirî, ji aliyekî xastinekî dîrokî derbarê heye û ji aliyekî dinve egerê peywendî dan bi tiştêkîve heye. Sankitîus vî derbarê da bi girê dana mirova baş û jîr û aqel di kuma bê kêr û kurtî aferêner dizane, bi sedema wê yekî ziman jî dibe bi tamamî lojîkî be wekî neynkîk reng ve de di jiyana mirovayetî da bi sedema wê eger kesekê bi vêt egerê zimanî bi awayekê taybet û giştî diyar bike divê vegere bo desit pêka dûrusit bûna ziman û desit pêkê jî ku bi awayekê tamam lojîkî bû.

Anku divê vegere bo destpêka peydabûna ziman. Ji aliyekî din Santîus behsa jêbrinî (Deletion) dike, ku her zimanekê yasaên taybet bi xwe ve hene, ku bi kesên taybet ve girêdane. wekî eve di îngilîzî da (I wish to drink) pêş (I wish that i drink) bi kar tê her zimanekê jêbirina taybet bi xwe ve hene, wekî eve ku Şekspîr dibêje: (I must away), pêş wê yekî beje: (I must go away)... Piştî wê Sankitîus ce girinê behis dike.⁽⁹⁰⁾ (Permataion) wekî di Latînî da amaje pê dike ku bi (Mecum) ku bi ramana (cem me) dehêt, boçûnên giştên Sankitîus derbarê ziman:

A / bi pişt girê dana wê serkeftina rêjeîya mirov di cîhanê da û têgehiştina ji ramana tiştan û biger xistina hêzên endîşe, divê qeubul

⁽⁹⁰⁾ – M.R.Sorn, *Mhimd Alî Hiq Şnas*, R114.

bikin ku di navbera pêk hatinên gotina endêşe ji aliyekî û pêk hateên din ji aliyekê dinve peywendiyekî beramberî hebûn heye.

B / wî cihê ku ziman roşinkerî hêza endîşeye wî rûy pêkhatên gutnên bînemaye risitê berovajî pêkhatên gutinên xeyalîne.

C / di gel cora û corên ziman û hebûna bê yasayîka zêde an ku di her zimanên dihête drûsit bûn, rûy nav biriyê serê nikarê ew rû be ku bebîte rûy pêkhatêy ziman. ji ber wê divê rûyekê dinê berçav hebî ku risîte û hêza xeyalî bi hevra girê bide ku ew jî rûy giringê pêkhatêy zimane (rêzimana).

E / wî cihê ku hemî zimanên wergêrîne ser hev û her gelêkî zimanekê taybetî xwe heye, divê rûyek hebe ku rêzimana cîhanî (Universal Grammar) bê diyar kirin û pênase bike ji rûy hemî zimanên cudaye ku şiyarên wergêranî heye bo ser hev wekî yek, madem ku tû belgeyekî kêr û kurtî di ber desit nebe ev ca red kirin jî nabe lojîkî ye ku wî rû ku dûbare vegeerên rûy bingê ya zimanî ye di gel rûy kirokî pêkhatîye ziman wekî yek bê, di encam jî da hemî ziman kêr û zêde xudan rûyekî pêkhate ya kirokî zimanin.

F / wî cihê ku ziman bi derbaz bûna demî diguherîne wî cih jî ku ziman di bingeh da bi desitê mirov û di encama hêza endêşe dirûsit kiriye ku xudê bî me bexşîye, lewra divê tenê yek zimanê desit pêkî û bê kêr û kurtî hebû bi û ew ziman jî divê berovajî kerê hêza xeyalê bî bi awayekê paqij û bê kêr û kurtî, risteên vî zimanê desit pêkine di ser bingehên yasaî ya pêk hate ya kirokî hatîye binyat nan, ji ber wê rêzimana ew zimane desitpêk heman rêzimana xeyalî bû.⁽⁹¹⁾

⁽⁹¹⁾ - M.R. Sorn, *Mhimd Alî Hiq Şnas*, R117.

Boçûna yekem û (A û B) li ser binemaên boçunên Eresto qalbi xwe girtiye.

Boçûna (T û C) li ser boçunên Eflatun û qutabxane ya rexneî qalbiê xwe girtîye.

Ji bilî boçûna (F) pêtiri ya boçûnan ji aliyê zimannasîne ve cihê qebûliye û pesendin.⁽⁹²⁾

1.13 Port Royal

Ev şîrove ku di sedsalên navenid da ji aliyê komek zanayên zimanvanî ve hatiye encam dan, bûye sedima wê yekî ku dergehê binyat dana hizrên berfirehtir bî derbarê ziman û zimanvanî û ji sedsalên piştre jî berfirehtir û zêdetir bin, ew jî li sala (1650) li Ferensa zêdetir geş bû ku berhemê wan nivîskarên pêştir bûye cafkanî ye vekolîn ji ziman bi taybetî ji aliyê koma Port royal demê Klud Lanislu ku yekêk bû ji rêzimanîne wê kome. Berhemên Sankitîus zêdetir eşkire kir û perde li ser aliyên veşartî rakir.

Port royall cihekê peristn bû di sedsala sêzdehem li nêzîk bajarê Parîs li Ferensa di nîva sedsala hevdehem da komek ji roşnibîrên beşê (janîst) bi vekolînên mezhebî û felsefî û zimannasî xwe mejûl kirin û wêrî sekinî bûn. here be nav û denig Klud Lanislu bû ku temena xwe terxan kirî bû bu desit anîna zansit û perwerde kirina lawan ,çunkî perwerde û fêr kirin binemaên zansit bûn. Kesekî din ji wan Antun Arno bû ew malbatêk bû ku xwîşka wî di peristgeha port royall da pleya (deyka rumî) hebû û her sê kes bûn binyatî koma damezirandin di ber fireh kirin pêşketina zêdetir hizrî zimanvanî rolekê gelek bi bandor hebû ku ew jî berhemî Lanislu li sala (1644) û yekê din berhemî Rnislu Arno

⁽⁹²⁾ - Ruzname Eatmad Mîlî û Ziban Şnasî Bru Amruz Şmare 844, R7,S1387.

li sala (1660) bû berhemê sêyem jî berhema Arno û Nîkul li sala (1662) bû. Ev sê berhem binemaên zimanvanî sedsalên piştê bi dûr xwe anî.

Bandora Sankitîus li ser sê berheman diyare li sala (1644) di çapa yekema berhemê da ku bi navê (şêweyekî nûyê fêrbûn û sanehî û bilez û ramana latînî) belav kiriye ku pertûka rêzimana zimanê latînî bû, di navda her bi awayê ku li ewrûpa ku awayê fêr bûnê sanehîtir bike. Vî berhem jî hind serkeftin bi desit anî ku Lûsa çardeyem paşa û firmanrewaê ferensa wekî pertûkên dibistanê diyar kir.⁽⁹³⁾

Ev koma rêzimanek hebû bi navê rêzimana giştî zêdebarê felsefa rêzimanî, pêngavîn mezin berev pêş çûnên vekolîna zansitî û zimannasî bi curekî ku:

- 1- di rêzimana port royalr da bu yekemcar ew yek hate selmandin ku rêziman tenê hunerê nivîsîn û axaftinê nîne, ku bo wî demî babetêkî gelek nû bû di zimanevanêda.
- 2- rêziman li gor boçûna arn û lanislo, zimanevanî brîtî ye ji şî kirina zimanî, lewra her di rêzimana port royal da dibînîn ku rêziman aliyên denig sazî û peyiv sazî û riste sazî digrît. (fonolojî û mornolujî û sîntaksî).
- 3- wê rêzimanda beşên axaftinê bi awayê felsefî û jîrî û lojîkî vekolîn derbarê kirîye û di riste sazî jî behs ji grê û riste kirîye.⁽⁹⁴⁾

Lê ev kome ji ber hokarên siyasî li sala (1712) ji aliyê paşayve dawî pê hat û nivîs karên wî bi tûndî rû bi rûyê yasay kirin, lê bandora wê kome di biwarê zimanevanê bo sedsalên piştî xwe her berdewam bû. Hertim berhemên wan wergêran ser zamanên din heya sedsalê nuzdeyem

⁽⁹³⁾ - G. Wheler, Port Royal Traditon of Grammar in Asher Simpson,1994,R3229.

⁽⁹⁴⁾ - Di . Dara Hmîd Mhimd. *Hendî Layen Le Tîwryekanî Ziman*,R26.

û derkuftina şêwazên nû yê çap û çapemenî her berdewam bû. Vî corî behsa me derbarê zimane vanyê di sedsalên navend dawî tê û dê berev dû sedsala gelek cuda û pir guherîn kirin derbarê zimanvanî û nas kirîna wan nivîser û kesên ku bandor li ser zimanasî bi giştî hebû û her dû sedsala hejdyem û nozdyem ve cine ku hemî pirin ji guherîn kirina ku bê cudaî di hemî ewrûpada ew guherîn serhil dan.

1.14 Zimannasî li Sedsalên Hejdehyem û Nozdehyem

Guherîn kirin bi derbaz bûna demî ku pêş van dû sedsala di biwarên zansitî bi giştî û zimanvanî bi taybetî dihatine rûdan ku pêtiriya wan jî bi renegekê felsefî rûdane, ev goherîn û şîrove jî tenê di çarçûvê yek welat da nedima, belkî serdemê vekolîna bi giştî di hemî dinyayê da serdemî vekolînya felsefî bûn, piştî qonaxa felsefî bûn qonaxekî din desit pê dike di sedsalên hejdehyem û nozdehyem da geşe dike û dikarîn bêjîn ku desit pêka vê qonax jî wê cafkanî digre ku dikirêt zimanên di gel hev berawrid bike ev qonaxe jî desit pêka peyda bûna rêzimanîya praktîkî bû (niqd aluxe tigbîqî). Ev jî tenê di yek welat da serhel nedaye, belkî bi awayekî cuda û ji aliyê çendîn zanayên cudave ev cure rêzimane vekolîn derbarê kiriye wekî li jêrê de behis dikin.

Franis Pop li sala (1816) di pirtûka xweda bi navê (awayê şîkirina di zimanê saniskrît) peywendya di navbera zimanê saniskrît di gel zimanên jîrmenî û yewnanî û latînî da dîxête ber vekolînê. Franis pop yekumîn kes bû ku vê xizmayetî derbêxe û bi hevra hebûna wan wek yek kome pesenid bike. Di rastî da ev nasandne pêş pop ji aliyê rojhelat nasya îngîlîzî wilyam cuniz li sala (1794) da derbarê wê yekî şîrove kiriye, lê ew amaje ya kurt û piçir piçirên cuniz nabne hokarê binyat dana vê peywendî. Li sala (1816) da ji aliyê pope ve raman û giringiya vê rastî ye eşkire kiriye. Her çende hejî nîne ku xizmeta van zimanan wekî zimanên

asya û ewrûpa bide pal pop, lê eşkire kir ku peywendên di navbera zimanî xiziman dibe bike babetêkî serbexwey zansitî zimanvanî. Ne zelalya zimanekî bi zimanekî din şîrove kirina wêneên û awaên zimanekî bi zimanekî din ji karên pop bûn ku kes pêş pop ev şîrove encam nedane.⁽⁹⁵⁾

Herwisa vê desit pêkê da zimannasên diyar wekî Ybakub Grîm vekolînên jîrmenî ku pirtûka (rêzimana elmanî) ku di demê navbera (1836 – 1822) da nivîsî ye vê bahs bi huirdî şîrove dike.

Pot (pott) ku vekolînên rîşe nasî komeka pêzanîna dirûsit bûn kar îxiste berdem zimannasên.

Kuhin (Kohin) ku di heman demêda şîroveên wî derbarê zimannasî û mîtulojî bû, Hindek zanên bi nav û denig wek Binfi (Ben fey) û Awfirçit (Aufrecht) û hindek din wan zanaya ku Pop vî bwarîda di nav pirtûka xwe da amaje bi navên wan kiriye.

Di dawîda divê amaje bi navê zanên din bikin ku roleka berçav di vê qonaxêda dîtiye wek Makis Muler (Max Muller). Ci kortîws (G. Curtius). Agwîst şlayişr (August Sichleicher) ev zanaye bi awayekî cuda vekolîn derbarê rêzimana piraktîkî encam dane.

Makis Moler di şîroveên xwe da di pirtûka (Ko wanek derbarê zansitê zimanî) ku bi zimanê îngilîzî li sala (1861) çap kirî bû, bûye sedema pesend kirina pêtiriya beşan ji bilî hindek beşan ku bi sedema dû dilya xwe rexnê lêdgrtin.⁽⁹⁶⁾

⁽⁹⁵⁾ - Firdînad Dî Susur, Wer. Kurş Efuy, *Dewre Ziban Şnasî Emumî*, 1381, R4.

⁽⁹⁶⁾ - Lectures On The Science of Languages –Delivered At The Real Institution of Great Britain In 1861 And 1864.

Ci.Kurtîws zanaê diyarê ywnanî derbarê rêzimana praktîkî ku pêtiriya vekolînên derbarê reşe û binemaên nasîna zimanê ywnanî bû li sala (1879) yek bû ji yekumîn zanaê ku rêzimana praktîkî di gel rêzimana klasîkî da eşkure kir, zanayên zimanvanî rêzimana klasîkî di desit pêka pêş ketina vî zaniste nûyeda bi guman temaşe kirîye û ev gumane jî aliyê beramber dirûst kir, ser encam Şlayşer yekem kes bû ku pêkola wê yekî kir bi desit hatnên lêkolîn di gel beşan bi awayekî kom ji yasa kom bike.⁽⁹⁷⁾

Yekêk ji rexneên herî girîng ku rû bi rûyê vê qonaxa rêzimana praktîkî bû ewe ku tenê berawridên zimanên hind û ewrûpa girtye û bi tu curekê behis ji komên zimanên dinê cîhan nakit û berawrid nake ji ber wê yekî bi kêm û kurtî hatiye bu vê qonaxî û rexne jî li hatîye girtin, çunkî ev lêkolîne pêş wê yekî dîrokî bin bi tamamî praktîkî bûn her çend ew jî bo şîrove ya dîrokî girînge, lê bi tenê nikare şîrove yekî tamam berawirda dîrokî di navbera zimanên bi desit bixe.

1.15 Ferheng Nivîsî di Sedsala Hejdeyem

(Wşewanî)(Qamus)

Di vê demê da guherîneka din derbarê ziman û zimanvanî serhilda ew jî nivîsîna ferhengî bû bo wan zimanên xudî pêş ketinekê mezin bûn. Ji aliyê vekolîna zimanvanî tê hejmartin ku di pirtûkên dîroka zimanvanî tîn dîtin. Di vê qunaxêda li hemî ewrûpa ferheng nivîsî bi awayekî fermî li seranserê hemî ewrûpa belav bû.

Yekem kes ku hizra mirovên bo xwe rakêşa Samul Canson bû. (Li sala 1709 – 1784 zi) Ku xelkê Lendena Berîtanya bû piştî (9) sal karî li sala (1755) ferhenga zimanî îngilîzî çap bike. Di gel wê yekî jî yekem

⁽⁹⁷⁾ -Firdînad Dî Susur, Wer. Kurş Efuy, *Dewre Ziban Şnasî Emumî*, R6.

kes ferheng nivîsî navê wî brêt Mîlr (1991) da navê sê kesên din dîne ku pêş Canson bûn. Yek ji wan Rabrît Kudrî bû ku ferhengek bi navê (rîza elf bê) li sala (1604) belav kirî ye ku (2500) peyv kiriye ferheng, nivîserek din ku ji ferheng nivîsa sitander nêzîke ew jî Can Kirze ku berhema wî bi navê (ferhenga nûya îngilîzî) li sala (1702) belav kirî ye û bîst û heşt (28) peyv têda ne.⁽⁹⁷⁾

Ferhenga D.Canson bo sala (1755) vedigere ku (40) hezar waje têdane, lê şroveên derbarê peyvek gelek pêş ketîtir bîn ji wê ferhenga ku Bîlî nivîsî bû li sala (1825), Noa Wîstir ferhenga emrîkî zimanî îngilîz ya xwe belav kirîye ku heya niha jî wek yek ji ferhengên îngilîzî ya girîng tê hejmartin.⁽⁹⁸⁾ Di welatên din jî pêngavên nivîsîna ferheng ji zemîna zimanên din peyda bû bo mînak li Îtalîya Wud Haws, li Feransa Wularîç. Belkî ferheng bo hindêk ziman jî nivîsa ku pêşketî nebûn wekî zimanî Saramakanî bo wê zimanî sala 1778 ferheng ji aliî yê tebşîrya bi taybetî ji aliye Sî.Al.Şufat ku bi Almanî dinivîsî.

Her wî demê da ferhenga Kurdî Erebi bi navê (Nûbihar) ku xwdî yê wê Ehmedê xanî ye ku bi merema fêr kirina zarukên kurd nivîsiye, her çend dîrokêka dirûsit ber dest nîne, lê li gor hindêk çavkanî bo dawînen (1600) û desit pêka (1700) vedi gerê, he jî gotine ku wî dem zimanê kurdî yek ji zimanên pêş ketî nebû, ew jî bi sedema çend egeran ku ji hemî girîngtir nebûna xwêndewarî di sercem deverên Kurdistanê da.

1.16 Ferensa û Girîngî Dana Wan bi Zimanvanî di Sedên Hejdeyem

Her çend sedsala hejdeyem pêş ketineka berfireh di hemî warênda û bi taybetî di warên zimanvanî peyda bû li Ferensa û zêdebarî wan hemî

⁽⁹⁷⁾ -M.R. Sorn, *Wer.Himd Alî Hiq Şnas*, R153.

⁽⁹⁸⁾ -Ç.B, R 154.

çavkanî ku bi desit hatîne ji aliyê zimanvanîve bi desit hat bûn, lê ji aliyê dîroka zimanvanîve wekî pêtevî nebû, bi çav geraneka bi vê qonaxî da dikarîn wê yekî dît ku rêziman nivîsî zehmet û yek rû (Sitriect gramimrianis) an ku hindek kesên bi tamamî xwe bi nivîsîna rêzimanve mijûl krî bî raste û rast ji aliyê dîrok nivîsên ve hatine pişt guh xistîn. Di navbera rêzimanên zimanê û feylesûfan de curek nakokî dirûsit bû ku tû aliyekî nekarî sûd ji koma din werbigire. Belkî dîrok nivîsên hind girîngî nedane rêzimanîyan û her cure berv pêşvecûnên wan red dikir. Tevlî wê yekî ku dîrok nivîsên û rêziman qebûl nekirin.⁽⁹⁹⁾

Ev di demekê da ku koma Port Royal li sala 1600 dikarin rêzimanek rêk bixin û belav bikin û di demê salên 1800 bo zimanê Ferensî çendîn rêziman hatine nivîsandin ku dikarîn bi sedsala rêziman nivîsî ya Ferensî bête navkirin û heman peyrewa rêziman nivîsî ya Port Royallên hebû, çunkî di nav wan da hejmarek rêziman nivîs (kşîş)(zelamîn olî) di nav da gelek bûn û klîsa jî rîya xoş nîşana wan da.

Çendîn zimanvan xwe bi vî karîve mijûl kirî bû ku her yek ji vana komek bandur û berhemên xwe li ser rêziman û zimanvanî hêlayne.

1.16.1 Klud Faru Dû Wjla

Klud Faru Dû Wjla (1585 - 1650) ku bi babê rêziman nivîsî ya ferensî tê nav kirin. Ew hem rêziman nivîs û yekek bû ji endamên demezirênerên ferhengistana ferense ji berhemên bi nav û deng bi navê (amajeyek derbarey zimanî ferensî 1647) bi ferensî (Remaraues sur la Langue française) ku di binyat dana şewaza rêzimanî ya sedsala

⁽⁹⁹⁾ – Declare Jean And Pierre Swiggers .La Ligusitqu Franchise And Xvll Et Xvlll Science Ímitations The Request Reception Et Context Glob All Ín R.Lorenze(Ed) . Acts Do Xix Congress Ínsercion Dela Linguistics' Filoloxia Romanicas . Univesiade Desantiago Decomposetal 1989 Vol.VII . Foundation Pcedro Barrie Delamaza, Conde De Frnosa A Corun Pp 763, 1996.

hejdeyem de rolekê bingehî gêrit û bi dergehê rêzimanî ya wê sedê hate hejmartin. Piştî wî xasit ku tenê bi rengekê wesfî û rêpêdanê ji zimanê xwe da behs û şîrove bike ku ne li ser bigehên rêzimana Latînî û ne li ser bigehên lojîkî ne hatibne binyat nan.

Berhemê wî jî zêdetir ji awayê pêşniyar û rexne girtin kom bibû û bi taybet jî ji xeletên komêk nivîser gelek rexne digirt wekî Kardînal Rîşil Ku fermana belav bûna berhema Wjla bilav kir bi behane ya hutafên sîyasî.

1.16.2 Rinye Dimare

Ev nivîser di her dû sedsalên hevdeyem û hejdeyem da hebû di navbera salên 1692 – 1670 de bûye endamê ferhengistanê Feranse,(1684) piştre bûye serokê giştê wê ferhengstan, berhemê wî bi navê (mînakek derbarê rêzimana zimanî yê feranse)(Traitede La grammaire Francaise) belav ki, yekem rêziman nivîse ku gelek bi hurdî di hemî koşên zimanî ve şîrove encam dabe.

Berhemî wî yekem berheme ku dikare di gel berhemên nû bîte hemberî kirin ji aliyê fonetîk û her di wî warêda hemî dengên dihêne wêne kirin û şî kirin, piştre behsa amrazên nasandin dike. Ku bi şîrove kirina (nav, awellnav, cureên ranav, demên kar, şî kirina kar, amrazê peywendî, awell kar, amrazî zyade) diyar dikirin. Bi her awayekî be pêşniyarên Dimare bêtiriya wan temamin û çespîne û hêşta bi awayekî giştî bandora wan her maye, di heman demê da jî pitrî ya wan hemî çalakî nîşanên perwerde bûna wan mijûl bûne derbarê rêzimana zimanve.

Wekî mînak ji kar înan amraza nasandina Dimare bi awayekî cuda amaje dike ku di zimanê Ferensî de li gor ew cudaî heye wek van dû bikar înan di zimanê Ferensî de.

((La noblesse de france))

((La nobless de La france))

Ku di derbirîna yekem da bo komeka bilind dê bi kar înan û di derbirîna dûyem da bo kesekê bilind bi kar hatiye.⁽¹⁰⁰⁾

1.16.3 Klud Bufye

Nivîserekî nû ku pêtir ji sedê hejdeyem derdikive ew jî Klud Bufye (1666 – 1737) ye. Nivîskarê pirtûka (rêzimana zimanê ferensî li ser binemaên şewazêka nû) bi ferensî (grammaire francoise sur plan nouveau) ku li sallî (1709) belav kirîye, di gel belav kirîya zansitî bi navê (şîroveên din)(memoires de trevoux) alîkarî dikir û sernivîskarê wê belav kirîyê pêkola wê yekî dida ku raman û boçûnên Bufye di nav belav kirinê da derbarê ziman û rêzimanê de belav bike. dîrok nivîs zimanvanî Biljî, Bufye wekî zimanvan dide nas kirin ew jî rêzimana zimanê Ferensî li ser binemaên şewazêka nû ji sê beşan dabeş dike.

- Yekem / derbarey nasandna coreên kar.
- Dûyem / zemîneya esasî rêzimana ziman.
- sêyem / paşgirêk derbarê derbirîn û xwêndin û nivîsîn ve.

Bufye ji hemî nivîskarên pêş xwe zêdetir amadê qebûl kirina awayê endazeya eqlî (awez)gerî têda bûn û dibêje: rêzimana zimanî bi awayê endaze (matmatîkî) peyrew bike bi vê rengê divê bi curekê bîte dirûsit kirin ku hemî zaravayên pêş bikar hînin û bi temamê naskirî bin.

⁽¹⁰⁰⁾ -M.R Sorn, Wer. *Mhimd Alî Hiq Şnas*, R160.

Bufye wek Wujla li gor wî ku rêziman cihekê wêneî yan wesfî hebe, li gorî wî bikar înanek baş û di heman demda bikar înanek xrab jî heye û ev cudaî di rastîda bikar înana zimane ji aliyê kesanve girê daye.

Ligor wî ku her zimaneke xudî rêzimaneka serxwî heye û ev jî ji aliyê nivîser û nivîsîn ve pêş xwe veşartî bûn û rêzimana zimane bo ser hev veguhastin û bi vî karî jî rêzimanek xrab bo zimane desit xisit. Ji ber wê Bufye li gor wî rêzimanê cuda bi hevra di navendeka zimane giştî da tuxtir û bi hêztre cunkî hemî ziman hokarin bo nîşandana û eşkire kirina sirûşita xeyalî.

wî cihî jî ku xeyal peyrewêka cihanî heye li ser vê divê ziman jî heman renig bête peyrew kirin. Beşên serekî her riste pêk dêt ji :

- A / nîhad. ew tişte ye ku kesek derbarê baxvê.
- B / guzare. ew waqeye ku rudan bekar dêt.
- C / wabestê amraz. Ku ev wekî modêlên rojne ku her mîletêk bi curekê modîlî bikar dînin wekî clû berg ku her gelêk bi awayekê cuda clên xwe di poşê. Ku hemî yên peyrewêkî cuda hene bê eve jî ku wabest bin bi hevra.

Çendên din ku di vê sedsalê da bandor hebûn wek Dmarser Jîrar, Buze... Hwd. ku her yek ji wan rêziman nivîs û zimanevanên bi nav û denigên sede ya hejdayem ya Ferinse bûn, berhemên wan rolek erênî berçav ji pêş xisitina rêziman bi giştî û zimanevanî bi taybetî hebû. Vê rê ev beş vekolînên me dawî tê û qonaxa sedê nozdeh û desit pêkekî nû ya zimanevanî desit pê dike û di beşên din da behsa qunaxên sedê nozdeh û bîst û ew nivîser û zimanevana dikên ku zêdetir bandor li ser zimanevanya giştî hebûye.



BEŞA DÛYEM

2 BEŞA DÛYEM

2.1 Taybetmendîya Ziman

Ziman diyardeke anku em dikarin bêjn ku taybetmendêke taybete bi mirov û zadgayek ku wêne û ramana nû di cîhanda berhem dîne û berev ramaneka bi sûd û têgehiştên waqê di jiyana û xoşewîstî û cwanî û azadî.... Hwd radikêşe.

Mirov bi rêgeya ziman ku dikare biçête nav bina nasîna ewên din û le gel wan peywendî dirûsit biket û yekum civaka mirovayetî bihênête binyat nan û alîkarîya mirov jî da ku cudaên hesit pê bike û di wî rêge da şîyanên pêş ketin rîz bikit, ji ber hindî dikarin diyar bikên ku ziman girîngitrîn û berçavtirîn taybetmendîya mirove, Ji bilî wê yekî ku ziman peywendên mirovayetî di gel dinya ya nanxwe ya mirovên û dinya ya dereve ya rêkîxit. Di warê hez kirina mirovî da taybetmendîya xwe heye wek faktera bandorên hizir û bîre, bi wî awa yê ku şêwe û sîfatên mirovan diyar dike û pleya her kesêk bi sîstema zimanî ve girê daye, bi wê raman ku her çende tak pêşketî dibî hizra taybetî jî pêşkevîtîr dibî.

Wît Genîştayin ziman dabeşê dû curean dike ku zimanê (tak û ko). Bi wê raman ku zimanê tak grê didat bi şîyanên hizrî take kesve û cudaî ya zimanê giştî bi berçav girtina civat tê danan.

Zimanê hemî dinya di gel hev cudayî heye, lê di dû tiştan de wek yekin: yekem di veguhasitina wize di hewaê da ku bi egera şepolên denigî sûd werdegrin, dûyem jî ev şepolên denigî di peywendî dane bi rastî ya cîhana derve bikar tînin. Lê cudaî ya ziman di gel hev hene, ew cudaî jî ku di rêk îxistina yasaên nav her zimanekî de diyar dibî.

Girîngitrîn taybetendî ku ziman bi her neteweyekî dibexşît bi taybetî piştî sedsalên navenid û şoreşa Ferensa ku ew gel û neteweên pê tene

naskirin. Anku her gel û netewek xudî zimanekî taybetî xwe bû û gelek jî pê dihête naskirin ku ev yek jî ji aliyê bêtirî ya civak nasên bi boçûnêka pesenid hejmar dikin, wek ewe ku dibêje gela ferense ya Îngilîz ya Çîn û kurdî û Rûsî.... hwd. ku bi zimanên wan têne zanîn ku merem çî geleke. Ew taybetmendî ku zamin daye gelan û ji fewtan û nemanê paristne. Girîngitrîn bidesit hatîya her gelekî di zimanda berceste dibî û mana wî jî peywendî bi ziman ve heye. ⁽¹⁰¹⁾ vêrê dikarîn bêjîn ku yek ji girîngitrîn taybetmendên nasîna her gel û neteweyek zimane.

Piştî şoreşa ferensa wî demê 200 salên pêştir di koma 386 wîlayetên Elmanya çar wîlayet beruvajî ewên din reftar dikirin, ew jî mezintirîn eger bi sedema cudaîya zimanî bû di gel 28 wîlayetên din da yek girit û ferenisa hate damezrandin. Ku di demê 100 salda zimanê ferensî sercem wîlayetan girit û desit pêkê wisa nebû. ⁽¹⁰²⁾ Yan li deverên Erebi ku piştî pêkul kirin bo kom kirina hemî Erebaên di yek rengê zimanîda karî yek core zimanê standar bo hemî erban bîbînin û bibe hemî lehceên Erebi. Ev mînakên ku hatîne behis kirin yên wan gelanin ku bi dirêjî ya dîrokî xudî dewlet û hikumet û yasayek bûn lê mîlletêkî weku kurd Ku ne xudî zimanekî hevgirtî û yek parçe axe jî ne bûye cewa bikarin ferheng û zimanê xwe biparêze, ji bilî helkuftên cugrafî û srûştî ya jîngehî û çî bike ku parêzgarî ji pîcbûna zimanî bike. Bî taybetî ku bêtiriya pêkul bu jinav birina wê hatîte dan, lewra niha gelê kurd zêdetir hokarêk ku pê bîte naskirin tenê zimane, ku cuda ye di gell gel û netewên din, anku vê qonaxa jiyana dinya da hebûna ziman bi faktirên serekîên gelan tê danan. Lewra hebûna zimanekî hevgirtî bo kurd di pêş her karêkî tê.

⁽¹⁰¹⁾ -Huseyn Mhimd Ezîz, *Slîqey Zimanewanî û Griftekanî Zimanî Kurdî*, 2005, R74.

⁽¹⁰²⁾ -Nîma Çayçî, *Wer. Az Angîlsî, Wîb Sayt Wwiw. Kurdish Academy. Org.*

Ji her girîngitrîn taybetmendî ewe ku ziman hebûna gel û neteweyên derîxit û mana wan jî bi zimanê ve grê daye. Yekêk din ji taybetmendên zimanî ewe her çende ziman bi xwe lojîkî û raman dare lê ew nmad û hêma û sîmbule tû cure peywendyek di gel wan tiştan ku nav pêve krî nîne, belkî peywendî di navbera (dal û medlul) peywendyekê qerar daye û rêkeftine, wekî mînak:

Di zimanê kurdî de peywendî ya peyva (dar) û (dar) bi xwe awayekî rêkkeftine û civakê zimanê kurdî ye û em (dal û medlul)(ebje û subje)ye di civakêka zimanî dî da diguherê û bo her yekî navekê din çêy kirîne, lê navkirî heman tişte.

Yek din ji taybetmendiya wê ewe ku ziman zaîye û dizêt, ev şyane ku bi hejmareka kêma denig û hêmaên bê raman û nîşan û peyv û risite bê jimar bihênête dirûsit kirin, hezkirin û ramana xwe derbibrît ku pêştir bikar nehatîne û ne hatîne bihîstin û kesên din bi hêsanî fam bikin û têbigehin. Yekê din ji wan taybetmendiya zimanî pêk hatiye ji sîmbul û hêman ku mirov di wan sîmbulan fayde wergirtîye ku bi awayî hêma û nîşana hatîne dirûsit bûn û piştî ramana jî veguhastine li gor vê taybetmendiya mirovî şyana bê endaz heye bo dirûsit kirina hêma û nîşana ramanadar. Taybetmendîka din ewe ku ziman di hemû qonaxên dirûsit kirina hêma û nîşanên raman dar û riste û deq û yasaên de rêk xistîye û rêk û pêkîk heye, ku ew saz kirin û dirûsit kirin rêk dixê û peyrewî ya wan yasaê dike ku ew hêma û nîşanên rêk dixê ku ji desit pêkî bi bê agahî (srûştî) wan yasa û rêsa ya peyrew dike.

Taybetmendên ziman bi zimanêve û bikar anîna wê ve girê daye ku her çend bikar anîna pleya wî berev pêş çûnê zêdetir bê, ziman jî

rêkxistîtir dibe wî demî ziman jî pleya berev pêş çûn û bikar înan wê jî zêdetir geşe dike.

2.2 Sedema Berfireh Bûn û Geşe Kirina Ziman

Xeyalêka berfireh heye bi awayekî dinêre cîhan ku li gorê wî pêverek bi ser welat û ziman da dabeş bû, ku di vê cîhanîda snûrên ziman û welat û nîştîman wek yek dibin, ev yek jî bi xeyal tê hejmartin çunkî tişteke wisa mequl têda nîne çunkî di yek welatîda çendîn ziman hebûya wî heye û sînore welatan jî di hemî biwarinda çenyek nîne. Geşe kirina ziman û belav bûn di snûrê welatanda wek hev nîne û çendîn hokar hene bo wê yekî ku wê cudaî derbêxe û geşe kirina ziman wekî hev nîne. Vêrî jî mînakekê wergirîn ji çewanya geşe kirina ziman û piştî berfirh bûn û belav bûn û egerên wan jî diyar dikin.

2.3 Mînaka Zimanê Kîşwa

Kîşwa ew zimane ku nêz bi 10 milyon welatyên Hîndî di şeş welatên cudaên Emrîka ya Latîn de axaftin pê dikin û her yek ji welatên Pîro û Bolîvyaya û Îkwador û Kolombiya û Çîlî û Ercentîn, ku li snûracîyayê Endêzîn li çend deverên Emazonda. Bêtirîya egerên belav bûna vê zimanê videgerê je bo eve ku bawer înan bi vî ku wî ziman di reçelesa wan deveranda hene û cavkanîên zimanî jî li heman deverî cavkanî girtîye.

Li sala 1575 da Tolîdo cêgrê paşa fermanekî bilavkir bi damezrandina Gwanzulo Holgon wek wergêrekê di navbera zimanên Kîşwa û Îmaro û Bokonîda ku ew ziman bi giştî Hindên bin deshelatên paşaên Pîroye. Li sala 1586 deqêkî nivîsî li Labaz paytextê nihaê Polîvyada dîtiye ku behsa wê yekî dike ku tevaya Hindên wî kerte û wî bajarîda bi zimanî giştî Eymar axaftin kiriye û bêtirîya wan bi zimanê

kîşwa axfitîne û têgehşitîne, ew ziman ku zimanê giştîye li Înkâ ji bilî vê zimanekî taybetî din jî wê navceê hebû zêdetir li hindêk gûnd de ku bi zimanê Bîokonya nas kiriye. Li sala 1599 da qeşe Kuyzo daxaz ji krîstyan kiriye bi zimanên Kîşwa û Eymaro û Byokonya axaftin di gel palêwrawên bo rahîbîda bikin, çunkî ew ziman li navçe yê bin deshelata qeşeda axaftin bi kirin.⁽¹⁰³⁾ Piştî dagîr kirina navceê ji aliyê Îspanya ve rewşa zimanê navceê guhorîn bi serda hat, bi curekî ku nşînên wêrê bi çend zimanên di yek demîda axaftin kiriye ku ew jî bi welatê dagîr kerî nedihate qebûl kirin, lewra qerara fêr kirina zimanê welatê xwe der kir piştî wê yekî ku zimanê kîşwa birîye xane ya guman, çunkî zimanê brêvebrinê bû di împoraryetî Înkâ û di naverasta Çîlî û bakurê rojhelata Çînî û Îkwador û Kolombya bikar înan, lê ci nemabî ew ziman bi navçûna împoraryeta Înkâ bi êgcarî windabê be wê jî biwar pê dabû ku ji dûfaqî bûnê zimanê welat bi wê ku zimanê Îspanî ji aliyekî û zimanê Kîşwa ji aliyekî dinve.

Lê eve ku welatê dagîrker dixasit encam bide bi wî away nebû ku serbazên ne karî zimanî îspanî bisepînin lewra hewar brine ber bikar anîna zimanî kîşwa bi merema rastvekirina wî împoraryetê. Ew qonaxe wisa berev pêş dicû ku bikar anîna zimanê kîşwa gelek betîn be û gelek bi başî bikar înye di qonaxa desit pêkîda. Di qonaxên pişt re da piştî wê yekî ku pêkolin gelek dan bi merema fêr kirina xelkî bo zimanê îspanî lê bê sud bû lewra dagîrker desit bi wêran kirina cihên pîroz û peristgehan û ji navbirina kultûrê taybetî navcên û di hember vê yekî da rabûn bi çap kirina pertûkên pîroz û fêr kirina xelkî ji olên mesîhî ku bi zimanî kîşwa ev hemû tişte di gel kîşwa encam dan zimanên Eymar û Bokonya jî pêş ketî bûn, çunkî ew jî wekî kîşwa bikar anî. Lê demê van dû zimanin

⁽¹⁰³⁾ -Luys Han Kalf, Wer. Bhadîn Clal, *Şerrî Ziman û Syasetî Zmanewanî*, Hewlêr, 2012, R125.

gelek nema ku axaftin pê dihate kirin, îdî wekî zimanê prêvbrina û bandora zêdtir bikar nehatin tenê kîşwa ew ple û senig xwe ji desit neda bû.

Piştî sedsalê şazdê û sedê hevde tenê kîşwa mabî ku li navçeyên çiyayê Endêzin serbexwe yî parasit bûn, lê piştî dirûsit bûna dewletên û îcarê kîşwa bi xwe rû bi rûy qonaxeka nû dagîrkarî bû ku di vê qonaxê da gelek serkeftî nebû, bi wê cure ku deshilatê îspanya karî Deshilata brêvebrin û mezinên û vejandinê bo xwe qorx bike û kîşwa jî di nav mlletêda wekî zimanê navceî bikar dihat û piştî wê yekî ku paşên Îngilîz bu demêkî ev ziman bikar anîn û piştî desit jî berdan û di demê çend sedsalan bû bi tak zimanêk ku çendîn zimanên taybet li rûberêkî mezin nêzê zincîr çîyaên Endêzda hebûn û hevdem bû bi tak hêmaê resenayetî hîndos, Ev geşe kirina zimanê kîşwa bêtir ji aliyekî soz û wêjdanê geşe kirîye lê eve cihê tî ramane ku heya niha di nav xelkêda pê diaxafîn, her çende jî zimanê Îspanya zimanî fermî û brêve birina welatên dagîr keranin.

Eger temaşeya vê dîroka zimanê kîşwa bikên dibînîn ku zimanê kurdî kêmtir nîne ji zimanê kîşwa belkî bêtir ji zimanê kîşwa berevanî ji resenayet ya xwe kiriye û di qonaxên cudada zêdebarê wê yekî ku deshelat darên Êran û Erebî bi dirêjahiya dîrok pêkola wê yekî dikirin ku zimanê kurdî ji nav bibin û mezina hîya xwe bisepînin, lê veqer bo dîrok û ew hel û merce ku li navçeyên kurdistanê têda bi taybetî di warê cugrafîda ku bi temamî di navceyeka ciya da mabîna xwe selmandî ye û zimanê xwe bi heman awayî ji dagîr karên paristye, di qonaxa nû jî da bi heman awaê eger deshelata dagîr kerî neba kêmtir nebû ev ji bilî pêkolên navendî ku zêdetir pêkol kirine ferhenig û dîroka zimanê kurdî jnav bibin, lê zimanê kurdî her kariye wê serbexwe û zimanê xwe biparêze û

bigehê qonaxa niha. Ev geşe kirin û berfireh bûna zimanên hevçerx jî vedigerê bo hebûna wê dîrok ku çendîn eger hene bo berfireh bûna û geşe kirinê wek zimanê kîşwa ku vî awayî wan egeran diyar dikin.

2.4 Egerên Berfirhî û Billav Bûna Ziman

Zimanê kîşwa wekî mînak me amaje pêkrî, dikarin li cêha wî mînak zimanê Kurdî û Ermenî û çendên din bînîn, lê kîşwa ku bi tamî ji kurdî nêze ji rûy egerên mabînî û geşe kirinê, baştirîn mînak bû bu vî behis. Ku çendîn eger hene alîkarê mabîn û geşekirinê dane, lewra dê girîngtirîn egera desit nîşan dikîn.

2.4.1 Sedema Cûgrafi

Cugrafi yekêk ji egerên herî girînge çunkî her neteweyek li snûrekê cugrafi diyarî krîda mabîna xwe didûme, hemû beşên cugrafi bi corêk ji corên bandorê ser zimanî hêlaye ku ew jî keş û hewa û nexşe û jîngeh û nizimî û bilindî ya navçeyên ku wisa kiriye çendîn zar di çwarçûvê yek zimanda kom bibin û her yek ji wan zarava jî bi eşkire wê bandorê dibîne bi taybetî li navçeyên cîyayên hewraman ku bi sedema egerên cugrafi chê wan bandorek mezin li ser mabîna zimanî bi taybetî zimanê navceê hêlaye û heya niha jî kêmtirîn guherandin bi ser resenayetiya zimanda hatiye. Anku bilindya navçe ya û çiyayê girîngtirîn eger bûn bo mabîn û geşkirin jî her bi heman awa ye û di qonaxên dîrok jî da yek bû ji zimanên xwecihyên bêtirî ya navçeyên kurdistanê.

Bi heman awayî kirmancî bi heman awa bû ku navçeyên ji aliyê cûgrafi ve cihêk baş bû bo dirêj kirin bi zimanê navçeyê. Di mînaka zimanê kîşwade ku despêkê zimanê dûyem bû ye, pişt rê belav bûye û bûye bi zimanê yekem bi dirêjahî ya navçeyên çiyayên Endêz. mezintirîn eger bo mabîna wek rêgirîyeka gelêka dijwar li dev dagîrkera mabî ku rê

ji geşekirin û berfireh bûna wî zimanîda bigrê. Lewra egerên cûgrafi rengê berfireh bûna zimanên desit nîşan dike û her egerêka cûgrafi alîkarî ya curekê ziman daye ku geşe û berfireh bibît. Wekî zimanê (Swahlî) Erebi ku li navçe yên derya yên Erebi hatiye û bûye zimanê deryaî bi wî ziman jî geşe kiriye.

2.4.2 Sedema Jîyarî û Bajêr

Ewî ku girîngî bît di vê xalêda ewe ku srûşit û sedemên di gel jîyana nû ya bajêr û bazar bi hevrê girê dayîne. Bajêr wekî wê ku heye û dibe melbendê kom bûna bêtirî ya xelkê û pitrî livîna jîyan têdaye ev kom bûn û livînên nav bazar tevî bûna kiltûrên cuda girîngitirîn sedme bo geşe kirina ziman û berfireh bûnê wek diyare bêtiriya xelkê bi sedema hebûna bingeh û kargêrî di navenda bajêran da kom dibin û hemî li ser yek cure ziman axaftin dikin bi merema dirêjî danê bi jîyan û derbas bûna karên xwe hemî wî cure zimanî bi kar dînin. Belkî ew xelkên ku li navçe yên derve yê bajirên dihêne bajêrê je bo her meremekê bît ji mecbûrî diçine cem wê xelkî ku wî ziman bi kar dînin ku zimanê xelkê bajêr je bo mînak li hewraman xelk bi hewramî diaxive, lê eger dêçne navçeyên Soran di îro da bi taybetî bajarên wek Hewlêr û Silêmanî curekê mecburê heye ku awa yê axaftina wan bajêra bi kar bînin. Ev jî bo navçeyên zaza û dêrismê her dirûste ku dema diçine Amed yan bajarên din mecbûrin ku bi zaravayê Kirmancî bi axifin. Lewra bandora jîyar û bajêran giringiya taybet ya xwe heye je bo berev pêş birina ziman û geşe kirinê wek dibînîn zimanê bajêrê Silêmanî bêtiriya geşe bi xweve dîtîye ku çendîn eger hene wekî hebûna senterên û zanîngeh û hatin û çûna bazarganî û..... Hwd. ku li sinurên navçeyên Soranî bêtir bi kar tê.

2.4.3 Sedema Abûrî

Yekêk din ji egerên herî girîng belav bûna ziman û geşe kirinê ji aliyê abûrî û bazar kirin da ye, ku dibe mezintirîn bandor li ser belav bûna ziman ne tenê di çarçûvê cûgrafêka diyar kirî belkî sinurê cûgrafî ya xwe jî derbas dike û pêngavên je bo navçeyên dûrî je xwe jî dide ku ev jî dikarê di rêka bazar kirin û rêgaya bazirganî ve zêdetir encam bidên wekî bi eşkere diyare ku berfireh bûna zimanê îngilîzî li navçeyên dûr ji sinurê cûgrafî ya xwe tenê ji ber wê yekî nîne ku zimanekê temame belkî çendîn egerên girîng hene je bo belav bûna wî ziman ku yek ji egerên girîng di warên abûrî û bazar û şandina tiştan da ye, bi wê raman ku bi sedema bikar anîna zimanê şandin û nivîsîna îngilîzî li ser kulupelên ku di rêka bazirganî û abûrî ve tîne şandin, mezintirîn bandor li ser bi kar anîna wan tiştan heye û bi taybetî belav bûna wan jî li wan welatên ku niha bi welatên cîhana sêyem tîne nav kirin.

Lewra abûrî di berev pêş birina ziman û geşe kirinê da roleka serekî dibîne, di heman demê de egere ji bo pêş ketina wî zimanê di cîhana derve ya bikar anîna xwe û demê pêşketî dibît ku diyare ji aliyê abûrîve karî bît wê pêşkeftin berfireh bike bi wê ramanê ku tû gelêk û neteweyek nikare pêş kerî bît heya abûrîyêka serbexwe ya bihêz nebî. Anku hebûna abûrîya bihêz alîkarê serekî ye je bo pêşketina civak bi giştî li hemî warên de çî di warê sîyasî û civakî û serbazî û olî û zansitî û çî di warê hejmar kirina wekî gelêkî zîndî û xûdî jimar ji aliyê gelên dinve. Hemî ew pêşketin ji aliyekî tê hejmartin û pêşketina zimanê gel jî ji aliyekî dinve tê hejmartin anku her gelêk bi hemû pêşketinên nahête nas kirin ji bilî pêşketina ziman nebî ku gelêk zelal û eşkire ye pêşketina zimanê her gelêkî bi pêşketina wî gelî tê hejmartin û ew gel jî pê dihête nas kirin,

anku aliyê abûrî li gor bîr û nêrînîn Markis tenê egerek buyeje bo geşe ya ziman û berfireh bûn jî.

Ji mînaka berfireh bûna zimanê Kîşwa de egerên veguhastina bazirganî û hêlên veguhastina bazirganî çî bi rêga ya hişkatî yan deryayî û heta asmanî jî rolêka bi bandor dîtî ye je bo pêşxistin û geşe kirina vî zimanî.

Zimanê kîşwa ku desit pêkî ji navçeyên deşit û kenarên navceya (Pîro) axaftin di rêka abûrîve hatî ye veguhastin bo navçe yên cudaên Endêz ku rêge ya alûgurên bazirganî bû, di navbera navçeyên cuda û kenar û deşit, lewra ew ziman bi awayekî berçav geşe bi xweve dîtî ye, wekî berê me amaje pê kirbû zimanê yekem pêş zimanên din û bêtir bikarhêner ji dewrê xwe kom kirî ye ku hokarê abûrî û veguhastina tiştan bandoreka mezin li ser wê berfirehî û geşe kirinê hebû.⁽¹⁰⁴⁾

2.4.4 Sedema Sîyasî

Bi dirêjahî ya dîrokê sîyaset û sîyaset kirin bi zimanekî diyarî bandorek mezin kiriye ser hemî çemkên jîyanê civak bi wê raman ku araste ya sîyasî ya her gelêkî rû bi kiv bê araste ya fikir û hêz û pêşketina wê gelî jî bi heman awayê dibî, di warê zimanda sîyaset rolekê herî serekî dîtiye ku karî ye zimanekî bimirîne û zimanekî din jî lawaz bike zimanî fermî jî geşe pê bide, herwisa bi eşkire diyare ku zimanê Endûnîsya ku zimanek nîne bi zimanî Endûnîsî belkî bi sedema hebûna îradeka sîyasî karîne zimanê (Malaye) bikine zimanê fermî û navî zimanî Endûnîsî di ser dane û geşe jî pê bidin.

Yan ku ewe bi sedema hebûna hêzêka sîyasî karîne zimanê Îbrî ku tenê zimanê pirtûk û olîên grupên Cûyan bû, ji mirinê rizgar bikin û bibe

⁽¹⁰⁴⁾ -Luys Han Kalf, Wer. Bhdîn Clal . *Şerrî Ziman û Syasetî Zimanewanî*, Hewlêr, 2012, R130.

zimanekî bihêz û bête geşe sendin û ew jî piştî wê yekî di sala 1881 desit avîtnê bi zîndû kirina zimanê Îbrî û piştî damezirandina qewarêkî bo Cûwan li navçe ya Qûdis li sala 1904 rêkxistnek bi navê ziman hate damezrandin û piştî damezrandinê hikûmeta Îsraîl li sala 1953 li gor yasa ya ekadîmya ê zimanê Îbrî hate damezrandin û bûye yekêk ji şaxên hikûmet û dûbare nivîsîna rênûs û darşitina peyv û peyvên nû ê serkeffî bû, çendîn zarave yên nû hatine nav ferheniga zimanê Îbrîve û mezintirîn pêşketin pêşkeş bi zimanê Îbrî û Cûên hete kirin.

Ev jî eve digehênê ku egerên sîyasî û îrade ya sîyasî wekî çewa zimanekê ji nav dibêt, wekî eve ku li salên 1924 desit ji bi jinav birina zimanê Usmanî hate kirin ku ev zêdetir di warê şêwazê nivîsîn bû û karî awayê latînî bisepîne û serketî jî bû, ku bi sedema sîyasî zimanê Usmanî hate win kirin ku ew jî di welatêkî de ku bingeha dariştinê wî ziman bû.

Bi heman awayî dikarî bi sedema heman eger wekî zindûkirina zimanekî pişt rê berfireh kirina wê wek zimanê Îbrî ku rolê serekî bibîne û bibe faktorêkî serekî ji bo geşe kirina ziman wisa jî bibe faktorêk ji bo di nav birana zimanêkî din.

Lê mexabin heya niha ew îrada sîyasî di nav kurdan da dirûsit nebûye ku bikarîn zêdebarê wan hemî nivîsînîn zimanê kurdî zimanekî netewey ji bo mîlleta kurd peyda bike, ku tenê rêgir di berdema dirûsit bûna wî ziman jî di îrode tenê nebûna îradeyeka sîyasî ye ku biryar li ser dirûsit kirin û praktîzekirina netewê bide. Ku ev behs gelêk dirêje tenê wekî amaje danêk bo giringîya hokarê sîyasî di nasandan û geşe dana zimanda ku me amaje pêkrî.

2.4.5 Sedema Serbazî

Wekî zelale ku artêş li her cihêkî desithelat hebe wî demî zimanê wî artêş jî bibe zimanê serekî yê wê dever bi dirêjî ya dîrok û bêtiriya wan welatên ku ji aliyê artêş û serbaz welatên din bi qiweta hêzê dagîr kirin artêş û serbaz hevdem zimanê welatên dagîr kirine bûye bi zimanî yekem li welatên dagîr karî de ku çendîn mînakên eşkere û zelal hene bo vê babet.

Wek dagîr kirinên Ferensa bo ser bakûrê efrîqa ku karî navçeyeka berfreh li Mexrîba Erebî û Cezaîr û beşêka Lîbya bêxe bin desithilatê ya serbazî ya xwe û karî zimanî Ferensî li wan cihan ku pranî ya herî zav Ereb bûn bisepêne û zimanê navçe yê qedexe bike ku heya niha jî di hemî kar û barên fermî yên dewletî û îdarî da zimanê Ferensî li bêtiriya wan navçe ya ku Ferensa dagir kirî bûn zimanê yekeme û bêtirî ya xelkê wî zimanê bikar înin. Yan jî dagir kirî ya Îngilîz bu ser welatê Hind ku zimanê Hindî hate qedexe kirin û bi hêza artêş û leşkirî zimanî Îngilîzî kirine zimanê yekem û fermî ê welat ku binema ê zimanewanî yê li ser desitê (Panînî) Hindî damezira bû û bo demê çendîn sedsal wekî zimanê fermî yê Hindistanê bikar dihat, belk niha jî zimanê Îngilîzî li programên xwêndin û bikar anînên îdarî ên hikumetî bi awayekî eşkere maye û renigve daye.

Li Emîrîka yê Latînda dagîr karên Îspanî ku bi heman awayê serbazî bibû ye egera çespondina zimanê Îspanî bi ser zimanî Latînî û zimanî navçe ya navçeyên Emrîkê Latîn, ku heya niha jî li bin bandora artêş û leşkîrên Îspanîda ye ku zimanî îspanî zimanî fermî û yekemê wî gelê tê hejmartin.

Di van mînakên de ku me behs kiri bi zelalî tê nîşandan ku serbaz û rolê artêş di belav bûna ziman û geşe kirina wê bi egerêka serekî û girîng tê zanîn, ev nek tenê di warê dagîr karî da belkî di warê îsbata wan biryar ku îradeyeka sîyasî biryar li ser dide ku artêş aliyê serekî ye di ci bi cî kirina wan biryar ci di nav xwe ya welat yan jî di derve ya welat bi taybetî di warê zimanîda ku bi sedema desithelata serbazîve dikarê di demekê kurt da zimanê yekem û fermî ji bo welatî dabinî û geşe bike. Ku carên din jî mixabin heya niha jî em mîlletê kurd di vî beşî de bê beş bûn û bi sedema nebûna artêş û sîstemekê qeyim nikare biryarên sîyasî di warê zimanvanî ve wek xwe ci bi cî bikit ku ev yek jî cihê daxye.

2.4.6 Sedema Olî

Ol jî hem wekî pîrozî û hem jî wekî bandor li ser tamamî ya tiştên jîyana civatî li sedsalên despêka mirovayetî de heye niha cihê girîngî pêdan û rêz girtina hemî mirovayetî bû ye. axaftinek heye dibêje: hemî gel bi bê abûrî û civatî û sîyasî û zansitî kariye jîyan bikin, lê bê ol anku gelêk nîne ku ol nebî peristîyek nebê bi perstê anku tu gelêk bi dirêjahiya dîrok nîne bi bê olî bît.

Girîngî ya olî di hemî warên jîyana mirovayetî bê hijmare, anku hebûna her olîyekî girê da yê bi hebûna gelêkî û beruvajî jî dirûsite, belkî hendê gel hene ku bi sedema olî rêzdar bûne û belkî karî ye wê rêgeve xwe bikine gelêk berferh û berfireh bibin. Girîngî ya olî di warê zimanvanî hind girînge ku bi demarê here serkî belav bûn û geşe kirina ziman dête zanîn.

Her li serdemê yekema nivîsîn û xwêndevanî heya ku îro ol karî ye wî pêge û giranî xwe rabigirê di belav bûn û geşe kirina ziman de, wekî mînak zimanê Erebi ku pêş olê Îslam ew ziman nebû ku cihê girîngî bî

yan bi vî awayê muhkim geşe bike û belkî bibe zimanê fermî çendîn gel û netewe yên ku ne Erebin, ku ev jî tenê bi sedema olî pîroza Îslame ku zimanê Erebî karî xwe di çarçûvê zimanekê serkeftî û tamam de belav bike û geşe jî bikat. Yan belav bûna zimanê Îngilîzî yan Ferensî li başurê Efrîqa ku egerê serekî ya belav bûna wî ziman li wan navçe, bi taybet ku ple ya xwêndevanî ya nizme vedigerê wê yekî ku tebşîrî yên wan bangeşe bo olî Mesîhî ya dikin, pirtûka pîrozên olî ye wan bi zimanê netewe ya xwe belav dikin ku ev jî rê xweş kerêke bo wê yekî ku ew netewe fêr bibin zimanî jî fêr bibin.

Herweha zimanê Sensekrîtî ku yekem car ji aliyê Panînîve rêziman bo dana ye yekem car tenê ji ber parasitina olî û deqên olî Hindî nivîsî ye û pişt rê ku bi sedema belav bûna wî olî li hemî navçeyên Hîndistan de rû di belav bûnê kir û deqên wê jî bi zimanê Sensekrîtî nivîsî bûn, ev jî bûye sedema wê yekî ku zimanê Sensekrîtî geşêka tamam bi xweve bibîne ku ew jî bi sedema belav bûna olî bû ye.

Lewra rolê olî girîngî ya tamamê xwe heye û belkî em jî li kurdistanê bandora olî hind zave li ser me ku me nikarî ye je bo hinedik erkên olî pêvên kurdî dabnîn û di nihada li gor me ku ev peyvê kurdîne wek (heram, rojî, zekat,..... Hwd), û tevlî ferhenga zimanevanî kurdî bûn.

2.4.7 Sedma Teknolojî û Zanista Teknîkî

Îro mirovahî bi qonaxêka nû ya jiyanêda derbas dibe ku cudaekî zav heye di gel qunaxên pêştir bi curekê ku bê sedemên teknolojiya û pêşketina mirovên û berdewamiya jiyan ne rahet û gran dibe û tevlî hemî tiştên jiyan bû ye her di warên veguhastin û gehandinêda û heya warên

din mirov wek xwardin û bi hênvedan ...Hwd, hemî ev tişt di hember pêşkutina teknolojiê ê mirov qonaxeka nû bi xweve dibîne.

Di warê zimanvanî û geşe kirina zimanîda bi yek ji egerên serekî bo geşe kirina ziman ku teknolojiya qonaxeka nû ya mirovayetî û pêdivyeka serekî ya mirovî ye ji ber wê yekê ku ew zimanê bi kardînî di teknolojiêda ku dibêjn zimanê zansitî û ew neteweyên ku pleka pêşketî di warê teknolojiêde bilinde hertim pêkolê dikin ku zimanê xwe di wî warê de bikar bînin bo wê yekê li ser wî zimanî rabhîne. wekî em eşkire dibînin ku ev hemî mubayll û kumpûtetr û amîrên rojaneên van welatan da bikar dînin bêtiri ya bikar hênerên şewazê zimanî îngilîzî bikar dînin ku ev yek jî tû alîkarî dibe rêhêsankerêke bo zimanê îngilîzî bê heza wî gelî û netewên wî cure zimanî ku zimanê wan geşe bike û belav bibe.

Ev bwarê teknolojiê çendîn beşên girîng di jiyana cvakanda digre wekî bikar îna kompûter û mubayll û televizyon û amêrên dirûsit kirina xarnê û veguhastinê û... Hwd, ku her yek ji van bi komêk zimanewaniya şarave û remzî kar dike ku her yek ji van nhênî ya bi srûştî dibe parek ji zimanê bikar hênerên ku pêştir hebûna wan di nav gelande nebû, Lewra bandora pêşketna amêrên jiyana û teknolojiya û teknîkî di jiyana mirovayetî bi giştî û di warê zimanewanî ê bandorek berçav heye û alîkariya belav bûna van û geşe kirinê jî dide.

2.5 Mirna Ziman

Di sedê nozdehem û rola zanaên civakî û civaknasînê ziman bi taybet pêtiri ya wan ziman wekî hebûneka zindî bi nav dikin ku piştî derbas kirina qonaxên zarokî û têgehiştin û li ser binemaên egerîk yan kome hokarên berev nehîlan û neman biçe û zimanekî din cihê wê bigre vî derbarê bi guherîna ziman dihîte nav kirin ev guherîn kirine li ser wan

binemaên dêt ku welatên yek civak çend ziman li gor berjewendên yek zimanî desit ji zimanên din berde ku hinek caran bi merga ziman tê navkirin ev jî di demekêda bikardê ku ew lihce û ziman tenê wî civakî da hebûn hebe.

Hinek ji zanayan li cihê merga zimanî guherîna zimanî bikar dînin, ku li gor wan guherîna şewekî yan navê zimanekî bi dirêjahiya dîrok bi awayekî ku bi mirna zimanî tê navkirin û je bo mînak zimanê Latînî ku di îroda axaftin pê nahête kirin û bi zimanekê mirî jî tê hejmartin, çûnkî zimanê Ferensî û Îspanî û Îngilîzî bi awayekî nû yê zimanê Latînî xwe nîşan dide û tê hejmartin.

Merem ji mirna ziman ew guherîn nîne ku di demekê de li ser zimanekê dêt û zimanekê din ji awayê cuda bigre, belkî merem ji mirna ziman ewe ku bi rûdêkî neasayî û tengav ya rû bide û di encamda ew ziman bi tamamî ji nav biçe û winda bê.⁽¹⁰⁵⁾ di ferheniga giştîda merem ji mirna ziman ewe ku îdî xelk axaftin bi zimanek nekin û bi zimanê mrî tê nav kirin.

Îro di dînyade jimarêkî zêde ziman hene ku her zû ji nav diçin û berdewam ji nav diçin, li Rûsê zimana xelkê bakur û Sîbîrya di qonaxa ji nav çûnê nêzîke, pêtîriya zimanên gelên bakur û Sîbîrya di rewşeka pir xrabidane çûnkî peywendî di gel tu yek ji kome xêzana zimanên ve nîne.

Ji aliyekî din ve ziman di ferhenigên de bi mirnê na hête hejmar kirin, belkî bi zimanên kevin yan klasîk tînan nav kirinê. Wekî zimanê Latînî ku tenê di nava ruperên nivîsînê de maye û axaftin pê nahête kirin, Latînî û Grîkî û Erebî ya klasîk û Îbrî û Sensekrîtî ev zimanên ku çansa wan ji zimanên din zêdetre ku bi sedema nivîsîna van ziman ji sedsalên

⁽¹⁰⁵⁾ -Yhya Mdirsî, *Dramdî Bir Came Şnasî Zayan, Tihran Mose Mgalat û Tihqîqat Firhingî*, 1368, R90.

bikar înana wanda û heya niha mayne, lê ew zimanên ku tu cureka nivîsîn nîne û nivîsîn pê ne hatîye kirin bi mrî têne nav kirin û pêtir jî rû bi ruê jinavçûnê dibin. cureka din ji mirna ziman birîtî ye ji helmijîn û çûna nav zimaneka din wê raman ku zimanekî baladesit zimanê bindesitê win dike û zimanê bindesit bi tamamî jinav diçe.

Dibe mirna zimanan li gor rêjê be û buye bihêne pêvane kirin bi wê yekî ku hejmarek bikar înîna zimanekî werdigrîn ku dû corên ziman bikar dînin û pişt rê rêjeya yekem werdigrîn ku bi zimanê yekem di axvin û rêja wan jî ku bi zimanê düyem diaxvin, piştî guherîn kirinekê bo me dredikevê ku rêjeya bikar înîna wan dû zimanên gohurî ye bi raman wê yekî ku rêjeyek ji ziman tûşa mirnê bû ye, bi wê yekî ku bikar hênerên wî cor kêmbûne.

Komek eger hene ku wekî pêştir jî me bal kişande ser bo geşe kirina ziman bi heman awayî jî çendîn eger hene ku dibne sedema mrin û jinav çûna ziman. Ji ber wî komêk eger diyar dikin.

1. Bi sedema heza daye û babên xwe ku dixazin zarokên xwe kîjan ziman bielmin, wisa li niveên xwe dikin ku ew ziman wan hez dikin bielmin wekî wê ku li kurdistana bakur (turkya) rû dide ku pêtiriya kurdan zimanê dayk piştî guh xistiye û zimanê düyem ku turkî ye fêrbûne yan desit ji fêrbûna zimanê kurdî berdane ku komeka haletên hene bo vê yekî ku vêr cihê behs kirin nîne, ku hez bi xudan kirinê bandoreka zav li ser vî haletî he ye di nihada bi taybetî ev yek jî bûye ku zimanê kurdî bi rêjeyka berçav berev mirnê biçe.
2. Bela û karesat û zyanên zav ku berê xwe didine neteweyekê wekî hişksalî û nexoşî yên mirnî û şer û erdhej û birsyetî û burkanHwd, bi awayekî giştî dibine sedema kavi kirin û wêran bûna navçe ê û

guherînk bi ser hemî biwarinda dihêt û ziman jî beşdarê wan guherîn kirin û guherîn jî bi serda dit ku bi awayekî ji awayên egerê mirna ziman tê çaverê kirin, Ku di encamê wan diyarde ên rû didin ku piştî van karesatên dêne xarê ku awarê û derbederî ya gelî tûş dibe.

3. Sûd wergirtin ji qutabxane û fermangehên hikumîda wekî mînak li welatê Flîpîn piştî serxwe bûnê anku li sala 1972 xelkê zêdebarî bikar îna zimanê mîllî û neteweyên zimanê düyem anku (Tagalug) yan wekî zimanê düyem bikar dîna bi taybetî di warên perwerde yê û fêr kirina wê egerê bû sedema wê ku bi dilê xwe desit ji zimanê mîllî xwe bihîne û zimanê düyem anku tagalug bikine cihê wê zimanê netewey wek zimanê yekem tê hejmartin, ku ev yek jî Arîşe bo komeka wan hoza û qebîla dirûsit kiriye ku zimanê tagalug nzanin û rû birûy arîşa bûn.
4. Egerê sîyasî ku her zimanek di berjewendi ya rêve birina sîyaseta wan mîletanda be peyrew dike û desit ji zimanên din berdin ev yek jî li mîllet û zimanê Îsraîl de dibinîn ku bi heza Emrîka û Îsraîlê li ser belav bûna zimanê Îbir ye, bi wê yekî jî zimanên din ku li Îsraîlde hene bi sedema heman sîyaseta wan welatên rû bi ruê ji navçûnê bûne û ji nav diçin.
5. Egera teknelojî û geşe ya abûrî û pêşketina pîşeyan ev yek jî bûye sedema ewe ku bajêrekî pîşesazî corêk ziman zalbe bi ser zimanê asaî û rû bi rû zeafbûn û winbûn dibîtewe⁽¹⁰⁶⁾.

Komeka egerên din hene wekî egerên serbazî û civakî û olî û abûrî, ku her yek ji van ji aliyekî rolê xwe dibîne ji mirna ziman û jinavçûnê, Lewra di dawî yê de bi mrî tê hejmartin her çewa be nav înana mirnê bu

⁽¹⁰⁶⁾ -Alî Mhimd Hiq Şnas, Şar û Zad û Mirg Zibanha, *Mqalatî Adebî û Ziban Şnasî*, Tihran, Weş Nîlufir 1370, R140.

zimanî cure xerîbî têdahene çûnkî qonaxa mirna zimanî bi awayê mirna her candarêkî nîne.

Girîngî û Pîtedana Ziman

Ziman di sadetrîn raveda yek ji kirestên klîlîyên binyatnana grûpên mirovayetî û dirûsit kirîye ko peywendî gişt peywendyên, vî rûy hemî civakîk û pêkolê dike perwerdeya zaruwên xwe ji berçavgirtina zimanê civakî araste bike, anku hemî mirovayetî birewam pêkolê dike sîyaseta zimanî bikin û zimanê xwe biparêzin û ast û pleya zimanê xwe bilind bikin vê awayî jî netewe binemaên netewe bûna xwe li ser binemaên zimanekî binyat binît, ku tenê senter bûna ziman dibe binyat binînîn, babetê giringiya ziman yekêke ji babetên giştî ku berewam cihê şîrove û zimannasan bûne.

Ziman amrazêke ku li jiyana civakîda hatiye taybet kirin bi mirovîve yan bi awayekî din dikarin bêjîn ziman taybetmendye ku tak ji tamam bûna proseên jiyana giştîde bikarê mirovên bi gutûbêjn hevdû fehim dikan û tamam karê jiyana mirovayetî ye bi sedema ziman ji niveyekî ji bu niveyekî din û dahatî veguhazê û eger ziman di civata mirovayetî de cuda bikên dewrana civakî wê radiwiste. hendê caran ziman wekî sermayeka ferhengî tê navkirin demê bidesit hatin û geşekirin û berferh bûna kultûr û ferheniga civakêk tê behs kirin ewe ziman ku raburî û dahatî û nihaya wê civatê bi hevra grê dide.

Babetê ziman û giringiya ziman û peywendî di gel heqîqet û hizir kirinêda yek ji babetên serekyên ku berewam ji aliyê feylesufên di hemî serdemên cudaên dîroka felsefîda cihê hizir kirin û nêrînên bû ye, wî demî mirov xwe wekî bûnewerêkî hizirker nas kirî bî corêk ji gelî vî babetîda peywendî bi hevra bûnê heye, ku bi rastî peywendî ya ziman di

gel heqîqet û rastî de çîye? Aya bi rastî ji dereve ê ziman dikarin bigehîne heqîqet û dikarin hizir bikin?

Hîraklîtus feylesufê yewnanî yekem kes bû ku berisva vê pirsê dide, Hîraklîtus di heqîqeteka bi navê (Logos) ve axaftin kir ku hem rêk bûn di de cîhanê û hem jî dîne nav fikir û xeyalê, ji aliyê Hîraklîtus ziman helgirê heqîqeta hemî hebûne yan ew axaftina Suqrat derbarê giringiya zimanî dibêje: (axaftin bê fikir û fikra bê axaftin jî hebûn nîne).⁽¹⁰⁷⁾

Paol Sîmpsun zimannas di despêka pertûka(ziman aydolojya û rawange) di mînakêkîde hûrkarî û girîngî û bayexa ziman û bikar anîna ziman pêvane dike ser nîgar kêşan, demê di mînakêkîde behsa wan her sê nîgar kêş dike ku divyan wêney paşa ê çêkin ku cihê razî bûna paşa bît, yekem serkuffî nebû û dûyem jî bi heman away û piştir a sîyem nîgar kêş dikarî serinca paşa rakêşe û xeleta her dû nîgar kêşên pêş xwe dûbare neke û paşa bi wêne ê xwe razî kir.

Sîmpsun dibêje ku çewa huner dikare bi wî awayî bikar bît ku cihê rezamendî be, spî û reş li cihên xwe danin, bi heman awa ziman jî bikar înan heye û dikare bi wî awayî bikar bît ku axaftinkirek divê encam bide, di gûtnên baş û nebaşda beşdare, wî demî meydana kar kirina zimanî dibête meydana nasandina kesayetî û şîyana kesên di warê jiyan bide û anku diyar kirina kesayetî ya civakî jî diyar dike. herçende di rwangeha nezerî û atîfî û rewşa mirovî a ziman wekî yekin û yeksane, ta wî demî ku nûgerî rû li zimanê dike bi sedema pêşketina civakî wê yeksanî ya wek yek girîng hebûna wan cuda bû û hendî bi lezatî û hendîk jî bi hêdyatî girîngî û hebûna xwe disilmîne.

⁽¹⁰⁷⁾ -Befraw Nûrî Sayetî Xelk,Mqale, Wwiw.Xelk.Org.

Lewra ziman wesîle ya guherîna hizir û fikir û havdem jî yek ji klîlên befreh bûna zihna mirove, di gel wê yekê jî ku ziman girîngtirîn pêvera nasandin û bawer kirin ye, lê egerên din jî hene bo bjartin û cûda kirina wan nas kirin, dibe ku ziman di binyat dana welatekê nû ya de kum bibît û di heman dem jî de yek ziman egerê dawayê nîne je bu binayt nana dewlet çunkî Sirb û Kirwat û Bosne yek ziman hene, lê dewletên wan cudane ku çendîn eger hene wekî cudayî berjewendî ya millî û mezhebî û olî... hwd.

Demê welatê Franse ji împoraryeta mesîha cuda bû divê li ser çî binemayeka pêname ya xelkê welatê Ferensa bikin bi taybetî demê Papyê xelkê wî welatî ji împoraryetê dûrxist, lewra tenê tişteke hevbeş kir ku xelkê frinsa di çarçûvê yek dewlet de kom kirî ew jî hebûna zimaneka hev beş bû ku karîn xwe di çarçûvê dewleta Frensa rêk bixin û zimanê Frinsî bikine alîkarê pêk hatin û kom kirina dewlet. ziman amrazêke je bo nasandin û aşna kirina fikrên mirov û tû rolekê di binyat nana fikrên mirovî de nîne û bîr û nêrînîn mirov û pîroz û nasnama mirovî nîşan dide.

Zimanî rolekê wisa nîne di dirûsit bûn û binyat nana pêname ya kesî û qewmî, bo mînak ew kes bi zimanê Îngilîzî di axive merc nîne Îngilîz bî yan Ereba yan Fars bî çunkî rêja wan kesên ku xelkê welatê Îngilîzin û bi nive ê wan Berîtanîne cudandin ji wê rêjeya ku li dînyada bi zimanê Îngilîzî di axvin lewra ziman bi mezintirîn û berêztirîn hunerên mirovî tê hejmartin û her kultur û ferhenigekî xudî zimanekê taybet bi her takêkî, ezmûn û xeyal û hesit û bidest hatît di navbera hevdûda di guherin bi awayekî giştî ziman amrazeke bo fêr kirin û fêr bûna merema her takikî.

Fêrbûna ziman û giringî ya ziman di salên destpêka jiyande desit pê kir û bi xwêndina babetên cuda berev lutke ên pêşketî çûye û ev pêşketin rolekî bandor di pêgehandin û mezin bûna eql û zêhna mirov de heye.

2.6 Roll û Erkên Ziman

Ziman amrazêke di çendîn hêmayn pêk hatiye ku di xizmeta her komeka ji komên mirovî wekî her amrazekî din çendîn erk û rolê taybet digrê, bi ramaneka zelaltir ziman erkêk yan çendîn erk hene, herwekî wê yekî ku gwh û çav û difnê erkên taybet hene û (azad hat kuşt, azad kuşt) azad dû rol biker û berkar dibîne û ev erk jî bi awayê cuda tîne encam dan û pleya girîngî yê jî cuda ye û bi awayekî asayî rolekî serekî heye û çendîn rolên lawekî. Ji aliyekî din ve biwarêk ku egera bikar înan û sûd wergirtin û encam heye cudaye di gel rolekê wekî hebûna seqfa ser derincka ku amade karin yan ragirtina derincka yan bo dirûsit kirina sêber bi kar dît û sûdên di wergirtin û encamên wê ji rolê serekî ya siqffî de cudaye û çendîn rolên lawekî dibîne.

Vî awaye ziman jî ku rolê serekî birîtî ye ji şîrove kirina xeyalên û nivîsîn û veguhastinê bo beramber, yan jî bo veşartin û dernexistna rastên bikar bît anku bo drew kirinê dikare ji zimanî sûd werbigrin, lê nikarîn bêjîn ku drew kirin pareku ji erkê zimanî.⁽¹⁰⁸⁾ Di navbera ziman nasandin û lojîkçên derbarê erk û rolê ziman ve çendîn cudayî hene û ji rûy hejmar jî yek nînin li ser hejmarê erk û rolê ziman ku di navberê deh je bo bîsit erkan diyar kiriye ji erkên serekî ku vêrî çendîn erkên serekî diyar dikin.

⁽¹⁰⁸⁾ - D.Mihdî Baqrî, *Miqdmat Ziban Şnasî*, R 56.

Bi awayekî gişitî ziman wekî wesîleyek ye je bo dirûsit kirina peywendî di nav bera kesên de here serekîtrîn rol dibîne û erkên din jî şîrove kiriye, xeyal û derxistn û nav înan û diyar kirina tiştêkî bi tiştêka din amade kiriye, eger ev erkên zimane lê serekîtrîn erk tenê ewe ku je bo peywendî kirinê di navbera takên de bikar bît, ev erk jî hevdem bi hevra grêdane.

2.6.1 Roll û Erkê Peywendî Kirina Ziman

Girîngitirîn û serekîtrîn rolê ziman brîtî ye ji peywendî ya wî demî ku peyamêkî alogor dike, her çend tenê ziman nîne je bo alugorên peyamên mirov, çunkî di desit pêka qonaxên jiyana mirovayetî ziman bi wî away nebû ye ku alogor û peywendî di navbera takên dirûsit kirî bît, bigre egerên din wekî hewar kirin, desit qutan û rûnahî... hwd. Je cihê ziman ew role dîtine.

Derbarê îro ya ziman ve dibe têbînî ya wê yekê bikin ku pêtiriya demê ev peywendî di navbera dû kes û desitde di yek dem de rû nedit belkî eger heye ku ji niveyekî je bu niveyekî din û di qonaxeka cuda de ew peywendî dirûsit be ku bi herdû rengan ew peywendî dirûsit dibe hem bi awayê nivîsî li ser ber û pêsit û daran hertim bi awayekî zarekî û di encamê vegohastinê ji niveyekî je bu niveyekî din dirûsit dibe. Dibe ev yek jî bîte zanîn ku fam kirina henek babetan li ser binemaên ziman cudne, wê hind alozî û ne rhetî têdanin lê tû babetek nîne di ziman de ku hejî famkirin û têgehiştinê nebe. Eger haletekê husa di zimanekê de rûbide ew ji kîm û kurî û şyana ziman nîne belkî ji bikar hênerên wî ziman dane, bo mînak ew gelên ku şyana niyasîna şerab nîne di demê wergêrana pertûka Încîlîde şyana famkirin pirtûkên jî nabe û je bo wan jî pîroz nabe û di gel wê yekî jî bi vî halitê dan belkî dikare şîroveyn zêdetir bo bîte kirin bu wê yekî ku peywendyên ziman dirûsit bibe û

fehim kirin sanehê be.⁽¹⁰⁹⁾ Lewra girîngitrîn û dergehê û erkên ziman birîtiye ji dirûsit kirina peywendiyên, demê ku welatên civakêk peywendî dirûsit dikin dû armanc hene:

- A. veguhestina zanyarî bo hev dû.
- B. Dirûsit kirina hev zimanî û hevdilî di navbera hevdû.

wan armanc bi mînakêkî diyar dikin:

- Îro subehê xebera nexoşya hevalêkî xew bihsît ____ vegohastina nûçekî.
- Belê! Rastî aliyê te bî lê çarekî nîne _____ hesta hevdî.

1. ZIMAN WEKÎ ÇAVKANÎ GİRNA HİZR Û ENDÊŞE.

Ziman zêdebarê wê yekî ku di dirûsit kirina peywendî de rolêka here serekî dişupîne, amarazêk jî ji bo bîr kirineka mentîqî (lojîk) ye. eger çalakên zihnî mirov di çarçûvê ziman encam nebe cihê guman kirinê ye ku bi xeyal tê nav kirin, çunkî demê mirov tenê hizir dike û hizir kirin jî ji çalakî ya zihnê mirove di çarçûvê ziman bi hem dibe her ji ber vê yekî jî ku gelek ji zimannasên bi cihê cavkanî girtna hizr û xeyal daniye.⁽¹¹⁰⁾

Ev waqîyet gelek ji ziman nasên berev wê yekî rakêşane ku li gor wan xeyal bi rîya zimanî ve digehe mirov, anku yasa ya ziman ku yasa ê hizir kirinê dir dîxit û her ji ber vê eger jî bûye ku Ywnananên ramana (derbirîn)(nitq) û eqil(lojîk) yan bi yek peyv derbiriye, ku ew jî

⁽¹⁰⁹⁾ - Abwalhsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şnasî*, R36.

⁽¹¹⁰⁾ - D.Mihîrî Baqrî, *Miqdmat Ziban Şnasî*, R57.

(LOGOS).⁽¹¹¹⁾ Ev zelal û eşkire ewe ku bê ziman nikarîn bigehine hizir û xeyalê. Dû xalên girîng di wî bwarê de hene:

- Xeyal bê ramana giştî û ramana taybetî tû hebû yekî nabê.
- Ev ramana giştî û taybet di rêya ziman desit ber dibe.⁽¹¹²⁾
Vê qonaxa wisa zelal di kin.
- Zarok mezin dibe ___ li ser binemên ziman dikarin nûçekî vê wrarê de fehim bikin.
- Zevî hesareke _ di rêya zimanve dikarin rastî û ne rastî ya wê nûçe bizanîn.

2.6.2 Derbirîn bê Guhgarêk (Gutûbêj Kirinê di Gel Xwe)

Ev rolê ziman demekî eşkire dibe ku kesîk merema dirûsit kirina peywendî û têgehandin nebe, belkî bo derbirîna hestê xwe û rewşa sozên xwe axaftinê bike û merema serekî labirina perdê bît ji dinya ya derûniya xwe û tû cure karvedan û berhem û şîrove û axaftinên kesên din dev wî girîng nebe. Wekî wê ku li bazarî yan li cihekî de henid car hinek kesên dibînîn ji berê xweve diaxve yan jî bi xweve şîer dibêje, henek ji zimannasên evên gelek biaxivin di vê çarçûvêda têne hejmartin.

berhemên şair û nivîser û çîrok nivîs û dastan nivîsên ku di bêjn di vê çarçûvêda têne hejmartin, ji ber vê eger jî bi axaftin di gel xwe bi nav û dengin, lê ji ber wê yekî ku rolê serekî ê ziman brîtiye di peywendî ya di navbera kesên û hemî li ser vî babet rêkkeftîne. Divê ew kes bîne neçar kirin ku di rîya peywendî kirinê de bi kesên din ev babet û gutûbêjê ku dinaxdane bidne guhdarên.

⁽¹¹¹⁾ - Abwalhsin Nicfî ,*Mbanî Ziban Şnasî*,R37.

⁽¹¹²⁾ - Fatme Şîrzade,Mirkiz Yagîrî ,Sayt Tibyan.Www.Tibyan.Com

Divê ew yek jî bîte gûtin eger hat ziman berdewam ji revrevê rol bibîne û bikar hatbê bi egera nebûna guhdarî, gelek blez ziman da ru bi rûê vekîşan û paşkeftinê bî. Ji bilî bo xwdiyê axaftin kerî ramaneka diyarî krî nebî. Taybetmendî jî ji kesêkî je bo kesên din de cuda be. Ji ber wê pêdevîye hebûna peywendî di gel kesên din di heman demda parêzerê kar kirina zimane û ev role alîkariya mirov dike ku ev di nav kirokê xudaye di warê da bi axvê û derbibre, lewra bi yek ji erkên giringiya ziman tê hejmartin.

2.6.3 Erka Dirûsit Kirina Ciwan di Gutnê de (Gutnêka Ciwan)

Ev erkê ziman dikarin bi erkê hunerî navdêr bikin ku ziman wekî amrazêk je bo dirûsit kirina ciwany sûd wergirtiye, pêtiriya peywendên ziman û gehandina peyamên li gur berçav girtna van erkê tene encam dan, Lê hinek caran axaftinkar cuda bu bandor bûna zêdetir a gutnên hewarê bu derbirîna ciwanî û nasikî û pir raman û rêkixistî dibe ku li gur komeka egerên wekî pley kesayetî û cihî erk û xwenîşandan zêdetir vî erkê ziman cî bi cî dike û axaftin bi şewazêkê goranî û muzîk dibêje hinek caran ji rûê ramanêve gelêk jî bi hêzin û dibe ew jî bîte têbînî kirin ku tenê ji rûê dervê ciwan dikan.

1- Rola Bingehî

Ev rolê ziman bi awayekî giştî di gel rolên din bi hevra grêdane bi awayekî ku cûda kirin ji hev dû pir zehmete, ji bilî hinek caran ji ber mermên taybet ku axaftinkar ji ber derbirîna ciwaniya axaftina xwe hember guhdarên dirdibre ku ev yek jî zêdetir di zamanê edebîda ev erkê gelêk bi eşkire dibînin ji wezin û qafiyên şîer û rêkxistina pexşan û mûzîk û dastande rolê sereki dişupîne ku ziman wekî yek ji dest pêktirîn

ciwanî sûd jî tê wergirtin. Lewra ev erkê ziman ji dirûsit kirin û ciwan kirina hemî berhemên edebîde rolê yekema here serekî vedigerê ji pêdana hebûna berhemanda.

2- Rola Lawekî

Zêdebarî wan erkên serekî ku me gut, çendîn zanyarên din di pal wan erkan dane, bu mînak di axaftinêda her takêkî dikarê wê yekê bike û wan zanyari ya bi desit bixe ku axaftinkar cihêle yan pîre yan cinsîyet û cih û plên wî.... Hwd, anku di demê guhlêbûna nûçekêda dikarê pley axaftinkar di hemî biewarên de diyar bik bi rêjekî zav lewra serekên ziman alîkariya wê yekî didin di demê axaftin kirinê de (peywendî) kesayeti û rolên lawekî bîne nas kirin û derxestin. Lewra rolên lawekî bi rolekê serekî girê da ye ku pêştir me behsa wî yekî kiri bû.

2.7 Ziman û Bîr û Hizir

Ev yekî ku bixazê derbarê peywendiya ziman û xeyal û hizir (THOUGHT) û (LANGUAGE) şîrove bike rû bi rûê komeka babetên felsefî dibe, li gur hinek felsefe ku xandineka temam derbarê ziman bikin em ji têgehiştina babetî dirûsit kirina xeyalê û çavdêrî kirinê alîkarî bike, hinekî din jî di gel wan ku ziman qudîkeka serdabirniye cîhane bo desit keftina derave ya jîyanê fîzîkî, bi wê raman ku komeka pirsin derbarê çewaniya hebûna dîniya yê me çî derbarê wê hebûna dizanin, şyana peywendî dana felsefe bi zimanê mirov ve ji awayê girtna arezûya feylesufên ferahem dike ku çendîn caran ew yek hatiye tekuz kirin ku egerê cûda bûna mirov ji candarên dî ve bîr kirina hizrye.⁽¹¹³⁾

⁽¹¹³⁾ - Ekur, Thought And Language, *Philosophical Aspects In Philosophy of Language And Linguistics*, Ed . Alex Barber And Robert.J. Stain Ton 747,2010.

Ji girîngitrîn wan pirsan ku peywendî di navbera ziman û hizir bi hevra grê dide didû pirsên girîng diyar dikin:

- yek : eve ku rêjeka diyarîkrî ji xeyalye li ser ziman yan ziman li ser xeyall û hizir şîrove kiriye, bi wê yekî ku nêrînên tak li ser handana xeyallê li ser zimanî yan ziman li ser hizir û bîr û nêrîne?
- didû: hevbeşêka diyar krî di navbera hizir û nêrîna zimanê çêbît? Wî demî ku me divê bîr bikin gutûbêj bikin di navbera wê peywendiya dirûsit krî di navbera tiştan bîr bikin û der bibrînin.

Lewra ziman diyardeka bi hevra piçrî û aloze û ji girîngitrîn şyanîn mirovên tê hejmartin ku bi mezintirîn û baştirîn sîstemê peywendî kirin di navbera hevdû de tê hejmartin. Bi awayekî sade ziman egereke ji bo şîrove kirina hizir û bîr pêkhatiye, destipêkê hizir û xeyall birîtiye ji ramanê û her ramanek jî ku bi ser komeka tiştan ve taybet kiriye ji desitêka taybet tê hejmartin. Wekî mînak (kotir, dayk, mêz,) Her yek ji van ramanek hene û bi ser komeka tiştên taybetê fîzîkiya dinya yê taybet kiriye. Raman bandoreka zav li ser jiyana mirovayetî danaye, bi wê ku di rêya dabeş kirina cîhanê yek cudaî û diyarên dibe sedema wê yekî ku pêkol û mandû bûnên bo nasîna ramanên kêmtir bibi, bi alîkariya ramanên dikarît gelêk arîşe û udaiya nêrînên li ser rastî û dirûsitî ya babetê bidit, wekî mînak cudaiya navê (hewir,kursî) di rêya ramanê dihête zanîn.

Raman jî di çarçûvê guzarên dihêne dîyar bûn, guzare jî risteyeke ku yasayekî derbarê waqeve derdixe, em bi sedema zimanve dikarin raman je bo veguheştina bîr û nêrînên me di çarçûvê guzarede sûd jî wergirîn.⁽¹¹⁴⁾ Dikarin dû rû je bo ziman diyar bikin:

⁽¹¹⁴⁾ - Himze Gincî ,*Rwan Şnasî Emumî* ,Tihiran,Danişgahê Pyam Nûr, Çap Hiftim,1370,R73.

- Berhema ziman, peyda bûna xeyaleka guzare yî dest pêdike û pişt rê bi awayekî riste dirdikive û di encamê dê di çarçûvê dangan tê şîrove kirin.
- Têgehiştina ziman, bi guhdariya dengên desit pê dike ku me di çarçûvê peyvan de ramanên jê dertixin û bi tevlihev bûnê riste dirûsit dikin û awayekî jî van ristan dguhurîn bi guzare.

Ev taybetmendên ziman giringiya ziman ji beşên cuda derdîxe, li gur hemî zimannasên wekî (Binyamîn lî wrif, Adward Sabîr) ku ziman hizr û nêrîna pêk dihîne û ji şîrove kirin jî ziman ji çend zemînên cuda de şîrove dikin û ev vekulîn bu sedema wê yekî ku zimana taybetiya her kesêk û ferhengêk ku pê perwerde bûye ne tenê li ser wî awayî ku li ser perwerde bûne ku li cîhanê têdgehîn.⁽¹¹⁵⁾ Kaydûyçir di rojnama (hrald trîbîwn) di babetêkîda dinivîse ku aya zimanê wê çewa hizr û nêrîna dirûsit diku? Şîroveyên van çend salên dawyê wê yekî nîşan dide ku demê em zimanê deyk fêr dibîn di gel wê jî kirdarên hizrên diyarî krî jî fêr dibîn, vekolîn wê yekî diyar dikin ku her zimanêk bi sedema pêk hatiyekî taybet ku heye, axêverên xwe neçar dike ji alê xweve çarçûvekê diyarî krî helbijêrn, je bo mînakê demê bi Îngilîzî dibêjî (yek bûm ji cîranên). Vêrî ew rixset daye ku regez ne hête diyarî kirin ku ew cîrane nêr bûye yan mê. Lê eger kesêk heman riste bi Elmanî yan Ferensî yan Kirmancî û Hewramî û Erebî bibêje wî demî tê neçar kirin regez diyar bike lewra dihête gûtin ku ziman di çarçûvekî diyarî krîda bo derbirîne rol dibîne. Yan jî berçavgirtina demî bo mînak di zimanê Kurdî de demê rûdana karêkî tê diyarî kirin wekî xarna spêde ku demê wê diyarî kiriye lê di zimanekê wekî zimanê Çînî vî awayê nîne je bo hemî demên yek cur kar bi kar dînin.

⁽¹¹⁵⁾ - Birk ,Luray ,Rwan Şnasî, Rişd, *Yhya Sîd Mhimdî* ,Tihran, Weş Arisbaran ,Nubt Charm,1384,R34.

Ev diyar kirina çarçuve ji desit pêka temenê mirovî desit pê dike û bandor li ser çewaniya bîr kirin û hesit û hizr jî dibe. ev vekolînên zimannasî wê yekî dibêjine me ku bandora ziman li ser fikir û xeyall (hizir û nêrîna) gelek ji wê yekî zêdetire ku ev hesit pê dikin û ev adet û ferheng ku em her ji temenê zarokî wekî krasekê ber xwe dikin ji dirûsit kirina bawerîn û bayex û aydolojiya me bandoreka zav dibe.

2.8 Guherîna Ziman

Bi awayeka giştî guherîna zimanek hevdeme di gel guherîna pêdavên civakî ku ji wî ziman wekê amrazê peywendî di navbera hevdûde sîd wergirtîne, guherîn kirin û pêdavên her civakêkî jî girê daye bi guherîn kirina menewî û siyasî û abûrî û civakî. li vî aliye de peyvên her zimanekî zêde ji hemî tiştên din dikarin lvîna guherînan bîn. Nêrînen me di ferhengên peyvan ew yek bu me zelal dibe ku hendek peyv di demekî diyar kirîda bu meremeka diyarî krî bikar hatiye her çende niha bo zêdetir ji wê meremî bikar dihên yan jî li ser demê pêştirda hebûn û nebûn û niha di gel pêşketina mirovayetî ew peyvên nû peyda bûne ku rengvedan li ser guherîn kirina ziman dibe.

Egerên wan gohwoyin kirina zavin ku zimanek di qunaxeka dîrokî bi awayekî bûye di qonaxên din da awayê wî goheriye yan jî çend awayên cuda berhem hatine, hemî ziman wekî yek û di yek demîda nagoherin, her ji ber vê jî ku zimanên Kurdî û Farsî û Hîndî û Îngilîzî û Elmanî û Ermenî...hwd. ji yek cavkanî anku Hîndî Ewropî caVkanî vegirtîye, ji ber wê yekî bi dirêjahiya dîroka xwe mîtod û aliyên cudayên xwe derbaz kiriye ketine jêr bandorê egerin cudên guherandin ku her yek di gel hev dû cudane û her yekî jî taybetmendiya diyarî krê xwe hene. Didû egerên serekî di guherîna ziman de bandorê dibînin :

➤ Egera dereve

Ji ber wê yekî ku ziman waqekî civakî heye û je bo dirûsit kirina peywendên di navbera civakanda bikardên, bê guman egerê civakî di guherîna ziman de rolêka serekî dişupîne, ew guherîn ku wekî guherîna olî û siyasî û abûrî û rewşenbîrî û ta endazeyek zav di guherîna zimanîda rol dişupînin wekî mînak hatna olîya pîrozê Îslam je bo navçeyên Kurdistanê komeka zav guherîn di zimanê Kurdî de bi dûr xwe anî û komeka peyvan nû ku berê nebûn hatine nav zimanê Kurdî.

➤ Egera nave xwe

Yek din ji egerên herî bi bandor di guherîna ziman de birîtiye ji kurt birî yan jî temeliya mirov di himber bîrde, di heman demda bi yek ji beşên rewan bêjî tê hejmartin. Bo mînak di zimanê Îngilîzîda peyva (I'm) gelek hêsantre ji (I am) bikar dît û di zimanê Kurdî jî bi heman away bi taybetî di demê gutû bêjan da pêtiriya kurt birî û labirina hinek fonîm bi taybetî di dawî ya karande bikar dên wekî mînak navê Mmhimd – Hime, û Îsmâil – Sime, û Îbrahîm – Ble... Hwd. Der dikevin yan jî di karên, dehêm – dîm û debêt – debe. Ev guherîn jî di navçeyên cografîda cudandin bi taybet je bo zimana kurdî ku heya niha mexabin xwediyê yek cure zimanê standar û nafxwey nîne ev yek jî bandora guherîna li ser guherîna ziman bi taybetî zimanê Kurdî zêdetre.

Demê ku guherîn ru di zimanekî dike eger hene henek deng dirêj yan kurt bikin û belkî bandor li ser guherîna civak hebe ew guherîn ku ji sedsalê çarê de rû bi rûy zaman Siwşdî bû ew jî labirina dengê (P) dawîy ji peyvên weku (VER) dar û (HUND) seg (BLAD) gella, bû. Di vekolîneka nû de li bajarê Stukhulm nîşan dide ku îro bi berawrid di gel pêncî salên berê de guherîna ziman gelêk cudaye û kêmtir deng tene

ladan (hezf), ku ji ber zêde bûna xwêndewarî û bilind bûna pleya xwêndewarî vedigere, guherîn kirin bi berovajî qonaxên pêştir axaftinên xwe werdigêrn.⁽¹¹⁶⁾

Lewra guherîna ziman bi yek ji xalên cewherî pêşketina ziman tê hejmartin û bi qonaxa tevlihev bûna ziman û ji hev nêzk bûn û bi corêk ji curên jî hêsantir bûnin jî di zanîn, herçend paraw bûna hinek ziman tuşê arîşe hatiye lê pêşketina mirov di warê jiyanê de nikare rê di wê waqîe bigrê, je bo qebûl nekirina wan guherîn ku rû di hemî zimanên de kiriye, lewra jî ji didû aliyve girînge hem je aliyê aşna bûn di gel zimanên derve yê cîhana xwe û hem jî ji aliye geran bi dûr peyvan de.

2.9 Dabeşî û Didûbûna Ziman

Destgehê ziman komeka eger û nîşanên rêk û pêk û rêkixrave ku li gor yasa û rêkxistinêka taybet û yek bi dîv yek dên, lê ev pênase je bo diyar kirina ziman ji desitgehên dinin peywendî kirin bes nîne çunkî hinek ji amrazên dinên peywendî di vê pênasê de hevbeşin, wek mînak ew peyamên ku bi tepill yan aseaf û yan amajên ker û lalin de û belkî hinek awazên gehandinê peyamên canewerên û semaya mêşheng.... Hwd, hemî ev kome nîşanên ku li ser yek hêl têne hejmartin, lewra divê taybetmendiyeka dinê ziman hebe ku beşên dinên peywendî kirin li vî bêbeş nebin.⁽¹¹⁷⁾

Eger têbînya çend egerên peywendî bikin cudaîyekî bingehî di navbera ziman û egerên din dibînîn ku ew jî ew peyamên ku di rêya zimanve têne belav kirin di komeka riste bi hevra grê daiy û di çendîn beşên biçuktir pêk dihên di vî rûy risteyek şyana dabeş bûnê heye bo

⁽¹¹⁶⁾ - Cîn Açsun, Wer. Mihmud Alyasî, *Micle Pjuşî Danişge Tnirbît Muelim Sbizwar, Şmare Awl*, 1370 R46.

⁽¹¹⁷⁾ - Rabrit Larnis Trisk, Wer. Alî Famyân, *Mbanî Ziban*, Antişarat Mirkiz Tihran. 1379, R150.

biçuktirîn beş, helbet dikarîn beşêk ji egerên jî dabeşa çendin beşên bikîn, lê cudaiya mezinê ziman di gel wan egerên eveye ku dabeş kirinê peyamîk binema û yasaya dabeş bûna wan diyariye û ev peyam jî dabeşê biçuktirîn beşa watadar dibe, wekî mînak di peyama (ez birçîme) dabeş dibe ser sê yeke(ez-birçî-me)ev jî di dirûsit kirina çendîn risteyên din bikar dên.⁽¹¹⁸⁾

Di demekî de je bo dabeş kirina beşên dinên peywendî kirin û egerên din ew yasa ya bingehî nîne ku li ziman de hene. îro sînor û çendiyetî ya dabeşî ya ziman diyar nekiriye û dikarîn her carêkî bi awayekî din dabeş bikin, û xudî pênaseka diyarî krî nîne heya ku bi heman dabeş kirin di peyamên dinda bîne bikar anîn.

Yekêk din ji taybetendiya ziman ewe ku peyamên zimanî dû caran şiyar hene bîne dabeş kirin, bi wê raman ku yekem bi desit hatnên ziman di dabeş kirina hevra xudî raman û pênaseyên diyarî kiryên xwene û her yek bi hevra ji komêka denigên pêk hatîne, li ser vê binema dikarî wan jî dabeşê çendîn beşan bîne kirin, di riste ya (ez birçîme) di dabeş kirina yekem de bi ser sê yekeda me dabeş kir, ew sê yekî jî dabeşê biçuktirîn beş tîne kirin ku no beşe ku (mi + bizrok + ni + bi + bizrok + ri + si + î + mi). Dabeş kirina yekuma ziman tê nav kirin û ew yek jî ku bidesit hatiye dabeş kirina yekema ziman tê navkirin û ew yeke jî ku bidesit hatîne dibêjnî morfîm, nabe morfîm di gel peyvên tevlîhev bibin çunkî hinek caran ku morfîmek pêk hatbe wekî(dibêjm,dikim....Hwd). Dabeş kirina morfîm jî bi ramana dabeş kirina biçuktirîn yekeya watadarên zimane je bu dangan, dabeş kirina didûyema ziman tê nav kirin, beşê bi dasit hatîn jî vê dabeş kirinê de bi desit dên dibêjn fonîm.⁽¹¹⁹⁾

⁽¹¹⁸⁾ - Abwalhsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şnasî*, R29.

⁽¹¹⁹⁾ - D.Mihdî Baqrî, *Miqdmat Ziban Şnasî*, R45.

Fonîm bi tenê xudî raman nînin, lê cûda kirina ramana anku ji didû fonîma wek yekde, yek fonîm dikare cudaya ramanê derûsit bike, wekî:

Dar	keş
Bar	geş
Kar	
şîr	tîr

Lewra fonîm rolê serekî di derûsit kirina ramana morfîmên digre, her çend bi tenê xudî ramana serbexwe nîne, lê cuday ramanê dirûsit dîke. Hejmara fonîm jî bi awayekî asayî di navbera 20 – 40 fonêmîn û dibe ew jî bîhête gûtin ku fonêmên hemî zimanên wekî hev nîne û ji zimanek je bo zimaneka din cudane.

Ev dabeş bûna ziman bi desit hatna sîstemê zimanî yan jî yasayên ziman zelaltir dike, çunkî piştê vê dabeş kirin bi taybet dabeş bûna ziman ji bo beşên fonîm, me dikarin hejmareka zav fonîm nas bikin ku binemên her zimanekî li ser vî beşê tê binyat dan, bi hevra bûna vî beşê biçûk beşek mezin derûsit dibin û komêka zav risteyên bê hejmar dirûsit dibin.

Andir Martîne zimannasê qonaxa nû ya dabeş kirina ziman bi taybetmendiya here serekî û destpêkî û cûda kirina taybetiya zimanê mirovî dizanît, çunku tu amraz û egerek dinên peywendî nîne ku didû caran dabeş bibi.⁽¹²⁰⁾

Dibe vêrê pirsêk dirûsit bibe ku je bo çî li cihê fonîmên raste û rast peyv bikar înaîn û sudê fonîmên çî ye? Bo çî pêkola dîtna wan hatiye dan û boçî bo her ramanekî yan nîşanek ne hati ye danan?

Van pirs bi mînakêkî zelal kên:

⁽¹²⁰⁾ - Rabrit Larnis Trisk, Wer. Alî Famyân, *Mbanî Ziban*, Antişarat Mirkiz Tihran, 1379, R151.

Ew ezmûnên ku di qotabxanên de hene bo fêr kirina xwênd karên ji xwêndin û nivîsîn demê komeka qutabiya dikin didû desite û desitê yekem wekî vê rengî normal fêrê dangan dibin ku ji (alf ta ya) di zimanê kurdîde, desitê didûyem raste û rast fêra wê yekê bibin ku fonîm kîjanin, peyvên bine fêr kirin di encamê de je bo demekî destê didûyem plê pêşketnê ji çavê destê yekemde di astekî bilinda bû, lê piştî wê yekî ku hejmar peyvên zav bûn bu çil peyvan paşê şyana wergirtnê nema û peyvên ku hatebûne zanîn hatine ji bîr kirin lewra şyana wergirtna mîşk ji nîşana tiştan snûrdare, lê dikare bê dawîy bi sedsema fonîm nîşanên bihête dirûsit bûn bi wê ramanê ku fonîm nîşan nînin belkî bu dirûsit kirina nîşanên tene bikar înan.⁽¹²¹⁾ Lewra hebûna fonîm di dabeşiya ziman de cûda kirineka desit pêkiya zimaniye ji egerên dinên veguhastina peywendî yan peywendiya di navbera mirovên de.

2.10 Ziman û Waqî'î Bûn

di berê de me ball kişande ser wê yekî ku zimannasî vekolîn nîne derbarê pesend kirin û derêxistna egerên dereve di gel wê yekî jî peywendêka berdewam di navbera ziman û waqîyet heye, bi corêka din ziman egera bûna waqa derve ye, zêdebarê wê yekî ku dibêjn ziman rolê serekî dirûsit kirina peywendiya di navbera takênde, nabî wê yekî jibîr bikin ku ew peywendiya li ser binemayên waqîyet hatîne binyat nan, demê ez pêtvî xarnî bi wî kesê xarnê difruşit dibêjm endazeyek bide min, ev jî fruşit bi endaze ya ez û ew têçûn ku ez wergirtîy bu ez rêk dike û daxwaziya ez pesend dike, lê çewanya vê peywendî di desit pêkê de eşkire û diyar nîne, bi wê ramanî ku nabe li ser waqîyet biryar bidîn ku kar kirina ziman bi çi awayê û bi çi endazeyek bîte diyar kirin, waqîyet

⁽¹²¹⁾ - Abwalhsin Nicfî, *Mbanî Ziban Şnasî*, R29.

ne hejmara peyvên bikar hatên ziman diyar dik û ne jî endaze û dirûsit bûna peyaman jî.

Li ser vê binema ê nikarin pêş gûtnê bêjîn ku filan ziman bu mînak bu şîrove kirinê diyardeyekî çend peyv pêtevîye, çunkî komeka ziman hene bu derbirîna ramana tiştêkî yek nav bikar dînin wekî bikar îrana yek peyv bu herdû rengên kesik û şîn, bu nêçîr kirana (babê min biznêka kîvî kûşit) hinek ji sûrpêsitên Emrîkî bi dehan ramanên cuda bikar dînin wekî regez û rawistan û livîna kûştinê wesîlên kûştin û çewanya kuştinê jî..... hwd. Ji aliyekî dinve hinek raman hene ku heqîqeteka derekî nîne wekî mînak (şîra mrîşk) di hqîqetêda nikarin bêjîn heye, di ziman de bikar dehêt û raman jî heye wekî wê yekî ku di zimanê kurdî de dibêjîn: şîra mrîşkê û roha mirovî bu aniye. yan di waqîyetê de tû carêkî nebûye ku mer gurgekê bixwat lê di zimande ramana xwe hene û bikar tê, ji ber wê ye ku dibêjîn mirov dûnya di derwaze ya zimanî ya xweve dibînin, ne je derwaze ya heqîqet û waqîyetê derve, lerwa ziman bi awaêkî di pêkhatna waqîyet de bi bandor dibe.⁽¹²³⁾

Zimannas desit pêk di dîrûsit bûna denig û rêziman û ramana ziman û kar kirinê mijûl dibe û xwe di wrê felsefî dîr dike û bi vê razî dibe ku bêjêt: li ser her zimanek corêka taybet di komîteka cîhana dereve ya zimanê praktîk dibe li ser vê binema fêr bûna zimanêka din pêtvî bi fêr bûna awayekî dine ji bo dabeş kirin û fam kirina waqîyet, ev xall ku pêtir ji dirûsit bûna peyvên û rîz kirina ristên bi dirûsitî di hîte dan di hemî zemîne yên dinên ziman û di fonîm jî da dirûsite. Lewra di hemî zimanên de hejmara fonîmin cudaye anku hem jmar û hem jî derbirîna fonîmin cudane lewra rêya tamam di ziman nasî de ewe ku her zimanekî wek ew ku xwe heye bête zanîn ne bi çavê hemberî di gel zimanên din.

⁽¹²³⁾ - Pul Hinle, Wer.Îdalle Muqin, *Nqîş Ziban Dir Nmude Waqeytha*, Antişarat Hris, Tihran,1378,R75.

Feylesuf û zanayên warê ziman li ser wê yekê rêk bûn ku rêya nivîsîna ziman (şêwazên çespan) ziman bi cuda ji waqî nîşan didin anku nasîna waqîyet bi babetekî tamam cuda ji giringiya ziman dizanin û ziman wekî amrazêk ji bo nasîna waqîyet dizanin, di demekî de ku şêweyên nû yên zimanewanî gelek bi berûvajîya vî babet bûn, li gor wan ku yasa ya nasîn û waqîyet û derhaviştina mirov di pêk hatînin ziman de cuda nîne û nehatne cûda kirin jî, wê raman ku ziman netenê ji nasandina waqîet de erk heye û roll dibîne, belkî di pêk hatna waqîyet jî bandoreka serekî heye, bi ramaneka din raste û rast dûnya ya derve dûbare nake, belkî têgehiştin û reftar kirina mirov di gel dûnya ya derve dişupîne.⁽¹²⁴⁾

2.11 Corên Ziman

Hejmara wan zimanên ku îro li hemî dûnya yê dî dehêne bi karhatin û bûna wan jî heye nêzîk bi 3000 ziman dibi ku ev hejmare jî tekuz nîne û heya niha rastêka tamam nîne je bo tumar kirina hemî zimanan. Lê çewa dibe ku ev hemû ziman dabeş bikin bi ser çend deste, komek ji zanaên zimanewanî hemû zimanên dabeş dikin bi ser sê destên serekî ku ji rûê pêkhatna vî dabeş kirina hatî ye encam dan brîtîye ji:

Ku je bo yekem car Edward Sabîr zimandanê Emrîkî di destpêka sedsalê 20 de ev sê grop diyar kir.⁽¹²⁵⁾

- tik hcayî (yek birgeyî).
- zimanên peyvestî (likawekan).
- zimanê şî vekirî (gerdan krawekan).

⁽¹²⁴⁾ - Amuzade Mihd Îrcî Mhimd, *Pju Hiş Name Alum Ansanî Danişgae Asifhan*, Şmare 37, Behar 1382,R103.

⁽¹²⁵⁾ - Natil Xanlirî, *Tarîx Ziban Farsî*,R107.

2.11.1 Zimanên Yek Birge (Tik Hcayî)

Vî cur di ziman de her peyvek ji yek birge pêkdêt û hertim ev birge jî bi awayê tekî der dikevin, anku beşên wê guherîn jî bi serda nahîne û nahîne şî kirin jî, ev birge jî ramana giştî peyvên digihîne, rêkxisitna birgên jî di her ristekî de cura şî kirin diyar dike bi wê ramanê ku ew rêkxistin dibe sedema diyar kirina beşên axaftin wek nav, kar, hawelkar, hawelnav... Hwd,wekî mînak di zimanê Çînîde birge ya (T = A) bi ramana gereyî dêt . eger ev birge pêş peyvên din bêt ew hawelnav yan hawelkar diyar dike. wekî: (T – jin) = (jin – A)bi ramana zelumên mezin. Her dem jî ev birge piştî peyvên bêhêt ew bi ramana nav yan kar dêt wekî : (jin –T)(A – jin) bi ramana zelumên mezin yan mezina zelum tît. Yan birge ya (lî) bi ramana naveve dêt lê eger bikevê pêşa peyvên (uo) ku bi ramana xanî dêt wî demê dibe, li mal yan bo mal dêt.

Di zimanên yek birge de wekî ev di hîte dîtin jmarê peyvan kîmin? çunkî tenê di yek birge dae dikarêt çend der birîneka cuda û ramanên cuda bikar bihêt wekî (tau) ku di heman dem de bi ramanên (gehiştin, dapoşîn, genim, birîn) tîn, anku koma zimanên Çînî, Tibtî, pêtiriya zimanên başurê rochelata kîşwerê Asya vî cure ziman tîne hejmartin.

➤ Taybetmendên zimanê yek birge

1. peyv ji rûyê ramanê ve serbexwe nînin û bi şeweya morfîma bend dihên.
2. peyvên morfîmîn din nagirne esto.
3. berovajîya zimanên din gîrek di vê cure zimanê de nîne.
4. bi şî kirina birge ve grê dane û nahîne guherandin.⁽¹²⁶⁾

⁽¹²⁶⁾ - D. Rfîq Şwanî, *Zimanî Kurdî Û Şwênî Le Naw Zimanekani Cîhanda*, Çapî Yekem, Weş Dihok, R 94-93-92, S 2008.

2.11.2 Zimanên Peyvestî (Likawekan)(Agglutinating)

Ev cur ku di navbera peyvên û ramanên de û ramana lawekî anku kes û dem û jmar û beşên din de peywendî heye ku di desitpêk yan li dawiya peyvên de cihê xwe digrin û bi peşgir û pêşgir hatine naskirin, di gel beşên serekên peyvan da tevil nabin, bo wê yekî wekî peyvêka serbixwe hebûna wê bimîne,⁽¹²⁷⁾ je bo mînak: di zimanê Turkîde (ev) bi ramana xanî dêt, di gel beşêk ku ramana wê cudaye ji peyvên serekî wekî (dan_den) ku bi vê rengê dibe (evden) ramana wê digoherê je bu, jimalê. Yan (lar_ler) ku bi ramana ko dêt ramana wê digoherê je bu ko (evlerden) di malanve, di van curên ziman de kar li gor yasa ya bûn nabî wekî peyva (bil) a Turkî (bilmek, bildim) di hemû van qonaxên de (bil) bi bê tu cure guherînek di desit pêka peyvên de hatiye û Paşgirê cuda di cihêda hatiye, her çend ev cure ziman di çendîn beşde di gel corên dinên ziman wekî zimanê şî vekirî hevbeşî heye, lê nabî wek yek behêne polîn kirin, je bu mînak zimanê Turkî ji zimanê Hîndo Ewropay nehêne hejmartin ku çendîn hevbeşî di navbera wanda heye.⁽¹²⁸⁾ Ku je bu yekem car ji aliyê Wîlyam Fun Humîlt di sala 1836 de ku bu polîn kirina zimanên pêkol kirî ev cure ziman ji aliye pêkhatnêve diyar kir.⁽¹²⁹⁾ Lewra zimanên wekî (Turkî, Baskî, Mxulî, Kîşwa, Nahwatil, Huartil, Eymara, zimanên Qefqaz û Çîçanî...hwd, Bi van curên ziman tê hejmartin.

➤ taybetmendî zimanên peyvestî

1. peyv ji morfîm pêk dên, her peyvek ji morfîmêk pêk dê.
2. morfîmên bi hevra deçespîn bi dûr yekdî rîz dibin.
3. gîrek tu cure goherînek li ser regên peyvan ji alî gorîna hallet û gerdaniyve nake, ev jî berovajiya zimanê peyvestî wekî ewrupayn bi

⁽¹²⁷⁾ – Senendicî(Hewar),2013,R52.

⁽¹²⁸⁾ - Wîkî Pîdya, Farsî, *Ziban Pîwnidî*.

⁽¹²⁹⁾ - Asmaayl Salaryan, *Ziban û Adbyat Tirkat Xrasan*, Çap Nişde, Sayt, Wwiw.Salavigan.Arzablog.Com.

taybetî Ferensên paşgira gerdana kar goherîn dikin, çunkî halletê cuda û nû bi karve di bexşêt.⁽¹³⁰⁾

2.11.3 Zimanê Şî Vekirî (Gerdan Krawekan) İniflecting

Ev cur ziman ku bi wan ziman têne nas kirin ku şyana şê bûna hebe, peywendî peyvên di gel hevdû, Ku ramaneka cuda û serbexwe nîne, tenê erkê wan dirûsit kirina peywendên di navbera peyvande wekî (ji mal, bu mal, bi mal.... Hwd). ku ev hemû (be,le,bu) bi serbexwe raman nîne û tenê peywendî peyva serekî mal di gel beşên din dirûsit dike. Taybetmendîka eşkere vê komê ziman guherîna rengê peyva serekiye wekî mînak (bawkim, bawkman-bawkit, bawktan, bawkî, bawkyan) di raste de bi zîede kirina çend beşêk di dawiya peyvên serekî de guherîn bi serda hatiye çunkî her yek je (man, tan, yan) tu demekî de bi serbexwe raman nîne û nahîne bikar anîn.

Di karde ev taybetmendiye gelek bi eşkire derdikevê wekî (derwm û derwy, derwyin, derwn) her yek ji (mi, ê, î, ni) bi serbexwe bi kar na ê û ramana serbexwe jî nabê belkî di dirûsit kirina ramana dîyem de roll dibînin û peyvên serekî digohrine.⁽¹³¹⁾ Anku ev curên ziman bi razîbûna peyvên serekî bi wergirtina pêşgir yan paşgir ramana peyva yekem digehurê û vî corê de kar bê çarçûvê (bê yasa) dikarît bi çendîn cor bikar bînin û bigoherînin wekî zimanê peyvestî nîne ku şyanên guherîna kar jî hebe wekî mînak:

- | | | |
|--------|-----------|----------|
| ○ Sûta | disûtêm | sûtêner |
| ○ Bird | birdinewe | biranewe |

⁽¹³⁰⁾ - D. Rfîq Şwanî, *Zimanî Kurdî û Şwênî Le Naw Zmanekanî Cîhanda*, Çapî Yekem, Weş Dihok, R 94-93-92 S 2008.

⁽¹³¹⁾ - D. Pruyz Natil Xanlirî, *Tarîx Ziban Farsî, Çap Awl û Diwm*, Weş Ktîbe, Nşir Nû, 1365, R114.

Di van cure ziman jî wekî zimanên koma Hînd û Ewropên, Kurdî, Farsî, Îngilîzî, Elmanî , Frensî ...hwd. Herwisa ji kome zimanê Samiên jî li ser van cure polên dikin wekî Erbî, Îbrî, zimanên kevnên Aşurî, Kinanî, Aramî ...hwd. Ev polên kirina ziman nikarê bi polênêkî tamam zansitî dabinin çunkî tu dû zimanek nîne ku bi tamamî ji hevdû cuda bin û meger ewe ku di çendîn xalda hevbeşin, lê ev cur dabeş karin rêjeka baş ji cudaiya ziman kom dike yan je grupêkî de bi hevra kum dike.

➤ taybetmendiya zimanî gerdanyan

1. Bi bêtiriya gîreka rêziman werdigrît je bo derbrîna rewşa rêzimanî.
2. Peyv hebûna taybetî heye ku ramana cuda û serbexwe nîne.
3. Erkê peyva van ziman bi sedema dengên dibe.⁽¹³²⁾

2.12 Ziman û Civak

Ziman wekî diyardekî civatî peywendika bihêz di gel pêkhatên civakî û yasayên civatê de heye ku bi tamamî ev peywendî didû arasteye, kartê kirin li ser civak û pêk hatên civatê li ser ziman dibe, di beşê berê ya niha da pênase ya ziman hate kirin û cuda di pêk hateyên din yên civakî hate şluvekirin û li vêre dê rûnahî êxîne ser ziman ku girngiya li ser bîr û bîr kirinên de çî ye? Mirov çê wa hizir dike? Ku raste û rast peywendî bi civakve heye û kartê kirin li ser herdû alyên asantir dibe her çînek di xelk û civakamirovayetî kumek je rêziman û pêvên cuda fayede werdigrin û bikar dînin, ev cudaî vedigerê je bo lehceyên cuda û egera cûgrafi kartê kirineka mezin li ser lehceyên dirûsit kiriye, ku hukarê cûgrafi jî kartêkir mezin li ser pêkhatina lihceyên dibe ku nêzik û dûriya lehceyên jî bi wî hukar dibe, anku hinde hukar wekî çiya û rûbar wî

⁽¹³²⁾ - D. Rfîq Şwanî, *Zimanî Kurdî û Şwênî Le Naw Zmanekanî Cîhanda*, Çapî Yekem, Weş Dihok, R 94-93-92 S 2008.

cudaî mezintir dibin lehce jî zêdetir ji yek dûr dikevin û cudaya wan zêdetir dibe.

Belav bûna taybetmendiya ziman çê dibe ji ber çend egerên ji westanê dikivê wekî (temen, netewe, ol ...hwd). di buhurîde hizir li ser wê yekê bû ku di navbera nejad û netewe û ziman de peywendî heye, ku belgeyên temam li ber dest hene ku piştgîrîkerên van nêrînane diwestêne, çunkî her mirovek kam ziman bixazê dielmêt û serdema berêda hejmarêka zav ya mirov hebûn zimanê xwe gehertine.⁽¹³³⁾

Hebûna çend ziman di yek civat de diyardeka normale, ew welatên ku hejmara nîştecihên wê gelêkin çendîn zimanên navxwe jî bi kar dînin anku her civakêk bi şewazê xwe yê taybet gutûbêj li ser lehceya xwe dikin, ew welatên di yek zimanê fermî hebe nîştecihên wî welatî jî kême li vêre pêdiviye amaje bi wê yekê bikim ku çendîn pênase ji bu zimanê civak yan civaknasên ziman hene hinek ji wan behis dikin.

1. Rumîn 1971 dibêje: civaknasî ya ziman peywendî di navbera ziman û baştir bûna pêkhatyên civakê de cudayeka taybet heye.
2. Gîk Îfwlî 1972 dibêje: civaknasîya ziman û bi dest hatiya ziman jî hemî di kuşe ên civakde araste kirîne.
3. Prayr 1970 dibêje: xwandin û têgehiştina kulturiya civakî ye ku çewa ev têgehiştin di çarçûva ziman da tê şluve kirin, bi wateyeka din kar kirin li ser zimana rojane, zêdebarê cudahiya lehce û civak jî.
4. Trad gîl 1974 dibêje: civaknasiya ziman bi wî beşên girê dide ku bi nav û nîşanin ferhengî û civakî dihête şluve kirin.

⁽¹³³⁾ - Mhimd Rza Batnî. *Ziban û Camae Şnasî* (Mcimwae Mqalat), Tihran. Çap Awl,1381,R85.

5. Madsin 1980 dibêje: ziman peywendiyeka raste û rast di gel cvak heye.⁽¹³⁴⁾

Hayimiz dibêje şiyanziman tenê ji bu xwe bes nîne belkî pêdevîye (şiyânên ziman) di gel (şiyânên peywendî) bi hevra grê bidin heya ku pênasaka tamam ji ziman der bêxin, ji bu bi dest înanana pênasaka tamam dikarin di warên cuda ên kar kirina ziman bi dî bikin wekî ku mirov dikare axivtneka tamam û rêk û pêk derbarê tiştêkê derbêxe, di heman dem da dikare pêşbînî û soz jî bide.⁽¹³⁵⁾ Bi awayekî giştî ziman amrazeka girînga dirûsit kirin û parastina peywendiyên civake, piraniya zimannasên şewaza kar kirina ziman li ser didû beşên dabeş dikin.

1. Kar kirina ziman di dirûsit kirina peywendî.
2. Kar kirina ziman ji nîşandanên kesên axivtin kirî.

Ev dû xall peywendiyeka bihêz di gel hevdû hene û di demekî de tamam kirên karên yekdîne, û di meydana kar kirinê de bi didû şewazên der dikevin, di şewazê yekê de bi rêya peywendiya ziman di navbera wan de eşkire dibe û di şewaza düyem da bi rêya giftûguyê bi awayekî ne diyar eşkire dibe, herdu cur kar kirina ziman wê waqîyet nîşan didin.

Peyvên zimanekî nîşana daxwaziyên xelkîne ku wekî wan divên bi axivin ji bu mînak, hinek gelê Ereb hene bi awayekî cuda (xurma) bikar dînin, yan gelê (ser sehol, Îskîmu) ku ji bu peyva (Befr) çend şewazek bikar dînin, û bi tenê di nav yek ziman de çend gel û neteweyek bu yek tiştî bi çendîn navçên cuda navek dinn bi taybetî ku ew tiştên sruştîne wekî (dar, giya gull... Hwd) wekî yek bikar dînin.

⁽¹³⁴⁾ - Xlam Abas Tuslî, *Nizryehay Camae Şnasî*, Çap Çarm, Saziman Alum Danişgahî Simt, Tihran, 1373 R155.

⁽¹³⁵⁾ - Sîd Alî Mîr Amadî, *Mcimwae Mqalat Çarmîn Knifranis Ziban Şnasî Nizrî û Karbirdî*, Micle Awl, Tihran, Antişaran Danişga Alame Tbatebay, Çap Awl, 1379, R93.

Warê cudayên cvakî û cudayên pêşketina û şaristanên jî peyvên pêk hatina zimanên cuda û taybet dihêne berhem anîn, ku girêdaye bi pêşketin û paşketinên civak û bikar anîna pêvan, wekî hebûna çendîn pêvên cuda ji bu pêvên nan di nav gelê Erebede ku bi mebesta berv pêşveçûna jiyana mirovayeti fayedê wergirtine.

Cuda bûna zimanî di civakîde şewazê reftarê kesên derdixê ji bu mînak, di axivtina kesekî de hinek taybetmendiyên wî kesî eşkere dibe û dê zanîn ku xelkê kîrê bîr yan pleya xwandinê çî ye û regezê wî çî ye, wekî keseka zana di warêkî ekadîmî de giftûgu yê dike cudayê ji kesekî din, je ber wî di yek civat de be rêya zimanê ve cure ên kesayeti bihête nasîn, ku axivtinên jêrê axivtnên kesayeti der dixê.

- 1- eger kê m baxvin dê supas dikim.
- 2- hîvî dikim qreballxê nekin.
- 3- bê deng bin.
- 4- devê xwe bigrin, (devê xwe qepat bkin).

Lewra ziman di civakê de rulêka serekî heye ji bu rêxistna jiyana pêkhatên û dirûsit kirina peywendên di navbera gelên cuda de ku bi tenê di sînurê cugrafîya welatêkî namênê.

2.13 Ziman û Axivtin

Cuda bûna ziman û axivtin yek ji wan dûyên zimane ku (firdînad di sosêr) pêşkêşa lêkolerên Zimanewanî kiriye, axivtin ji hebûna çalakên take kesî dirûsit dibe, demê ku peyvek di bikar înan ji didû alyan ve bikar dê.

1. aliyekî wê li ser zimane, Ew jî ew ji bu me dest dixê ku guhdarên di wî fam dikin ku axêver dibêjêt wekî endamêka ser bi kuma xwe

diaxivêt ku li ser morale ziman û çeşnên ziman û pêyvên ferhengî rêk keftîne.

2. aliye dûyê ya axivtnê ye, demê axivtneka diyar krî bît bi awayekê asayî mebesta wê axivtnê hatîne kontrull kirin fayede je dewruberên xwe bigrê je bu diyar kirina mebesta xwe.

Di diyar kirina cudaiya di navbera ziman û axivtnê je alîyekî û cuda bûna ramana mebesit jî ji alîyeka din, peywendiyek heye ku Sosêr encam daye, da ku ew peywendî eşkire bikin pêtevîye behsa zimaneka diwrûber bikin.⁽¹⁾ wek ew ku hejmareka xwêndkarên di polekî da rûniştine û amîrê fênkerî polê berv sardî bir, û xwêndikarêk jî dibêje, (mamusta heva sarde), hemî xwêndikar mebestê xwêndikarê din ghiştine ku mebest ji wê ristê çî ye, lê çî amajek bi vemrandina wî amîrê fênîk kerî nedane, bi tenê di dewrû berên zimanî di hesta wê xwendevan geheştîne.⁽¹³⁶⁾

Bi vî cure em dikarin bêjîn, em dişên di raste ê da ziman veguhêzîn ji bu axivtnê, riste jî bihête guherandin û raman jî bgehînit. Axivtin bi awayekê dest pêk ku bu dîrokê vedigerê hebûnika xwe heye, ku çê wa dema zarukêk ji dayk dibît her ji zarukî ya xwe roj bo roj çalaktir dibe di warê ziman de û mêşka wî zarok jî amade ye gelek peyvyan werbigire.

Hindek xall hene nabît bihête feramuş kirin û nabît, şiyânên zehnî ya her zimanekê di gel axivtna wî zimanî bê hejmar kirin, şiyânên ziman şiyânên kume rêxistneka alluzin ku zansita ziman ji yek cûda dike, ev sê şyane (şyan, hizir, axivtin) ji ber wî ku hemî bi hevra dirûsit dibin me rû bi rû ye wê hele dibîn ku wisa fam bikên ku bi hêsânî me hîna ziman û axavtinê bûn tû carêkî me hizir ne kiriye ku em demêkî zimanekî nas

⁽¹³⁶⁾ - Mhimd Mhimd Ywşin Alî, Wer.Nerîman Ebdalle Xoşnaw, *Derwazeyek Bo Zimanewanî*, Çapa Yekem Weş Rohellat, Hewlêr, 2010, R61.

bikin ku di berhema şiyânên hizr û şiyânên fam kirin û weregirtinên dengên ku hemî bi ryên zanistî perde li ser hatiye labirin ku ev hemî zimanê axivtn berhem anîye.⁽¹³⁷⁾

Peywendiyek heye di navbera wê cuda bûna Sosêr ku li sala 1926 encam daye, cuda bûnek bi rêya 50 salan ku ji aliyê Çumîskî hatiye encam dan, cudaiya dest pêk di navbera her dû alyan dayae, axivtinê di navbera Sosêr amaje dike ji bu akamên bikar anîna kirdarên zimanî, ne kirdarên bikar anîn, ev jî wisa dike ku çemka axivtnê ji aliyê wî ve çemkêka hişk û ne dînamîkî bît, ev jî di gel pênaseyên ziman dihête guncan ku sîstemek je nîşanên ne sîstemêk ku je hêmayên pêkhatî bît Lê Çumiskî bu wê diçe ku tiwanîn, şiyana dist be serda girtina zimane wek system ne kirdar.⁽¹³⁸⁾ Ku di encamên çendîn hukar dêne berhem ku wanin:

1. Rêziman bi giştî di hizra hemî mirov de heye, (zimanê sruştî) bi tenê di mirov de heye û bi rêya mirovekî je bu miroveka din dihête veguhastin .
2. Çêdibe gelek caran ev pirs ji bu te hatî bît ku erê ziman û axivtin ji yek cudane û eger cuda bît dê çê wa bihête nas kirin, lewma hindek caran di axivtnê de xelet dibin û heta demekî em axivtina xwe dirûsit bikêt yan jî bê denig dimînin û di nav xwe da di hizirde hinek peyvên din bikin li cihê peyva nezanrî ye .

Zimanî şiyânên tû cure xeletêk nînin, belkî bi tenê bi axivtnê ve girê dayîne û di xelet jî berprisin, li vêre bi pêdvî dizanim runahiyê bixme ser çendîn xalên ku cudahiyê dixê di navbera axivtnê da.

⁽¹³⁷⁾ - Xlam Alî Amîr Nurî, *Gunîdgî Wift Byan*, Tihran, 1384, R43.

⁽¹³⁸⁾ - Mhimd Mhimd Ywşin Alî, *Wer. Nerîman Ebdalle Xoşnaw, Derwazeyek Bo Zimanewanî*, Çapa Yekem Weş Rohellat, Hewlêr, 2010, R64.

- 1- Yekum fayde cûdahiya wan xeletî û kê m û kûrtiyên di nav axivtnê de dihêne rudan û çak kirin û rêxistina wan xeletên jî di stûyê zimanî daye.
